# ÇEKDAR ŞAX

# SERPÊHATIYA FERMANDAREK NEMIR

**Amadekar: Leyla Lorîn**

**WEŞANÊN KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN YA PKK'Ê- 2021**

Ji Weşanê Re Amadekirin: Komîteya Xebatên Şehîdan Ya PKK'ê

Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî

Dîroka Çapê: 2021

## Naverok

Pêşek ..... 5

Pêşgotin ..... 6

Ew Yek Ji Wan Pêşengên Cizîra Botanê Bû ..... 11

Rêwîtiyek Bêdawî ..... 25

Yan Tu Yê Ji Aliyê Siyasî Ve Nîjada Xwe Berdewam Bikî Yan Jî Wê Bedîrxaniyê Dawiyê Jî Bimire! ..... 33

Di Çalekiyeke Germ De Rihê Tolhildanê ..... 57

Li Cudî Bihar Tê ..... 69

Hevalên Yek Giyanîbûn ..... 73

Zivistana Sar Û Ava Hincê ..... 83

Agahiya Şehadetekî Bi Êş Û Xemgîn Tola Hevaletiya Mezin Dixwaze

Ew Giyanê Gabar Bû ..... 97

Ji Bo Bîranîna Rêwiyeke Hêviyê Yê Nemir ..... 109

Lehengê Ku Li Pê Şopa Dîrokê ..... 117

Ew Ji Bo Min Rêhevalê Azadiyê Bû ..... 133

Çavên Wî Her Tim Bi Hestên Tejî Li Azadiyê Dinêrîn ..... 135

Ew Fermandareke Jîr Bû ..... 139

Ew Rêhevaleke Pir Bi Peroş Bû ..... 149

Çîroka Fermandareke Nemir ..... 153

Dema Ku Ez Zarok Bûm ..... 161

***Serpêhatiya Fermandarek Nemıir***

## Pêşek

Pirtûka serpêhatiya fermandarek nemir, beşek ji bîranîn û beşek jî ji gotûbêjên ku bi hevalên li ser Şehîd Çekdar axivîne re kirine pêk tê. Di vê pirtûkê de bîranînên hatine vegotin, di şexsê Şehîd Çekdar û gelek hevalên Şehîd ku navên wan û bîranînên wan derbas dibe de, tê behskirin. Di şexsê Şehîd Çekdar de wan hevalên Şehîd, di demên herî zehmet de li hemberî, duyemîn artêşa Natoyê ya Tirkiyê, di gelek şerên dijwar ên bêhempa de li ber xwe dan. Artêşa Tirk, bi hevkarên xwe ve dijminatiya herî qirêj ku nav lê dikirin, "topyekûn savaş" bi şerê topyekûn re dihatin ser gelê Kurd û Tevgera Azadiyê. Dewleta Tirk û artêşa Tirk, bi vî şerê xwe yê qirker, qirêj û topyekûn ve sucê herî mezin li ser gelê Kurd û gerîlayên azadiyê û bi taybet jî li ser gelê Botanê kiriye.

Di wan dem û kêliyên zehmet de, di pêvajoyên cuda û cuda de, wan hevalên Şehîd, bi fermandariya xwe ve, bi çalekiyên xwe yên bi serkeftî ve, karîne fermandarên payebilind ên artêşa Natoyê ya Tirkiyê, binbêxin û têk bibin. Dîsa karîne li Kurdistanê û li Çiyayên Botanê derbeyên herî mezin li artêşa Tirk a Natoyê bidin. Bi têkoşîna xwe ve jî karîne her yek bibin milîtanên Rêber Apo yên serkeftî. Bi jiyan, hevaltî û şoreşgeriya xwe ve jî têkoşîna gelê Kurd ya azadiyê, pêş ve birine û mezin kirine.

Bi rihê hemû ŞEHÎDÊN azadiyê, di şexsê şehîd Çekdar, Şehîd Egîd Amûdê, Şehîd Xebat Dêrik, Şehîd Celal Kobra de vê pirtûkê diyarî hemû Şehîdên ku navê wan di pirtûkê de derbas dibe û dîsa diyariyê hemû şehîdên bi şehîd Çekdar re şehîdbûne dikim.

## Pêşgotin

Ji aliyê heval Leyla Lorîn ve danehevên vê xebata pirtûka “Serpêhatiya Fermandarek Nemir” rê heval Çekdar hatiye berhevkirin. Bîranîna li ser jiyana şehîd Çekdar gelek bi nirxe. Hevalê Çekdar li qada Botanê li gel me mabû, hem jî li Botanê fermadarî kiribû. Ji bo wê ji me hate xwestin ji bo çîroka “Serpêhatiya Femandarek Nemir”, ez sergotara vê pirtûkê binivîsim. Li ser vê axa pîroz û zêrîn, mêrxasî û lehengiya şehîdên Kurdistanê, ji her aliyan ve heq kirine ku mirov li ser jiyana wan çîrok, roman û bîranînan binivîse. Pênasekirina şehîdan, vegotina şehîdan û nivîsandina wan yek ji armancên me ne. Di heman demê de jî peywir û deynên me ne. Li ser vê bingehî ez jî dixwazim di vê nivîsa ji min hatî xwestin de wisa qala kesayetiya şehîd Çekdar bikim.

Min heval çekdar Şax, an jî Çekdar Cizirî, ji nêz ve nas dikir. Hevalekî temen ciwan bû. Piştî Dibistana Amadeyî, di sala 1994’an de tevlî şoreşê bûbû. Berî wê jî di nav ciwanan de xebat kiribû, têkoşîn dabû meşandin. Dema ku ew tevlî refên gerîla bû, pir zû adaptasyon da çêkirin. Zêde zehmetî nekişand. Bi çiyayan û gerîla re pir zû bû yek. Ji bo wê jî pir zû derket pêş û di şerkariya xwe de jî xurt bû. Ciwaneke sempatîk bû, her tim di refên pêş de, di êrîşan de cih digirt. Ji xwe min ew wisa nas kir. Hevaleke ji Cizîrê, wisa di êrîşan de cih digire; vê yekê pir bala min kişandi bû. Di kesayetiya wî de cewhereke bingehîn û baş hebû, me lê nêrî ku wê zû pêş bikeve, ji bo wê, li ser vî bingehî min girt gel xwe. Nêzî salekê di ewlekariya min de cih girt. Demekê jî bû berpisiyarê Taxima Ewlekariya me.

Di wê demê de Tabûrên Bitevger (hareketli) hebûn. Ew tabûr weke Hêzên Taybet yên şer bûn. Hevalê Çekdar jî di nava ji yek wan tabûran de li ser erka taximê bû. Di şer û zanabûna xwe de hevaleke

wisa bû ku di kesayetiya wî de ji bo pêşerojê bi mirov re hêvî dida avakirin.

Di sala 1997’an li Çataxê di şerekî ku heval Çekdar jî tê de cih digirt de, em jî nêzî wî şerî bûn, me ji nişka ve dît, deng bi çekan ket. Me pirsiyar kir ka çi bûye? Hevalan gotin; “dijmin derketiye araziyê û pevçûn derketiye.” Heta beriya esrê wê hevçûnê berdewam kir. Piştre hevalê Çekdar bi kelecan tekmîla xwe da û got; “min termek (cenaze) û çekek rakir.” Paşê me jê pirsî; “te ew cenaze çawa rakir? Te çi ji wî termî kir?” Pişre hevalên li gel wî ketibûn çalakiyê gotin; “ma ew cenazeyê wî girtî, ne cenazeyê rakirinê bû, cenaze sed û sîh kilo giraniya xwe hebû. Yê herî pêşî kontrayek bûye, heval Çekdar, bêdeng diçe ber wî kontrayî disekine û hêdî bi dest digre û wî tesfiye dike. Çeka wî radike û bi devoka Botanî dibêje: “Min çekek û termek rakir.” Ji xwe ne gengaz bû bikariya wî cenazeyî rabike. Ji ber ku cenaze pir giran bû. Kesek ji me nedikarî wî cenazeyî rabike. Lê belê heval Çekdar bi îradeya xwe ya şerker ve ew cenazeyê 130 kîlo, bi tena serê xwe tesfiye kir.” Bi rastî jî hevalê Çekdar hevaleke xwînsar û wêrek bû. Dîsa hevalekî wisa bû ku karê xwe di cih de ne dihişt.

Ji bo hîn zêde ji aliyê rêxistinî ve kûr bibe û pêş bikeve, ne tenê di şer de, hîn zêde ji aliyê bîrdozî ve kûr bibe, gelek caran nîqaşên min ji bo wî pêş diketin. Hevalê Çekdar, hevaleke zekî û ji pêşveçûna bîrdozî û siyasî re vekirî bû. Ji xwe ew di malbateke welatparêz de mezin bûbû. Malbatê jî bingeheke xwe ya welatparêziyê hebû. Ji xwe weke malbat eslê xwe ji Şaxê ne. Mirovên Bedirxan Beg in. Malbat di koka xwe de dibin Bedirxanî. Malbat, ji kevneşopiyeke Kurdewarî tê. Hevalê Çekdar jî temsîla wê welatparêziyê û kevneşopiya kûr dikir, di heman demê de ev kevneşopî di kesayetiya xwe de jî dida diyar kirin. Bi wê ciwanbûyîna xwe weke ku mezin bûyî û dubare ciwan bibe bû. Ew kesek wisa bû, di welatparêziya xwe de, di têkoşîna şoreşê de

xwediyê biryareke mezin bû. Û sekna wî gelek hêvî dida mirov. Dema ku xwe dida naskirin û mirov ew nas dikir, mirov jê hêvî digirt.

Ji bo hîn zêde pêş bikeve, di xeta Rêber Apo de kûr bibe, me ew şand qada Rêber Apo. Ew li qadê bala Rêber Apo jî dikişine, Rêber Apo jî fêm dike ku di heval Çekdar de cewherek heye, piştî ku perwerdehiya wî diqede, Rêber Apo jî, ji bo hevalê Çekdar hîn jî pêş bikeve, digre nava Taxima Ewlekariya xwe. Rêber Apo erka pirtûk nivîsandinê dide wî û jê re dibêje; “Tu yê pirtûk binivîsînî.” Hevalê Çekdar bi vî awayî li qada Rêber Apo, li ser “Bêmiriniyê” pirtûkê dinivîsîne. Ji xwe pirtûka wî jî heye. Ew, hevaleke ciwan û jîr bû. Rêber Apo jî, di kesayeta hevalê Çekdar de pêşerojê dibîne. Ji bo wê Rêber Apo erk dayê, erka Fermandariya Heremê dayê. Ji xwe bi wê erkê çû ser herama Mêrdînê û xebat li wir da meşandin. Êdî perwerdeyên pêwîst dîtibûn, ezmûnên pêwîst jî girtibûn. Hem ji aliyê zanabûn, çand, ehlaq ve û hem jî ji aliyê terbiya xwe ve bingehekî digre û ev yek jî ji wî re bingehekî bihêz dide avakirin. Ew, di asta lehengtiyê de jî heta bêgotin yekî wêrek bû. Êdî hatibû wê astê ku xizmeta vî gelî û şoreşê bike. Bingeheke wisa jî di kesayeta wî de hatibû afirandin.

Piştî esareta Rêber Apo, ji Bakur derbasî Başûr dibe. Li gel komek hevalên xwe dixwazin ji Garê, derbasî Qendîlê bibin. Di wê demê de li herama Garê, tangên dewleta Tirkan lê hebûn. Ev jî birînek ya Kurdan û kêm û kurtiyek ya netewa Kurdan bi xwe ye; yan jî tangên dewletoka Tirkan li qada Garê çi dikin? Ew û refek hevalên xwe dikevin kemîna tangan, tang ji dûr ve li wan dixe û bi heval Çekdar re deh heval jî şehîd dikevin.

Li qada Rêber Apo, gotûbêjên ku Rêber Apo bi heval Çekdar re pêşxistî hene. Rêbertî ji wî re dibêje: “Pêwîst e tu xwe bikaribî biparêzî, Rêbertî ji bo wî didul e. Tu diyariya ji malbatekêyî û kurê

malbatê yê tenêyî, divê tu zû şehîd nekevî!" Heval Çekdar di soza xwe de ji Rêber Apo re dibêje: "Ez soz didim zû şehîd nekevim. Berxwedan û mirina min wê mezin û şanaz be."

Bi rastî hevalê Çekdar miroveke wêrek bû. Li Botanê fêrî araziyê bûbû, di nava wê giraniya şerê Botanê de fêrî araziyê bûbû, ne gengaz bû dijmin zû bi zû bikarîbûna wî şehîd bixistibûna, lê mixabin bi tang, bi guleya tangê ew şehîd xistin.

Mirovên mîna hevalê Çekdar, di nava vê şoreşê de pir derketin, bi rastî jî ew tev mirovên paqij û dilpak bûn. Ji derveyî azadiya welat û doza xwe, çi armanc û xwestekên wan ên din tinebûn û fedayiyên azadiyê bi xwe bûn. Mirovên weke şekir bûn. Ew, hevalên bi dil û can bûn. Kesên weke hevalê Çekdar ne gengaze mirov ji bîr bike. Şehîd Çekdar, di kolanên Cîzira Botanê de, li himberî dagirkeriya dewleta Tirk, bi avêtina keviran bigre, heta bi giyanê serhildanê fêrî şerê şoreşê bûbû. Hîn di biçûkbûna xwe de beşdarî tevgerên serhildanan dibe. Ji xwe du û sê salan di nava xebatên ciwanan de kar jî kiribû û piştre tevlî şoreşê bûbû. Ev yek dide diyar kirin ku kesên leheng çawa di kolanên Cizîra Botanê de tên afirandin. Şehîd Çekdar Cizîrî jî, ji yek wan kesayetiyên ku pêşeroja wan heye bû. Bi rastî bi vî şêwazî û zû şehîd neketibûna, wê genaralekî şer ji kesayetiya wî derketibûna holê. Ji xwe ew genaralê azadiya Kurdistanê bi xwe bû.

Ew teybetmendiyên genarelê şer, ew bingeh, ew dil, ew wêrekî, ew zanabûn û terbiye bi wî re hebû. Şehadeta wî; him ji bo malbatê û him jî ji bo Tevgera Azadiya me windahiyeke cidî bû. Ciwanên wisa ji pêşveçûnê re vekirî, kadroyên ku dikarin barê gel û şoreşê rabikin, bi rastî windahiya wan ji bo şoreşa me valahiyê çêdike. Pêwîst e em şopdariya wan bihêz bikin! Teybetmendî û jiyana hevalê Çekdar di roja îro de dijî û ji bo me hêza têkoşînê ye. Heval Çekdar Şax, ji bo hemû ciwanên Cizîra Botanê jî mînak e.

Ew fedakarî, wêrekî û merditiya wî, ji bo hemû kesekî/ê, di roja îro de jî weke rehber û pêşengtiyê bi xwe disekine. Ez bawer im wê di şopdariya rêheval Çekdar de, têkoşîna me bilind bibe û serbikeve. Em ê wisa Çekdaran bikin kesên nemir, di dîroka Kurdistanê de jî navên wan wê bi tîpên zêrîn bê nivîsandin! Ev deynê li ser milê me ye û erka me ye! Li gel hemû hevalên dijîn, li gel ciwanên Kurd, divê di şopdariya rêga hevalê Çekdar de van gernas û mêrxasan bikin kesên nemir! Bi vê hêviyê ez dibêjim: "Çekdar namirin û şehîd namirin…!"

**Murat Karayılan (Heval Cemal)**

Di tevahiya dîrokê de ji bo azadiya Kurdistanê û gelê Kurd, herêma herî zêde şehîd daye, yek ji wan jî Botan û Cizîra Botan e. Ev rastî di berxwedana Kurd ya hemdemî de, têkoşîna azadiyê ya di bin pêşengtiya PKK'ê de jî naguhere. Ji Şehîd Adil heta Şehîd Reşîd û ji Şehîd Nûda heta Şehîd Çîçek, di pêşengiya bi sedan fermandarên mezin yên di şopa Fermandar Egîd de dimeşin, di vê oxirê de gelê Cizîra Botanê bi hezaran şehîd dane.

**Duran Kalkan**

## Ew Yek Ji Wan Pêşengên Cizîra Botanê Bû

Çawa ku nasnameya mirovan heye, nasname û kesayetiyên bajêran bixwe jî hene. Dema ku di dîroka bajarekî de liberxwedayîn bêhempa be, bêguman ev yek bi ax û welatê wî bajarî ve girêdayî ye. Ango bi erdnîgariya wî bajarî ve jî têkildariya xwe heye. Eger ku ji bo xwe dîrokeke ji berxwedayînê hûnandibe, nirxên wê yên dîrokê jî wê wisa mezin be. Jixwe wateya wê jî wisa ye. Rastiya vê axê jî naşibe çi axên dîtir. Mirovên vê axê jî dişibin heman erdnîgariya xwe. Weke axa xwe paqij û dilpak in. Ma ne dibêjin: "Armancên baş û pêşketî li ser van axan paqij tên jiyîn!" Dema ku cewherê wê bi kok û qayîm ma, ger ji aliyê fîzîkî ve jî nebe, lê belê cardin jî dikare xwe ji nû ve biafirîn e. Rêhevalê Çekdar jî xwediyê serborî û kokeke wisa bû. Ji bo em bikarin di şexsê rêheval Çekdar de mêrxasiya bajarê Cizîrê nas bikin, divê em çavekî li dîroka vî bajarê serhildêr binerin…!

Weke ku tê zanîn Cizîra Botan ji aliyê began û yêkîtiya eşîran ve demeke dirêj xwe bi xwe rêvebiriye. Di nava dîroka Kurdistanê de risteke girîng a Botanê heye. Ev girîngî hem ji aliyê dîrokî ve, hem jî ji aliyê erdnîgariyê ve her wisa ye. Navê Botanê ji rûbarên wê hatiye girtin. Navê Cizîrê piştî fetihên Ereban lê tê kirin. Di Erebî de wateya Dûrgehê "Cezîre" ye. Ji ber ku bajêr di nava her du aliyên Dîcleyê de ye, ji bo wê Cezîre jê re hatiye gotin. Cîzîra Botan, weke Çemê Botanê tê nas kirin.

Qada Botanê, cihê şahristaniya Kurdistanê ya ku jê re tê gotin "Dilê Mezopotamyayê" ye. Ji bo wê civaka mirovên Cizîrê, piştî Tofanê, yekemîn nîştecih, yanî yekemîn mala ku mirovahiyê xwe lêgirtiye ye. Dema ku nijada mirovan ber bi çanda civakbûnê ve diçe vê qadê jî ji bo pêwîstiyên mirovan bihuştek da afirandin. Cizîra Botan li gorî wan pêwîstiyan qadeke herî guncav e. Ji ber ku li derdora wê çiyayêyên asê, çem û gelek rûbar hene. Weke Cûdî, Gabar, Besta, Feraşîn; deşt û bestên Herekolê ku yên tên zanîn. Avên wê yên ku diherikin Ava Dîcle û Ava Mezin hene. Lê rexmê ku Cizîr bixwe qadeke deşt e jî, lê belê derdora wê bi çiyayên asê ve hatiye xemilandin.

Avabûna Cizîrê xwe dispêre Destana Tofana Hz. Nûh. Cizîr bajarê Nuh e. Ev destan di pirtûkên pîroz yên weke Îslamê, Xiristiyan, Tewrata Musa de jî derbas dibe, nêrînên van pirtûkên pîroz jî hema

hema hevbeş e. Dibêjin; “Hz. Nûh Pêxember piştî tofanê keştiya xwe daniye ser serê Çiyayê Cûdî.” Piştî tofanê yekemîn cihê ku jiyan hatiye dîtin û pêşxistin ew der e.

Di beşek Destana Gilgamîş de hema wisa behsa tofanê tê kirin: “Rojek ji rojan xwedê bûye deng û di guhê Hz. Nuh de gazî kiriye. Ya Nuh! Min qawmê sahrayê nelet kir. Ji ber ku qewmê te bi tewanên neletîre dibe yek. Û henekên xwe bi nirxên heyî dikin. Ez ê li ser zevî û erdê ji bo ku ew qewm bê winda kirin tofanekê rêbikim. Lê belê te heqkiriye ku tu ji vê tofanê rizgar bibî. Ji tofanê rizgar bibe û ji bo gelê xwe jiyaneke nû biafirîne. Jiyaneke ku dişibe jiyaneke mîna ya berê. Û jiyaneke ku dişibe ya dema xwedawendan. Ji bo wê yekê xweza û jinê pîroz bibîne. Dema ku te ew pîroz dîtin, tu yê jî wê hêdî hêdî pîroz bê dîtin. Ji bo ku tu xwe ji tofanê biparêzî, divê tu ji bo xwe keştiyekê çêbikî. Piştî ku tofan rabû, wê şeş roj û şeş şevan berdewam bike.”

Tofan bi dijwarî dest pê dike û heft rojan berdewam dike. Piştî heft rojan, bayê sar û dijwar disekine û av jî kêmtir dibe. Lê belê hîn heta banê keştiyê avê lêdida. Di nava behrê û zeryayê de deştek tê dîtin. Keştî ber bi wê deştê ve diçe. Di dawiyê de keştî li wê derê disekine. Missir jî, girê wî Çiyayî bû. Keştî li wî Çiyayê Missirê danî. Çiyayê Missirê keştî girt û keştî neket. Ji bo ku bizane ka av daketiye yan na û ji ewlehiya keştiyê piştrast bibe, kevokekê rê dike. Lê ji ber ku kevok ji bo xwe ciheke jiyanê peyda nake, dîsa paşve dizivire. Dibe roja din xecxecokekê rê dike, ew jî ji xwe re cihekê peyda nake û paşve dizivire. Dibe roja sisêyan, qijikekê rê dike, ji ber ku qijik ji bo xwe cihekê peyda dike, nazivire. Ji bo wê yekê tê fam kirin ku av hinekê din daketiye û ew jî ji keştiyê dadikevin.

Li gorî wê destanê deşta ku tê behskirin, cihê reş ku yekem car keştî lê hatiye danîn, Çiyayê Cûdî ye. Cûdî di Kurdî de tê wateya ku “cihê hatî dîtin.” Ji bo Cûdî navekî din jî di wê demê de tê bikaranîn

wiha ye; "Hilgirt", ev nav jî di Kurdî de tê wateya hilgirtinê. Ev nav ji aliyê dîrokzanan ve jî weke "keştî rakir" tê gotin, ango hilgirt.

Di Tevratê de jî dibêje: "Hz. Nûh ji bo ku bizane ka av daketiye, kevokê rê dike. Dema ku kevok dizivire, di deve wê de bi çiqilek darê zeytûnê ve dizivire." Çiyayê Cûdî, ji aliyê Başûr, Rojhilat, Bakur ve darên zeytînan lê peyda dibin. Dîsa ew gundên li binarên Cûdî, weke Şax, Hevlêr, Hesina, Besta, Girêçûlya, Herekol, Bêspin jî darên zeytûnan peyda dibin. Navên kurên Hz. Nuh yek jî wan Yafes e. Niha jî navê taxek Cizîrê Yafes e. Di çavkaniyên dîrokî de jî tê piştrast kirin ku navên ku ji bo Cûdî hatine gotin; "Novakin, Hilgirt, Cûdî, Missir û

Gotî" ne. Di Destana Gilgamiş de jî tê gotin: "Keştî li Missirê cih dîtiye. Çiyayê Missirê, Çiyayê Cûdî bixwe ye."

Cudî dikeve bakurê Cizîrê û aliyekê wê jî li başûr e. Bilindbûna Çiyayê Cûdî 2114 metre ye. 18 kîlometreyan ji Gundê Şaxê dûr e û ew gund jî weke gundê hinarên xweş û fêkiyan tê nas kirin. Derdora vî gundî bi av û mêrgan ve hatiye xemilandin.

Gundê Şaxê ji yek gundê dîrokî û kevnare yê girêdayî navçeya Cizîrê ye. Gundê Şaxê, di dema Bedîrxaniyan de seyrangeha mîran bû. Ev gundê xwezaya wê ya bêhempa her kes kiribû heyranê xwe. Vî gundî dayiktiya gelek şaristaniyan kiriye. Jixwe ev rewş ji bermahiyên wan şaristaniyan yên li gund jî tê fêhm kirin. Ew Şaxa ku ji artêşên Îskenderê Mezin û Tîmûr re singa xwe kirî çeper, dikeve qontara Çiyayê Çeko yê ji alîyê rojhiltê Çiyayê Cûdî ye. Li gorî çavkaniyên mîtolojî Şax, piştî Tofana Nûh Pêxember hatiye avakirin. Hawirdorên Şaxê bi sûran hatiye dorpêçkirin. Li Şax û hawirdorên wê bi navê Kelha Dûşê, Kelha Çeko, Kelha Keçê, Kelha Kirtî (Kelha Mamgûrî), Kelha Bêgîne, Kelha Xirabe (Kelha Birahîm Paşa) û Kelha Bedirxan Begê, heft (7) kelhe hene.

Di van kelhan de dewsên cur be cur ên şaristaniyan xuya dikin. Di nav van kelhan de Kelha Bedirxan Begê, 365 odeyên wê hene û li alîyê rojhilatê kelhê jî ji wî kevirê kelh li ser hatî avakirin şkeftek bi destan hatiye çêkirin heye û derincên kelhê heta diçe şkeftê jî bi kolandina kevirî hatîye çêkirin.

Ji bo pêşwazîkirina hewceyiya avê di nava kelhê de Sarincek ya avê heye. Ji bo avê bînin ser kelhê dîwarek nêzîkî 300 metreyan dirêj û 5 metreyan bilind hatiye avakirin. Li ser wî dîwarî coya avê hatiye çêkirin û ava kelhê bi ser wî dîwarî re dikeve nava kelheyê. Ava kelhê bi wî awayî dihat pêkanîn. Di kelhê de ji bo derketina ji derve tenê deriyek li aliyê Taxa Hêşetê heye. Li aliyê başûrê kelhê mizgeftek, li aliyê bakûrê kelhê jî dêrek hatiye avakirin. Hawirdorên Şaxê bi sûrhan ve hatine dorpêçkirin. Li gorî firehiya wan sûrhan û li gorî eserên di navbeyna wan sûrhan de hatine dîtin, tê zanîn ku Şax di wî demî de bajarek pir mezin û xwediyê şaristaniyek pir dewlemend bûye.

Di pirtûka Şerefxanê Bitlîsê ya li ser dîroka Kurdan hatiye nivîsandin “Şerefnameyê” de dema behsa Şaxê tê kirin, pesnê wê bi

xweşiya Hinarên wê tê dayîn. Ji bilî wê dibêje: “Di Şaxê de Ermenî, Fileh û qebîla Şildiyan dijîn. Jiyana Misilman, Ermenî û Filehên Kildanî bi hev re di vê herêmê de pêkhatiye.” Heyîna Dêr û Mizgeftan bi tevde yên li kelha Bedirxan Begê nîşan dide ku di vê herêmê de di navbeyna çand û baweriyan de hevkarî, lihevkirin û aşîtî hebûye. Ew nivîsên bizmarî yên li ser keviran jî nîşan dide ku ev herêm jibermayê bajarek antîk e.

Dîsa piştî Tofanê heta dema Gotiyan li ser dîroka Cizîrê zanyariyeke gelemperî nehatiye dîtin. Di rûpelên dîroka Cizîra Botanê de, şahristaniya herî diyarker li wê derê Gotî ne. Ji bo wê heta beriya mîladê 2000’an jî Gotî li wê derê niştecih bûne. Gotiyan di demên xwe de navê Cizîrê dixin Gerzu-Bakartda. Ji aliyê dîrokzanan ve jî Kartu, Gazarta, Bajarkart tên nivîsandin. Heta niha jî ji aliyê Kurdan ve bajar tê bikaranîn.

Di pêvajoya Persan de jî dîroknasê Cizîrê Îbnul Esirî demekê navê Gazarta û Bazîbda bikaraniye. Di sala 1943 û 1954’an de ji aliyê Alfred Flobil ve dema ku li ser Girêreş xebatên kolandinê dike, nexşeya li ser wan wêneyan hene dibîne, di nav nexşeya Cizîrê ya wê demê de wêneyê tavê heye. Di bin wê wêneyê tavê de jî fîgurên du şêran hene. Ew şêrên ku di nava wan fîguran de ne, berê wan li heyv û tavê meyze dikin. Li gorî lekolînên zanistvanan, navê Cizîrê Gerzu-

Bakartda ye. Û li gorî wê demê nifûsa niştecihên Cizîrê bi hejmareke pir zede hatiye tesbît kirin. Çavkaniyên ku me ji agahiyên dîrokê piştrast kirine, heta niha jî gundek ku di navbeyna Cûdî û Gabarê de ye, navê wî gundî hîn jî Bakarda ye. Ger em van hemûyan li ser hev bidin pênase kirin, Cizîra Botan ji bo şahristaniya mirovahiyê roleke girîng lîstî ye.

Sûrên bajarê Cizîrê di dema Gotiyan de hatine çêkirin. Sûrên Cizîrê weke mîmarî bi şêweyê keştiyê ye. Dema ku Gotî li ser heremê serwer in, hata silsila Zagorosan û heta ber bi Ava Botanê pêşve çûyîne. Di wê demê de jî ji wan re gotîne Gutiyum. Navê wê yê niha jî li gorî çavkaniya dîrokê (Qilaban) e. Eşîreta Goyiyan jî ji Gotiyan tê. Dem û pêvajoya Gotiyan ya herî xurt û xweş, derdorê beriya mîladê 3000 sal bûne. Bajarê Cizîrê li gorî çavkaniyan ji bo dîroka me piştrast dike ya herî ronahîbûnê ye. Ew qonax derbasî qeydên dîrokê jî bûne. Li gorî nivîsên li ser tabletên Babîlan ku xêz kirine, behsa mileteke bi navê Gutî, Qurtî, Kurtî dikin. Wî miletî ji aliyê Rojhilatê Dîcleyê ve dest pê dike heta digihe nîşteciheke mezin û jê re dibêjin Gutium. Di nivisên wan tabletan de behsa welateke bi navê Karda dikin. Ew herêmên ku wê demê behs dikin, di nav sînorên Tirkiye û Irakê de ne, Cizîra Botan e. Dîsa di tabletên Sûmeran de pesnên zîrekbûna şervantiya gelê Karda û Gutium didin.

Bajarê Cizîrê beriya mîladê di 2350'an de dikeve destê Şahê Akadan Naram Sîn. Di beriya mîladê 2223-2130'an de ji aliyê şahê Gotiyan Trîganî (Tirikan) ve dubare dikeve destê Gotiyan. Dewleta Gotiyan di heremê de nêzî 100 sal rêveberî kiriye. Di wê demê de Gotî ji Çiyayê Cûdî re dibêjin, "Çiyê Godî", wisa bi nav dikin. Dewleta Gotiyan, bajarê Sûmeran ên herî bi navûdeng bajarê Nîpûrê têxin destê xwe.

Cizîr, beriya mîladê 1894'an de dikeve di destê dewleta Babîlan a yekmîn de. Paytexta bajêrê Babîlê nêzî 22 km ji bajarê Cizîrê dûr e. Di vê pêvajoyê de Hammurabî li gorî zagonên xwe gelek zagonên nû tîne. Di dema Gotiyan de girêdayî çanda neolîtîkê ku Gotiyan gelek girîngî didin jiyana gundewarî, çanda çandiniyê û cotkariyê gelek pêşve dibin. Lê dema ku dewleta Babîl tê ser desthilatiyê vê çandê hemûyê ji holê dide rakirin û li gorî xwe pergaleke nû dide avakirin.

Zagonên Hammurabî çanda jiyana gund û çanda civakê ber bi krizeke aborî ve dibe. Asûriyên ku parçeyeke ji dewleta Babîlê ye, li himberî vê pergala Hammurabî radibin, dîsa Nînovayê dixin destên xwe.

Cizîra Botan, piştî desthilatiya Babîlan B.M. 1390’an de dikeve bin desthilatiya Asûran. Di wê pêvajoyê de navê Godî tê qedexekirin, li şûna wê navê Missir (Nissir) tê bikaranîn. Asûriyan ji bo ku di wê qadê de desthilatiya xwe mayînde bikin, dest bi bişavtinê jî dikin. Li heremê navê bajar, erdnîgarî û gundan jî li gorî pergala xwe ya bişavtinê hemûyan diguherînin. Jixwe ji Cizîrê re dibêjin Kardu. Li cihê ku keştiya Hz. Nûh lê daniye Çiyayê Cûdî, li wê derê mabetekê dide çêkirin. Dîsa şahê Asûriyan Sanherîp li wî cihî şeş peykeran dide çêkirin. Berê wan peykeran jî dide Çiyayê Cûdî. Dîsa şah  eserên li gel qebra Hz. Nûh hemûyan ji nû ve dide çêkirin.

Medên ku ji aliyê Asûriyan ve weke Medya dihatin binavkirin li gel qewmên Îraniyan, weke malbata Aryan tên nasîn, li welatê xwe nîv jiyana koçertî didomandin. Med her tim rû bi rûyê êrîşên ji aliyê Asûriyan ve dihatin re dimînin. Di wê demê de jî gelan li himberî koletî û zilma Asûriyan nekarîne hinaseyeke baş bigirin. Dîsa Medên ku koka wan Hurrîne, hewldane ku li gel Babîlan hevpeymanekê çêbikin. Di encama vê hevpeymanê de li hemberî Asûriyan serî radikin. B.M. di sala 612’an, di bin rêveberiya şahê Medan Keyakser de êrîşî Asûriyan dikin. Di encama vê êrîşê de paytexta Asûriyan Nînova dikeve. (Împaratoriya Asûriyan a ku du hezar sal desthilatî kiribû, bi êrîşa Kawayê Hêsinkar dawî lê tê). Piştî ku paytexta Nînova dikeve, B.M. di sala 614’an de Cizîra Botan dikeve bin serweriya Medan.

Di bin serweriya Medan de nirxê civaka xwezayî li heremê pêşve diçe. Raman û baweriya Zerdûştî gelê heremê ji zilm û zordariya Asûriyan rizgar dike. Dîsa bawerî û ramanên Zerdeştî di nava civaka Kurd de roleke girîng dilîze. B.M di sala 550’an de, Şahê Medan Astiyag di encama xiyanetê de li hemberî Persan bindikeve û Cizîr dikeve bin serweriya Persan de. Jixwe tê zanîn, weke ku di dîroka Heredod tê gotin Astiyag ji biraziyê xwe Harpagos re gotiye: “Ey elçax û bêkes, madem ku te ev elçaxtî kir, te çima desthilatî nekir û te desthilatî xist di destên pîçên Persan de. Te ew desthilatî xwe bi

xwe rêvebirîbûna û wê demê dê Împeretoriya Medya jî li ser desthilatiyê bimaya.” Ev rewşa xiyanetê ji bo me nişan dide ku heta niha jî nokerê Kurdên bê qîmet, li gel dijmin di nav hevkariyê de ne.

Piştî ku Medan di heremê de desthilatiya xwe winda kir gelên heremê her tim dibin hedefa êrîşên Persan. Neçar dibin ku her tim li ber xwe bidin û xwe li çiyayan biparêzin. Serweriya Persan B.M. heta sala 330’an berdewam dike. Daryûsê 3. jî ji serweriya wan bandor dibe. Şahê Persan Daryûsê Yekemîn ku li hemberî Astiyag di nav plangeriyên sarayê de bû, yek ji kurên wî Kîros yê ku her tim çavê wî li Împeretoriyê bû, ew naçe ser text, birayê wî Erdeşîr dibe şah. Kîros jî dibe valiyê Eyaleta Yewnan. Kîros ji bo ku desthilatiya Persan bigre, 10 hezar leşkerê Yewnan bi peran îcar digre, êrîşî li ser Împeretoriya Erdeşîr a li Babîlê dike. Di vê êrîşê de bindikeve û ew bixwe jî di vê êrîşê de tê kuştin.

Piştî vê binketina leşkerên Yewnanî ji aliyê şahê Yewnan Ksenefon ve ji bo xwe vê binketinê ticaran qebûl nake. Ji bo wê Îskederê ku di bist saliya xwe de dibe şahê Makadonya. B.M. di sala 334’an de bi 30 heta 500 hezar sûwarî û leşkerên xwe li ser Kurdistanê seferê dike. Diçe kuderê li wê derê serwerî û desthilatiya xwe datîne û hukîm dike. Îskender nêzî Hewlêrê li Gavgamela, Împeretoriya Daryûsê Sêyemîn jî bin têxe û biserdikeve. Bi giştî welatê Kardux bi Cizîrê re dikeve bin serweriya Îskeder. Piştî ku Îskender ji sefera Hindîstanê tê li Iraqê bi sitmê dikeve û li Hewlêrê dimre. Piştî Îskender Împeretoriya wî dabeşî çar parçeyan dibe.

Li ser welatê Kurdan gelek xwîn tê rijandin. Kurdên ku bi navê Kardu tên bi navkirin dîsa bi gelek şêwazan li hemberî desthilatiyê li ber xwe didin.

Cizîra Botan Piştî Mîladê di 256’an de, piştî desthilatiya Erdeşîr Babekan, dikeve bin desthilatiya Sasaniyan. Di dema Sasaniyan de jî Sûrên Cizîrê tên temîrkirin. Di dema Sasaniyan de Cizîr, di statûya eyaletê de tê birêvebirin. Weke navendekê jî tê birêvebirin. Kurdên ku bi navê Kardu û êlên ku li derdora heremê li çiya û deştan nîv jiyana nîştecih û koçerî jiyan dikin. Rexmê kolebûna ku di dema desthilatiya Sasaniyan de jî heyî, lê belê gelê Kardu li hemberî

desthilatiya Sasaniyan xwe parastiye. Cizîra Botan, heta fetiha Ereban di bin rêveberiya Sasaniyan de dimîne.

Di çaryeka qirnê 7. a nîvgirava Ereban de di bin pêşengatiya Hz. Muhammed de Şoreşa Îslamê gihiştiye serkeftinê. Piştî serkeftina Şoreşa Îslamê şûnve, ji erdnîgariya xwe cudatir, ji bo gelên din bikin Îslam bi navê cihadê (şerê pîroz) dest bi seferê dikin. Axa Hîlala Zêrîn ku weke bihuştekê dihate pênase kirin, wê demê di bin desthilatiya Bizans û Sasaniyan de bû. Piştî mirina Hz. Muhammed, artêşa Îslamê êdî li ser Hîlala Zêrîn dest bi seferan dike.

Erdnîgarî û Kurdistana ku bi baweriya Zerdûşt dihate nas kirin rastî êrîşên dijwar ên Îslamê tên. Ew pêvajoya belavbûna Îslamê bi xwîn tê derbaskirin. Bi serbirîn û bi komkujiyên cur be cur gelê Kurd tê Misilman kirin. Her çiqasî gelê Kurd li hemberî wan êrîşan li ber xwe dide jî, lê belê neçar dimîne ku dikeve bin desthilatiya Ereban. Ew şer jî heta 30 salî berdewam dike. Ocax û perestgehên girêdayî baweriya Zerdûşt hemûyan xera dikin û ji bo gel bibin Îslam zext, bişavtin û komkujiyan pêktînin.

Cizîra Botan jî piştî pêvajoya xelîfetiyê û bi desthilatiya dewleta Emewiyan pê de, dikeve bin desthilatiya Ebasiyan. Li herema Cizîra Botanê di wê pêvajoyê de gelek mizgeft û dibistanan çêdikin. Hesen Îbnî Omerê ku ji aliyê rêveberiya Ebasiyan ve weke valî dişînin Cizîrê. Ji aliyê wî ve tê gotin; “Ji bo pêşketina bajêr gelek avanî çêkirine. Weke pird, kanalîzasyon, serşok (hemam), karwansaray dayîne çêkirin. Ulu camiya li Cizîrê di wê demê de (639) ji dêrê derbasî mizgeftê dikin. Cizîr, di sala 993’an de dibe parçeyek ji Xanedaniya Merwaniyan. Dewleta Merwanî di vê demê de pere û zêr çêdikin. Piştî ku dewleta Merwanî ji dika dîrokê radibe û dirûxe, Cizîra Botan bi Eyaleta Meyaferqînê (Sîlvan) ve tê girêdan.

Di şeşemîn êrîşên Xaçperestan de yên ku li ser Kurdistanê didin pêkanîn, Kurd li gel Ereban cîh digirin, ev tercîha Kurdan di dîroka Kurdan de, weke şopekê dimîne. Kurê Selahadin Eyûbî, artêşeke ji Kurd û Ereban pêk tê çêdike, êrîşî ser Xaçperestan dike û bi serdikeve. Di vê serkeftinê de Qudisê ji dorpêça Xaçperestan rizgar dikin. Cizîr jî di vê demê de di bin desthilatiya Eyûbiyan de ye. Di

dîroka Kurdistanê de Mezrabotan û Cizîr di pêvajoya çaxa navîn de, xwedî roleke girîng in.

Cizîr ji qirnê 14. heta qirnê 19. paytexta Mîr û Bega ne. Cizîr, di 1516'an de ji aliyê gelek mîrnîşîna ve bi rêbazên xweser tê birêvebirin. Ew pêvajo heta destpêka qirnê 19'an berdewam dibe. Di dema Bedirxaniyan de pir kêm jî be demeke ronî û xweş derbas dibe. Mîrnîşiyên Ezîzan yên Cizîrê, ji sala 1270'an ve bi awayê xweser tevger dikin. Pereyên xwe bi navê xwe derdixînin. Di dema beg û mîrnîşiyan de, her çiqasî dem bi dem pevçûn hebin jî, lê belê li gel wan pêvajoyan risteke hêja û kesayetên girîng derbas kirine. Dîsa ji aliyê Mîrnîşiyên ezîzan ên Şerefxan ve di sala 1508'an de li Cizîrê, maleke ya bi navê perwerdê û medreseyê çêdike. Ew medreseya bi navê "Medresa Sor" ku bi kevirên sor çêdike, ji bo wê navê wê dixin Medreseya Sor. Di vê medreseyê de gelek mirovên navdar ên weke Melayê Cizîrî, Ehmedê xanê, Feqê Teyran perwerde dibînin û li heman medreseyê perwerdeyê didin.

Şaîrê Kurd Melayê Cizrawî piştî perwerdeya xwe ya Medreseya Sor, li Amed, Hesenkeyf û Bexdadê perwerdeya astronomî û felsefe dibîne. Piştî wê dizivire Cizîrê û li wê derê dest bi perwerde dayînê dike. Dîsa di helbestên Cizîrî de çand û zimanê Kurdan li pêş e. Di wan berhemên xwe de pêwendiyên xwe yên bi mîr û began re jî tîne zimên. Melayê Cizîrî 75 salan dijî, piranî wextê xwe dide zanist û çandê. Di nav berhemên Cizîrî de ya herî li pêş dîwana wî ya ji 2 hezar beyîtan pêk tê ye. Di sala 1664'an de piştî ku diçe ser dilovaniya xwe, wî li Medreseya Sor dispêrên xakê.

Dîsa yek ji wan şagirt û fîlozofê Medreseya Sor, Ehmedê Xanî dema ku li Cizîrê bûye, berhemek herî girîng ji bo gelê xwe mîrate hiştiye, ev berhem jî Mem û Zîn e. Berhema Xanî ya ku bi Kurdî nivîsandî, berhema wî ya girêdayî Destana Memê Alan, çîrokeke evînî ya destanî ye. Çîroka evînî ya destanî, ya kurê katîbê sarayê Memê Alan û xwişka Mîrê Zeydan Zînê, her tim ji aliyê xizmetkarê mîr Beko ve tên asteng kirin. Dîsa di çîrokê de ji aliyê Beko ve Memê Alan tê girtin û di zîndanê de tê jehr kirin. Zîna Zeydan jî piştî vê bûyera bi êş întîxar dike. Destbirakê Memê Alan Tajdîn jî Beko dikuje. Çîroka evîniya destanî bi vî rengî diqede.

Lê belê weke ku tê zanîn berhema Xanî tenê bi çîrokeke evînî re sînordar namîne. Ew di vê berhema xwe de behsa neteweyeke ku di bin dagirkeriya Fars, Ereb û Osmaniyan de divê bê rizgar kirin dike. Ev berhema wî ji berhemeke wêjeyî zêdetir, berhemeke hizrî û felsefî ye. Dîsa dide diyar kirin ku, evîn wisa bi hêsanî di bin dagirkerî û xiyanetê de bê têkoşîn nayê bidestxistin. Ji bo wê diyare ku di medreseyên wê demê de evîn mîna ilmekî hatiye xwendin. Ji bo wê gotina wî ya ku dibêje: “derdê dile xwe bêxim efsane û Mem û Zîn jî bêxim bahane” heye.

Di destpêka qirnê 19. di sala 1812’an de Mîr Bedirxanê 18 salî dibe Mîrê Botanê. Piştî ku tevgera xwe ya serbixwe didamezrîne, hemû eşîrên Botanê yên ji derve û hindur bi xwe ve dide girêdan. Dîsa ji bo bazirganiya Cizra Botanê ked û hewldaneke mezin dide. Her wiha Mîr Bedîrxan, di Cizîrê de du karxaneyên barut û çekan çêdike, vêrgiyên li ser gel jî kêm dike. Di sala 1830’an de Mîr Muhammedê ku li hemberî Osmaniyan serî radike, wî û derdora wî tevlî mîrnîşîna xwe dike. Mîr Bedirxan, di 1836’an de li hemberî Osmaniyan yekemîn car serî radike. Ji bo wê Osmanî di bin fermandariya Mustafa Reşît Paşa de artêşeke mezin dişînin ser Bedirxan Beg. Di vî şerî de Bedirxan Beg xwe dispêre Kelha Cizîrê. Piştî 40 roj û şûn ve Reşît Paşa pêşniyaza wî qebûl dike.

Di hişê Mîr Bedirxan Beg de têkoşîneke rizgariya netewî heye. Ji bo wê divê eşîretên Kurdan, weke Bêdlîs, Colemêrg, Wan, Muş, Qers bibin yek û li hemberî Osmaniyan û Îranê dewleteke ku xwe dispêre vîna xwe avabike. Di sala 1842’an de hêza xwe ya serbixwe îlan dike. Dîsa pere/sikê çêdike û li ser Bircên Cizîrê jî ala Kurdan li ba dike. Li hemberî vê vîna Bedîrxan Beg, di sala 1847’an de Osmanî, di bin Fermandariya Topal Osman de bi hêzeke artêşa mezin ve li ser Bedirxan seferê dikin. Dema ku Mîr Bedîrxan di herêma Wanê de li hemberî Topal Osman şer dike û xeta parastina xwe xurt dike, li ser hêza leşkerî ya Botanê jî Yezdan Şêr datîne.

Împeretoriya Osmaniyan pir baş dizane ku wê bi şer sernekeve û wê bi wî awayî di demeke kurt de encamê jî negire. Ji bo wê serî li dekûdolabên qirêj dide. Jixwe tê zanîn ku di dîroka Kurdan de di her demekê de xiyaneteke hindurîn a Kurdan hatiye jiyîn. Îxanetkarê wê

pêvajoyê jî Yezdan Şêr bixwe bûye. Di encama vê xiyanetê de Yezdan Şêr bi rûşvet û rûtbeya Osmaniyan, bi hevkarên Osmaniyan tê xapandin û xiyanetê li gelê xwe dike.

Piştî vê xiyanetê bajarê Cizîrê dikeve. Bedîrxan Beg di Kelha Ewrexê de tê dorpêçkirin û teslîm dibe. Malbata Mîr Badirxan di sala 1874'an de mişextî Stenbolê û ji wir jî mişextî Giritê dibin. Bedîrxan Beg di sala 1868'an li Şamê diçe ser dilovaniya xwe. Piştî ku Cizîra Botan hate xistin, dewleta Osmaniyan dest bi tevgera çewisandinê dike. Piştî vê tevgera çewisandinê bi hezaran mirov dikevin girtîgehan, gelek kes tên darvekirin û gelek kesan jî mişextî dikin. Dîsa di dema şer de nexweşiya kolera ku hatibû peyda kirin, piştî şer jî dibe sedem ku di Botanê de bi hezeran mirov bi vê nexweşiyê jiyana xwe ji dest bidin. Cizîra Botan bi şer, bi mişextî, bi mirinên pir dijwar, bi êş û xwîn derbasî qirnê 20. dibe.

Gelê Kurd bi hezaran salan ji aliyê gelek Împeretoriyan ve hate çewisandin, bi êrîş û komkujiyên mezin xwestin Kurdan ji rûpelên dîrokê derxînin. Di qirnê 20'an de jî, berdewamiya vê zihniyetê li ser gelê Kurd qirkirin, komkujî, bişavtin bi formên dewleta netew domandin. Ev dewletên ku di nav xwe de desthilatiyê parve dikin û dixwestin li ser dinyayê serweriya xwe pêk bînin, gelên dinyayê ber bi komkujî, qirkirin û şereke bê dawî ve birin. Şerên ku di nav dewletên mêtînger ên mezin weke Almanya, Îngîltere û Emerîkayê de hatibûn meşandin dinya ber bi karasatekî mezin ve biribû. Rojhilatanavîn jî di nav wî şerê hevparkirinê de bû.

Dîrok û erdnîgariya Kurdistanê jî ji ber rewşa xwe ya stratejîk û dîsa ji ber dewlemendiyên axên xwe, ji ber nefta xwe her tim di nav hesabên qirêj ên dewletên mêtînger de bûye. Ji bo wê li ser axa welatê Kurdan, çawa ku mîna serdemên din her tim ji aliyê Împeretor û dewletên mêtînger ve bûye yek ji cihê dagirkeriyê, di qirnê 20'an jî ji aliyê van dewletên mêtînger ve Kurdistanê bi ser wan dewletên netew parvedikin û parçe dikin. Bi vê formên xwe şerê herî mezin li ser erdnîgariya Kurdistanê dikin û heta niha jî ew şer bi formên cuda cuda berdewam dibe.

Li hemberî vê zihniyeta înkarker û qirkirinên di qirnê 20'an de li ser Kurdan dihatin kirin, ji aliyê gelê Kurd ve gelek raperîn û

serîrakirin hatin pêşxistin. Lê belê ji aliyê van dewletên mêtînger ve her tim bi komkujî, bi qirkirinên ku wê dîroka azadiyê ticaran jibîrneke hate çewisandin û hewl hat dayîn ku ji holê bê rakirin. Bi darvekirinên serokên Kurdan bigire heta bi mirinên cur be cur xwestin Kurdan bêdeng bikin. Bi serhildana Seyîd Riza re ser hişmendiya civaka Kurd çîmento rêjandin. Lê belê weke ku dîrok ji me re piştrast dike, Kurdan jî her tim mîna gula berfînê çawa ku di nav sermaya berfê de serî radike, li hemberî zilm û zordariya zalimane serî rakiriye, her û her li ber xwe da ye.

Li hemberî vê zîhniyeta ku ji xwe re digotin “Kurd nikarin careke din serîrabikin” ji nava dilê Kurdistanê dengekî zelal serî hilda (Rêber Apo). Ev dengê ku serî hildayî bi ezmûnên dîrokî li ser hebûna Kurdan dengê xwe li hemberî faşîzma dewletên dagirker yên qirnê 20’an ku digotin; “Wê Kurdên azad li dinyayê tine bibin.” Lê belê ne wisa bû. Hesabê malê û ya sûkê li hev negirt. Dengê keştiya azadiyê, bazara plangeriyên dagirkeriyê berovajî kirîbû û wî di keştiya xwe ya azadiyê de dengê mirovahiyê ji nû ve nûjen dikir û vîna gelê Kurd ji nû ve diafirand.

Gelê Cizîra Botanê jî piştî bêdengiya teslîmbûna Bedirxaniyan, bi vî dengî ji wê xewa giran hişyar bibû. Û di vê keştiya azadiyê de cihê xwe girtîbû. Dîsa bi agirê Mazlum Doxanan ve Newroza xwe pîroz dikirin. Cizîrê di sala 1990’an de êdî bi berxwedana Bêrîvanan serî hildida. Çawa ku kulîlkên biharê, li ser Newroza Kurdan bêhna xwe difûrand, Cizîr jî êdî bihara xwe bi Newroz û bi berxwedanê li ser Kurdistanê dida belavkirin.

Piştî Newroza sala 1990’an şûnve gelê Botanê û Cizîrê her tim li qadan serî hildida. Gelê Cizîr û Botanê hêza ku herî jê bawer dikir, tevgera azadiyê bû û hêza xwe bi xwe bû. Govend û dîlanên wê bi sloganên azadiyê ve dihatin qêrîn. Merasîmên wan ciwanên ku di van meşên azadiyê de giyanên xwe ji dest didan dibûn serhildan. Êdî kûçe û kolanên Cizîrê ji bo dagirkeriyê dibû dojeh û bi serê dagirkeriyê dihat xwarê. Dîsa pevçûnên bixwîn li kolanên Cizîrê dihatin jiyîn. Rexmê hemû zordariyan jî dengê berxwedana serhildanên Cizîrê ji dûr ve her belav dibû.

Di wê deme de jî li qada Cûdî, Gabar û Kato pevçûnên dijwar dihatin jiyîn. Di encama wan pevçûnan de bê sînor mirovên bêguneh dibûn qurbanê vî şerê qirêj. Dengê berxwedana ku ji wan çiyayên azadiyê bilind dibû gelê Botanê û Cizîrê ji koletiyê rizgar dikir. Dagirkeriya faşîzma Tirk, bi navê ku em ê PKK'ê xelas bikin, hemû gundên Botanê û Kurdistanê dida ber xwe û tar û mar dikirin. Xelkê heremê di meydanan de kom dikirin û bi mirinên faîlîmechul dihatin windakirin. Gelê heremê bi zorî ber bi cerdevaniyê û penaberiyê ve dibirin û yên ku cerdevanî qebul nekiribûna bi îşkence û mirinên herî hovane rû bi rû dibûn. Lê dîsa jî gelê Cizîra Botan bi giyanê di dema têkoşîna netewî de li hemberî dagirkeriya Fransa dayî nîşandan ku dewleta Fransa dixwest bê şer Cizîrê teslîm bigre; lê dema ku berxwedaniya gelê Cizîrê dibîne, li xwe mikûr tê û paşve dizivire. Ji bo wê gelê Cizîra Botan xwedî kevnekşopiyeke berxwedan û serhildanê ye.

Dîsa Cizîra Serhildêr, bi wî giyanê xwe di sala 2015 û 2016'an de jî, di dema pêvajoya xweseriya demokratik a Cizîrê de ew çanda xwe ya berxwedêr dide berdewamkirin. Di şexsê pêşengê berxwedana Cizîrê Mehmet Tunç, Aysel Yüksel, rêheval Rûken û hemû berxwedêrên Cizîrê de 73 rojan bi giyanê xwe yên nemir berdewamiya vê kevneşopiyê li hemberî faşîzma çeteyên Erdoğan ên hovane nîşan didin û li ber xwe dan.

Dîsa di şexsê rêheval Mehmet Tunç de careke din Cizîrê serî hilda û li hemberî dagirkeriya çeteyên dewleta Tirk teslîm nebûn. Weke rêheval Memet Tunç dibêje: “Me li ber xwe da, me çong nedanî û bi me serbilind bin!” Bajarê serhildêr Cizîr careke din bi sekna leheng û pêşengê xwe rêheval Mehmet Tunç bi şanazî mohra xwe li dîroka sedsala 21. ya gelan xist.

Li hemberî hegemoneke cîhanî Kurdan her tim li ber xwe da. Hîn jî li ber xwe didin. Berxwedan li welatê şervanên rojê bêhempa ye. Şervan û fermandarê welatê Rojê rêheval Çekdar jî bi jiyan û têkoşîna xwe beşek ji vê çîroka ber xwe danê bixwe bû. Rêheval Çekdar jî li ser vê kevneşopiya dîroka xwe, di sala 1994'an de li vî bajêrê berxwedêr tevlî refên gerîla dibe. Di cih û dîroka 29'ê Mijdara

1999’an de li qada [1]Garê Çemankê-Başûrê Kurdistnê di operesyon û encamê kemîna tangên dewleta Tirk û hevkarên wan de jiyana xwe bexş dike û tevlî karwanên şehîdan dibe. Li ser jiyana şehîdê nemir, rêhevalên wî wisa behsa bîranîn serpêhatî û têkoşîna rêheval ÇEKDAR dikin.

***“Gelê Cizîrê di vê berxwedanê de li hember tank û topan çiqasî dikare li ber xwe bide nîşan da. Gelê Cizîrê di vê sedsala 21. de rûmeta mirovatiyê nîşanî cîhanê da.”***

**Mehmet Tunç**

* Ji bo agahiyên dîrokê ji parêznameyên Rêber Adulah OCALAN sûd hatiye wergirtin.

## Rêwîtiyek Bêdawî

“Hinek kêlî hene mirov nikare behs bike û nikare pênaseya wê bike. Tenê divê mirov ji bo zeferê têkoşîn û kar bike. Me peywirê xwe li hemberî keda Serokatî cih neanî. Di vê sala dijwar de ku bi pîlangeriyek mezin ya navdewletî û navnetewî li ser Serokê me û li ser gelê me hate pêkanîn. Di pêvajoyek wisa giring de, her çiqasê ji bo min û zor û zehmete jî be, lê ez bi vê deyndariya xwe ji qadê derdikevim û berê xwe didim Başurê Kurdistanê.” (şehîd Çekdar di lênûskek xwe ya biçûk de wisa qala wan rojan dike).

Hevalê Çekdar hûn di taxima çûndina Başur de çidikin, min wer dizanî hûn li Mêrdînê bûn.

Raste hevalê Celal. Ez heta berî çend rojan jî li Mêrdînê û Gabarê bûm. Lê biryargeha navendî telîmat şandiye, divê em derbasî Başur bibin.

Ya heval banî min jî kirine û ez jî naxwazim di pêvajoyeke wisa giring de biçim Başur. Lê ez dizanim çima banî min kirin e. Bi teqez ji bo şkeft çêkirinê banî min kirine. Ma wê ji vê zêdetir çima banî min bikin. Hevalê Çekdar, ji min re wisa tê, hûn hinekî xemgîn diyarin?

Ya rastî hevalê Celal ez jî naxwazim biçim Başur. Di pêvajoyeke wisa man û nemanê de Sekrokatî dîl hatiye girtin. Divê em hemleyên pir mezin bikin. Lê hevalan banî me kirine. Niqaşên me yên herî dawî jî piştî ku hevala Ruken Garzan û hevalê Hakî jî çûn, wisa nebû. Divê ez li wê derê bimama. Lê niha jî rêxistinê banî me kiriye. Lê di hatina min de ez di fikirim ku sedemek din heye.

Herî dawî dema Botan(Nîzametîn Taş xiyanet kiriye) û bi koma pê re ji hûndir paşve kişiyan û hatin gel me pir zêde tişt xwestin. Lê ji ber rewşên operasyonê min heval ji bo wan zêde nexistin nav xeteriyê. Dîsan ji aliyê ewlekariyê ve pir belav bûn. Min ew û koma wî rexnekir. Piştî ku ji me xatir xwestin hinekê destê min guvaşt û ji min re got: “ hûn ji bo vê qadê neguncavin, demeke kin de em ê hev bibînin”. Gelo dibe ku bandora gotinên wî li ser vesazbûna min bandor kiribe.

Celal hinek serê xwe hejand û got; “Botan e, keyfiyet babasiye. Xwe li gorî şoreşê plansaz nake. Şoreşê li gorî keyfiyet û daxwazên xwe yên şexsî plansaz dike. Di nava PKK’ê de ew ticar nebûye PKK’yî.

Heval ma hûn wî berê nas dikin?

Na, yekem car bû min dît. Lê ez di dahûrandinên Serokatî de hinek nas dikim. Serokatî gelek caran di dahûrandinên xwe de behsa kesayetiya wî û şêwazê wî yê jiyanê kiriye. Û şêwazê wî yê şer jî gelek caran mehkûm kiriye. Lê hevalê min yê şirîn, ji ber gotinên Botan xwe pir dilgiran neke. Cihê ku hûn biçînê rêveberiya rêxistinê û hevalê Cemal jî li wê derê ye.

Hevalê Çekdar, niha ev der Garê ye?

Belê heval Celal. Li gorî hevalê ku kuryetiyê ji me re dike got, navê vê derê Çemankê ye. Çemankê û çiyayê Garê cihekî xwe yê navendî heye. Li pêş xwe silsilên çiyayên Zagrosan girtine. Li kêleka wê çiyayê Bêxêr heye. Li bedena xwe çiyayê Kuruşehrû û Metîna heye. Ew jî weke herêmekî navendiye. Gelek berfirehe û ji hev qut nabe jî. Herî zêde bi daristan û ava xwe tê nasîn. Teybetmendiyê daristana wê ji hev qut nabe. Em dizanin berê û dîrokê de li vê heremê Kurd, Ereb, Aşûr û hinek netewên din bi hev re jiyane. Hîn hinek malên Aşûr li gel Kurdan, li van gundan jiyan dikin. Çemankê derdora xwe bi çiyayê Garê bilind e. Çemankê jî weke adayekê di hindirê wê de ye. Du çemên avê di kêleka wê de tên. Di binya Çemankê de jî her du av digihêjin hev. Derdora wê hemû baxçe û fêkîne. Ciheke gelek xweş û bedew e. Axa wê jî gelek dewlemed e. Lê mixabin ji dîrokê heta niha li ser vê axê şer li ser civaka Kurdan xilas nebûye.

Hevalê Çekdar, we di van çend rojan de çawa ev qas zanyarî li ser Çemankê wisa ji xwe re komkir?

Hevalê Celal serê xwe hejand, “wisa ye. Kurdan li van Çiyayên xwe, gelek ber xwe dane. Li hemberî zilma Sedam jî gelek ber xwe dane. Gerîla jî li vê qadê li himberî xiyaneta mala Barzaniyan li ber xwe dane. Û gelek hevalê me jî di şerê xiyanetê de şehîd bûne.

Hûn jî yekemcare tên Garê, ne wisa ye? Raste heval. Di 1997’an de, dema ku ez çûm qada Serokatî wê demê min Çiyayê Spî dit. Lê yekemcare ez têm Garê. Ax hevalê Çekdar, te tam birîna min vekir. Eger ku wan fermandarê Botanê bixwestan min rêkin qada Serokatî, dikarîbûn pir rehet min rêbikin. Lê belê her roj ji Celal re kar peyda dikirin. Îsal em ê çend qereqûlan rakin, ji me re hewancî

pêwîst e, yan jî em ê li filanderê şkeft çêbikin, pêwîstiyê me bi te heye. Divê tu biçî wê derê. Çîroka me ya qada Serokatiyê wisa ye. Hûn hevalê ciwan yên vê demê pir bi şansin. Hevalê min ew şans nebû qismetê me. Lê tu dizanî hevalê Çekdar, dîrok me efû nake.

Çavên Çekdar tejî rondikên girî bibû. Wî dizanî hevalê wî wê çi bibêje. Hema berî ku hevalê wî Celal biaxive û bibêje, “erê heval, me nekarî di van Çiyayê xweş de cihekê ji Serokatî re çêbikin û wî biparêzîn. Raste heval. Îca Serokatî çiqas ji van çiyayan hezdikir. Lê ji bo rizgar kirina Serokatî em çibikin divê em bikin. Weke gerîla û gelê Kurd têkoşîneke mezin divê em bidin. Yan jî dîrok qet me efû nake. Hevalê Celal ne tenê dîrok me efû nake. Em ê bi rûreşî bikevîn rûpelên dîrokê.

Hevalno ev îro çend roje em di rê de ne. “Heftiyekî zêdetire hevalê Celal.” Çekdar dema ku çayê li ser agir dikeland bi rûkenî li Celal meyze kir û got, “hevalê Celal ka wê radyoya xwe ya tuşlî veke, em hinek cihaza mezin guhdar bikin. Ez dema hatim min radyoya xwe ji hevalên Gabarê re hişt.

Celalî ew radyoya xwe ya di nav paçê qedîfeyê sor de pêça bû derêxist, destê xwe rakir û banî Çekdar kir. “Ka were vê derê. Ez nizanim di vê radyoyê de cihaza mezin di kîjan qenalê de dikişîne.” Hevalên derdûra Çekdar pê kenîn û gotin, “hevalê Celal, hûn radyoyê fam nakin. Pêşniyara me ewe ku hûn radoya xwe bidin hevaleke rewşenbîr.” Kesek ji wan hêviya bersiveke wisa sosret ji heval Celal hêvî nedikir, hevalê Celal tijî devê xwe gotin kirin, bi zimanê Botî “wile di dilê we de bibe kol jî we tam nekir.” Bi gotina hevalê xwe Celal re bû pîqe pîqa kenê wan.

Çekdar berê xwe zivirand û ji hevalan re got: “Heval, bila heval ji kerama xwe hinek bêdeng bin, em ê agahiyên cihaza mezin guhdar bikin.” Çavê Celal birîqîn, “wey hevalê Çekdar rehmeta xudê li te û babê te be. We ev hevalên ku pir taxivîn bêdeng kirin.” Bi dengê hemû deryayên ku me guhdar dikirin, hemû kes bêdeng bûn û radyo guhdar kirin. Dema dengê ku ji radyoyê derdiket û digot: “bila hemû derya li ser qenala roj amade bin, em ê encamê operasyonên a niha li qada Başur û Garê berdewam dibe rabigîhînin.” bala hemûyan

dikêşand. Çekdar ji bo çalakiyên hevalên xwe qeyt bike, pişre jî ji hevalên koma xwe re bide guhdar kirin, teyîba xwe derxist û danî ber radyoya hevalê xwe Celal.

"Hemû deryayên ku li me guhdar dikin. Operasyona Garê bi 19 hezar leşker û xayînan hatiye dest pê kirin. Di 24' ê Mijdarê, di siberojê de dijmin dema ku dixwest bikeve qada Pîrêzê, hevçûn derdikeve. Heval bi dijwarî ji çend aliyan ve hêza operasyonê didin û hêzên wan qedemeyekê bi paşve dikişên. Di dema paşvekişandina hevalan de, kesekî ku bi navê Berxwedan, birê wî kesî, berê ji aliyê hevalan ve hatibû cezakirin, guleyekê hevalê Dijwar dide û hevalê Dijwar şehîd dixe. Heval wî kesî digrin û dixin nava lêpirsînê. Disan di heman dema paşvekişandinê de hevalê Kehraman yê ku fermandarê mangê bû, ji havalan qut dibe. Îhtîmaleke mezin şehîd e. Dîsan dijmin dema ku dixwest derkeve Heftebeqê, heval di gundê Yekmalê de lê didin û êrişên dijmin bê bandor dikin. Qobrayên dijmin li dûrê Kaniya Orhan li hevalan didin û li vê derê jî heval Dîrok û heval Xanê şehîd dikevin. Di heman bûyerê de sê heval birîndar dibin. Ji wan hevalên ku birîndarbûyîn,  hevalê Devrîm û hevalê Rizgar xwe di arazî de vedişêrin, lê 28'ê mehê yanî şevê din dîl dikevin destê dijmin.

Dîsan di 24'ê mehê de dema dijmin dixwaze li Bergarê operasyonê bike, ji aliyê hevalan ve kemîn tê dayîn, hêza operasyonê dîsan bêbandor dibe. Dîsan di heman rojê de araca landgrosa leşkeri nêzî Bêbata pê li mayîna antîtangê ku hevalan danibû dike û diteqê, leşkerên ku di maşînê de bûn hemû tên îmha kirin. Nêzî şkefta di girê Semu de mayînek tê teqandin. Li vê derê jî xayînek dimre û lingê du xayînan jî jêdibe. Dîsan koma dijmin dema ku dixwest derkeve girê Serbest, ji aliyê hevalan ve ji şeş cihan ve tê lêdan. Ji aliyê Çemankê ve jî heval li wan didin. Dema hêza dijmin giran windahiyan didin, êdî qobra tên. Li vê derê jî hevala Newroz ya taxim komutanî û hevalê Xebat şehîd dikevin. Dîsan gelek cihan heval bi dijwarî li hêzên dijmin didin û operasyon hîn jî berdewam e."

Celal bi xemgînî radyo xiste destê Çekdar û rabû ser xwe. "Weyla mala min ê. Hevala Newroz jî şehîd ket. Ez hevalê Xebat nas nakim, lê demeke dirêj ez û heval Newroz bi hev re man." Di wê

kêliya ku Celal ji Çekdar re behsa jîrbûn û perîbûna hevala xwe Newroz dikir, Batal yê ku fermandarê taximê bû, hate gel wan û ji wan re got: "heval em hemû cihên cuda cuda hatine û niha li gel hev kombûne û em ê derbasî Qendîlê bibîn. Ji ber ku hemû heval ezmûnên xwe yên şer hene ez zêde behsa quralê rê nakim. Lê ez bi hêvî me hemû heval wê di vê mijarê de baldar bin. Hûn dizanin, operasyon pir dijwarî berdewam e. Heval jî pir baş li wan didin." Batal berê xwe zivirand ser Celal û Çekdar, "jixwe hevalê Celal û hevalê Çekdar jî hevalên nû ji Botanê hatine ne. Ger ku îşev di rê de tiştek hate pêş, heval li gel me ne." Taxima wan bi henek û bîranînên hevalê Celal ketin meşê.

Reşatiya şevê ne weke çi şevên din bû. Komên stêrkan hema hema bi zorê birîqîna ronahiya xwe didan ser erdê û di kêliyan de jî di nava pelên ewran de winda dibûn. Esman di nav şeveke reş de, ha dibû sahî û ha dibû ewr. Lê şev reş bû. Sîbera mirovan ji hev ditirsiyan. Pêşiyên kal û baban jixweber negotibûn: " tenê ne hesp ji sîbera xwe ditirsê, har û hêrs dibe. Pir caran mirov jî ji sîbera xwe ditirsin, har dibin û dibin xayînên herî mezin." Dema ku Çekdar di vê şevreşê de dimeşiya gurmêniyên top û hewanên dewleta Tirk û guleyên nokerên wan(PDK) pir nêzî wan dihat, ev gotin di hizrên wî de derbas dibûn.

Di meşê de, hema li pişt wî hevalê wî Celal hebû. Di bêdengiya şevê de bêyî ku siya şevê jî bibihîse hêdîka guhê xwe bire ber guhê hevalê xwe Celal û got: "Van nokerên xayîn ji siya xwe jî ditirsin." Celal bi dengê xwe yê çiyayî bêdengiya siya şevê belav kir. "Heval, ma tenê malbata Barzanî ji siya xwe ditirsin, dîroka wan hema hemû nokertiye. Ji nijada 'qewmê kewê' tên. Te çîroka Kewê bîhistiye?" Çekdar hîn xwe nêzî Celal kir û got; "weke ku dibêjin, 'kew dijminê qewmê xwe ye. Tenê ez vê dizanim."

"Ka hîn xwe nêzî min bike ez ji te re bibêjim. Kewek dikeve destê nêçîrvanekê. Nêçîrvan di ciheke baş de kewê datîne ku ji bo banî kewên din jî bike. Kew jî banî qewmê xwe dike û nêçîrvan jî wisa li ser nêçîrvaniya kewa dewlemend dibe. Rastiya malbata Barzaniyan jî ev e. Ma ji xwe ve pêşiyên me negotine, kurmê darê ne ji darê be, dar narize. Kurmê dara Kurdan jî malbatûka Barzaniyan e. Ger ku

hevkariya Tirkan nakin, ma çi karê tangên Tirkan li ser vê axê hene. Lê hevalê Çekdar, her ku ez kewa dibînim ew çîrok tê bîra min û ez xwe nagirim, hema dixwazim wana bikujim.”

Çekdarî tejî devê xwe gotin kirin û xwest ji hevalê xwe Celal re bibêje: “xiyaneta Kurdan ne tenê bi van çîrokan sînordar e. Her di serî rakirina Kurdan de bi teqez Beko Ewanek heye. Ma ji xwe ve Şêx Seîdê Pîran negotiye; “xiyanet tewana herî mezine û na şibe çi tewanên din, nayê ji bîrkirin û nayê efûkirin.” Di wê kêliyê de teqîniyeke mezin li nava koma wan ket. Zimêniyeke mezin ji dinê hat. Erd qelişî û şev bû mahşer. Dengê dawî yê Batal “xwe bavêjin erdê, em ketin kemîna tangê” hate guhê Celal. Celal berê xwe zivirand ku ji Çekdar re bibêje: “zû bikin em xwe bavêjîn ber wan tehtên pêşiya me.” Lê kesek li dora xwe nedîtibû. Li ser destê xwe kêmek ber bi jêr ve çû, dît ku Berçema por bi hine û çav xezal bîrîneke mezin di singê wê de vebibû. Birîna singê wê wisa lê hatibû, her du destên mirov diketin nava birîna wê û serê wê jî ketibû ber. Porê wê yê reş ji xwînê sor bibû û şehîd ketibû. Li tenişta wê jî bedana Bêrîvana Dêrsîmî ya nazenîn bibû du parçe û parçê laşê wê ku laş û serî nedihat naskirin, li tenişta Berçemê, ew jî şehîd ketibû. Dilopên xwînê bûn lehî û herikîn nava dilê Celal. Kela giriyê kete dilê wî. Qirika wî tejî bû. Heta çend kêliyan di wê rewşê de ma. Paşê dîsan bi ser xwe ve hat, got; “Hevalên min yên herî delal. Ez careke din soza xwe li hemberî giyanê we yên pak dubare dikim. Ez ê di rêya têkoşîna we de tola we ji zaliman rabikim.”

Ji dengê fîze fîza lêdana elîkopterê û tangê, Celal guhê xwe digirt û li ber wî kevirî xwe davêt li ber wî kevirê din. Li ber wî kevirî jî hevalê wî Xebat û Xeyrî hema li kêleka yektir şehîd ketibûn. Çavê wî zîq heta çend deqeya li ser wan jî ma. Celalî li Botanê gelek şerên mezin û şerên zor, rojên zor, çalekiyên mezin, kemînên zehmet û şehîdbûna gelek hevalên xwe dîtibû, lê ne li vê bêbextiyê ku nedikarî hevalê xwe xilas bike. Wî xwe di wê kêliyê de di valatiyeke mezin de hîs kir. Bi dileke kelegirî ji xwe re got: “Ma ez tenê mayîme sax heval!” Dîmenên Berçemê û Berîvanê ji ber çavê wî nediçûn. Xwe di wê kêliyê de di nava miriyên ku parçepaçebûyî de ku weke çîroka kalikê wî tê de behsa qetlîama Geliyê Zîlanê û Dersîmê jê re kiribû

hate bîrê. Bi hêrs bû piste pista wî. Di bin lêvên xwe de ji xwe re axivî û got: "Ma ev jî yek ji wan qelîaman e gelo. Ma çima di nav vê komkujiya bêbext de tenê mame. Ma kanê hevalên din. Ma ka Çekdar. Batal li kî derê ye. Hevala Zeynep Pazarcik, Tolhildan, Doxan, Ciwan, Cudî, Bahoz, Sena, Avesta, Feqe, Şoreş Teknîkçî, Şerzat, Şoreş Kobanê û Cevdet. Ma çi ji wan hevalan hat. Çima ez wan nabînim." Hîn navên hevalê xwe ji xwe re ser hev dubare dikir, bi gurminiya dengê tangê xwe dîsan avête erdê. Di nava toz û dumanê de ma. Destê xwe da laşê xwe û dema ku xwîn nedît li ser destê xwe hêdîka rabû ser xwe û pişta xwe da dara maziyê ku pelên wê yên zerbûyî di nava toz û dumanê de mabûn.

Hîn di guhê wî de zimêniya dengê tangê û roketên qobarayê xilas nebibûn, dengê nalenaleke kûr hate guhê wî. Destê xwe xiste nava toza guhê xwe, kêmek paqij kir û guhê xwe da ser wî dengî. Ew deng rast bû. Li ser destê xwe ber bi wî dengî ve xwe xişxişand û çû. Dît ku di nava gurzeke dara çilo de ku pelê wê hinek zer bibû, hevalê wî Çekdar giran birîndar bûye. Hema xwe avêtê û ew bi hesret himêz kir. "Hevalê Çekdar ka çavê xwe veke çavê min, tu ji kî dera xwe birîndarî? Kanê hevalên din, ka hevalê Batal." Çekdar ji ber êş û jana birîna lingê xwe û pişta xwe nedikarî bersivê bidê. Tenê dikir nale nal. Birîna Çekdar gelek giran bû. Celal bîrîna wî bi şûtika xwe girêda, ew hêdîka rakir û çentê xwe da ber pişta wî.

Celal li seata destê xwe nêrî, ji bo siberojê hîn du seat mabûn. Roniya stêrka sibê ji aliyê bakur ve hema hema derketibû. Destê wî di destê Çekdar de bû li ber serê Çekdar ji bo kêliyeke jî be xwe dûrnexistibû. Ji xwe re her digot: "bi teqez ez ê te baş bikim. Em ê dîsan bi hev re biçin Botanê." Rabû di çenteyê xwe de hinek amûrên biçûk yên pansûmanê derxistin, lê negengazbû birîna Çekdar bi wan dermanan sax bibe. Çekdar kêmek jî be mijankê çavên xwe vedikir û digirt. Kêliya ku çavê xwe kêmek vekir, destê Celal ji aliyê xwe de guvaşt û lêvên xwe yên tenik bir û anî û av xwest. Celal çavên xwe li ser Çekdar mezin kir, "nabe hevalê min, ji bo birîndaran av qedexe ye. Lê ez ê şûna avê ji te re behsa bîranên me bikim."

Çekdar li çavên wî nêrî û kêmek beşişî. Hemû serpêhatiyên xwe di çavên hevalê xwe Celal de dîtin. Weke eynikê hate ber çav û

dîsan hate bîrê ku yekemcar çawa hevalê xwe Celal dîtiye. Lê tiştek li ber çavê wî qet neçû. Soza dabû Serokatiya xwe ku “ez ê zû şehîd nekevim” kêlî bi kêlî hate berçavên wî.



## Yan Tu Yê Ji Aliyê Siyasî Ve Nîjada Xwe Berdewam Bikî Yan Jî Wê Bedîrxaniyê Dawiyê Jî Bimire!

**Çekdar**: Nasnavê min Çekdar e. Navê min Lokman Bedîrxanoglu ye. Di 1977'an de girêdayî navçeya Cizîrê li Gundê Şaxê jidayikbûme. Taybetmediyên malbata min ên neteweperestî hene, ez bi giranî ji navendeke ku ji aliyê siyasî ve dagirtî têm. Min di sala 1991'an de li Cizîrê di asta xebatên komîteyên dibistanê de kar kir. Min heta sala 1994'an xebatên dibistanê berdewam kirin, di heman salê de ez tevlî rêxistinê bûm. Çar salan jî ez li Botanê mam. Di payîza 1997'an de ez hatim vê qadê. Di vê qadê de bi taybet di dewreya perwerdeyê de min gelek tişt derxistin zanebûnê û ez dikarim bibêjim, min kûrbûnek jiya.

Ez dikarim bibêjim ku, bi taybet di dewreya lêhûrbûnê de jî ez ê vê kûrbûnê bi rêbazên rastiya Serokatî û jiyana wî re di asta biryardariyê de bikim yek; her wiha ez ketim ferqa wan valahiyên ku weke zinaran di kesayeta me de tên jiyîn. Dikarim bêjim ketime wê pêvajoya ku ez bikaribim kesayeta xwe biafirînim. Ji vî alî ve ez xwediyê nêrîneke mezin û biryardariyekê me. Bi taybet bi şêwazekî aşkera derket holê, dûrbûyîna me ya ji rastiya Serokatiyê hate dîtin. Nemaze sernexistina hizirandinê, ji vî alî ve angaşta me ya lewaz derketiye holê. Di vê pêvajoyê de derketiye holê ku ti wateya vê kesayetiya me nîne ku bijî. Di vê pêvajoyê de jî li hemberî kesayeta xwe ya navîn ku ji mezinbûnê ditirsê, ji bo wan xisletên xwe derbas bikim li hemberî xwe bertekek hatiye pêşxistin. Ev bûye sedem ku ez bi ser xwe de biçim û li gel wê jî astekê bigrim. Ez difikirim ku ev ast û hêrs wê biguhere serkeftineke mezin. Dema ku em li windahiyên dawî dinêrîn, di nav partiyê de eger em nebin xwediyê meşeke rast, ne rêxistin me qebûl dike, ne jî dijmin. Ji vî alî ve giring e ku em neyên wê jiyan û mirina erzan a di kesayeta Kurdê kevin de hatiye bicihkirin. Rastiya Rêbertiyê ji vî alî ve pêşdîtinek e. Serokê min, ez bawer im di her astekê de ez ê vê di pratîka xwe de nîşan bidim.

**Rêbertî**: Paşnavê te ji Bedîrxaniyan tê?

**Çekdar:** Rast e Serokê min.

**Rêbertî:** Kok heta wêderê diçe?

**Rêbertî:** Gelo Bedirxanî bixwe dibe xizmê we yên pir nêz?

**Çekdar**: Rast e Serokê min.

**Rêbertî:** Bedirxaniyên mezin di asta nav de jî hatin jibîrkirin. Lê belê ez zarokek belengaz yê gund bûm, ji bo min digotin ew ê ku nîjadê wî nediyar. Nîjad û kok zêde bala min nakişîne, lê belê bi qasî ku ez tînim bîra xwe nîjadeke cidî ye. Hevalekê jî di nameya xwe de nivîsandibû, dibêje “Serokatiyê ji nîjada ku ji genan tê heta vê rewşê hatiye.” Pir balkêş e! Ez bawer nakim bi vê ve girêdayî be, lê belê dibêjin bapîrê, bapîrê min jî di demekê de bûye xwedî bandor û mirovekî pîrmend bûye. Misoger bapîrê min mirovekî gelek pîrmend e, zilamekî zana û weke ewliya bûye. Dibêjin baş li hesp siwar dibû, siwariyekî baş jî bûye. Îsmet jî di pirtûkekê de nivîsandiye wiha dinirxînin. Ev karê bavikan ne girîng e, te behsa Bedirxaniyan kir, ji bo wê hate bîra min. Lê mixabin ji wan jî kesek nemaye.

**Çekdar:** Du kelheyên wan mane.

**Rêbertî:** Wan nêzî 150 sal berê demeke xweş jiyan e. Weke nîv dewletekê bûn, lê belê bîrdoziyeke wan ya berê hebû, dixwestin bibin otorîteyeke feodal. Eger Ewrûpayiyan alîkarî nedaba Osmaniyan, dibe ku bûbûna dewlet jî. Weke Mehmet Alî Paşa tişta ku li Misirê kir, wan jî dikarî li Kurdistanê bikiribûna, lê belê ez bawer im bi alîkariya Ewrûpa û dîsa ji ber nikarîbûn kesayeta xwe ya feodal derbas bikin ev asteng kirin. Jixwe bi kesayeta feodal dewlet nayê avakirin.

**Çekdar:** Serokê min di netewebûnê de lewaztî heye.

**Rêbertî:** Lê belê di netewebûnê de lawaztî heye, artêşeke modern ava nekir, pir bêrêxistin bûn. Kesayetiya wî ya feodal bê henasebû. Eger neteweperesteke bûrjûwazî bûya, dibe ku hîn zêdetir li ber xwe bidabûna. Lê belê di kelha Dihê de sê rojan li ber xwe dide, pişre jî teslîm dibe.

**Çekdar:** Rast e Serokê min teslîm dibe.

**Rêbertî:** Ew kelha li nêzî Dihê hîn dimîne?

**Çekdar:** Serokê min a li milê Osyan dimîne.

**Rêbertî:** Kelha heqîqî ye?

**Çekdar:** Rast e Serokê min.

**Rêbertî**: Ne girîng e, tiştek nabe. Tu dixwazî, li cihê wî tu bi ser bixî?

**Çekdar:** Serokê min ez dizanim bi rêbaza Kurdê kevin nayê bi ser xistin. Bi taybet li hemberî rastiya Serokatî û partiyê dema ku rastî derdikevin, wateyeke xwe ya cuda îfade dike.

**Rêbertî:** Yanî çanda wê derê ewqas e. Lê niha jî rêbaza Botanê ma negirêdayî wê çandê ye? Yên ku neyên kûrbûna rêxistinê, pergalê, wê weke Begên Bedirxaniyan li wan were. Ew Begên mezin bûn, yên din nabin Beg jî. Metîn hebû, yên weke wî wê teslîm bibin, wê bibin îtirafkar. Bedirxan Beg birin Stenbolê li wê derê weke qralekî dan jiyandin. Piştî girava Gîrîtê, birin welatekî cuda û rêkirin Misrê. Li gorî polîtakaya Ebdûlhemîd pere danê û di dawiyê de jî li ser bingehên xwefiroşiyê nêzîkî sed salan bi kar anîn. Ez bawer im yek ji wan jî Atatûrk bi kar anî, dîroknasê mezin Cemal Kurtay, ew jî ji Bedirxanan bû. Li ser Atatûrk nivîsandinên bi naverok nivîsand, ew nexistin îdeologê Kemalîzmê jî. Di çanda Osmaniyan û Komara Tirkan de çîrokeke Bedirxaniyan ya wer balkêş heye. Dîsa aliyekî wan ê balkêş ev e ku nişfê xwe zêde dikin. Nikarin xwe di siyasetê de zêde bikin, dixwazin malbata xwe zêde bikin. Nêzî sed û bîst zarokên wî hene.

**Çekdar**: Rast e Serokê min.

**Rêbertî**: Zilam dixwaze bibe desthilat, a rastî dema nikare bibe desthilat û ji aliyê siyasî ve jî nikare encam bigre, hemû karê wî dibe jinên wî. Sed û bîst zarok! Dibe ev rekorek be. Dibe ku li Efrîka jî tiştên wiha nebin. Bêguman dema ku ji aliyê siyasî ve xwe neafirînin, neçar dimînin xwe ji aliyê rêgezî ve biafirînin.

Çekdar: Serokê min, bi giştî di kesayetiyên feodal de rewşeke ku tê zanîn e.

**Rêbertî**: Barzanî jî wiha ne.

**Çekdar:** Rast e Serokê min.

**Rêbertî:** Jixwe karê wî zêde kirina sulalê ye. Ferhat jî dixwest wiha bike, lê me pêşiya wî girt. Pişre F. pir xemgîn bû; behsa zêdekirina nifşê dikir. Rêbazê min çiqas balkêş e ne wisa? Li ser vê bingehê ez jî nifş zuwa dikim. Li gorî te rewşeke pir hov e? Mînak ez ê wisa li te jî bikim. Ya tuyê nifşê xwe ji aliyê siyasî ve berdewam bikî, yan jî Bedirxaniyê dawî jî wê bimire.

**Çekdar:** Serokê min kesayeta Bedîrxaniyan….

**Rêbertî:** Rêgeza xwe ya ku binketî dide axaftin.

**Çekdar**:…

**Rêbertî:** Jixwe ji bo wê îflas kiriye, gelek fermandar keçikan digirin û direvin. Dibe ku di nav we de yên bi çar çavan li hêviya wê rojê bin hene. Ez ji wan re rewşê rave dikim: encamê vê binketinê psîkolojîk e. Pir vekiriye! Di siyasetê de îflas kiriye, dibêje “Hadê keçê, hadê nifş.” Nîjadeke xeter berdewam kir. Ew zarok hemû bûn belaya serê Kurdistanê.

**Çekdar:** Bi vê rêbazê nîjad jî nayê berdewamkirin.

**Rêbertî:** Ji bo ku tenê em wan xwedî bikin pêwîst bû me hemû Kurdistan bifirotana. Eger di Kurdistanê de bandoreke te hebe, ji bo ku tu wan zarokan xwedî bikî tê wî/ê jî bifroşî. Tu yê cuda çawa xwedî bikî? KT çawa xwedî dike? Yek jî jiyana paşayan pir bi mesref e, di her qesrê de gelek xedeme, pêwîstiya xwarin û vexwarinê jî hebû. Vê rê li ber rêyeke bi mesref û tirsnak vedikir. Di sedema wê mesref û dawiya sedsala 19’an de nokertiya navîn, Alayên Hemîdiyê derketin holê. Barzaniyên niha jî weke berdewamiya wan e. Barzanî hê nemerdtir in, ew hinekî din baştir bûn. Mînak Rojnameya Kurdistanê ya wan rojan e, Bedirxaniyan derxist, alfebeya Kurdî jî wan derxist, yanî ne ku xebatên wan yên bîrdozî nebûn, lê belê bêhêvî bûn.

**Çekdar:** Ji ber ku xwe nedan ber jiyaneke bi wate û rûmet…

**Rêbertî:** Binêre nişfa feodal wiha xelas dibe.

**Çekdar:** Jixwe roja îro jî hebûna wan zêde nediyar e.

**Rêbertî**: Bêguman xelas bûn.

**Çekdar**: Hatin bişaftin.

**Rêbertî**: Na! Tiştekî wan nema. Vê birdoziyê, vê felsefeya jiyanê ew xelas kirin. Mînak, ez dikarim ji Almanan jî mînak bidim. Îdeologên Almanan berevajî vê ne. Wan neteweke mezin a Almanan ava kirin. Weke bîrdozî, ramyarî û felsefîk, weke dewlet jî mezin hizirîn. Di encamê de neteweke Almanan a mezin ku dixwaze li ser cîhanê serweriyê bike derkete holê. Lê belê weke me….

**Çekdar:** Armanc û rêgezên wan ên mezin hebûn.

**Rêbertî:** Temam. Mînak Nietzche bavê neteweperestên Almanan bû, zilam di mijara jinê de cuda bû, gelek fikrên wî yên

xeter hebûn. Ji bo jina kole tiştek digot, fikrên wî yên wisa cuda hebûn. Tenê ma, kete rewşa dînbûnê jî. Lê belê îdeologê herî mezin ê neteweperestê Almanan bû. Di pirtûka bi navê “Zerdûşt Wiha Ferman Da” de wê baş lekolîn dike. Ez dixwazim wer bibêjim: yên me berevajî vê ne; bîrdozî, rêxistin û siyaset nîne. Her dibêjin nîjad, di encamê de nîjad dibe belaya serê miletekî. Nîjada Barzaniyan jî belayeke tirsnak e. Pênc, deh hezar zarokên wan hene, Kurdistan wê çawa wan xwedî bike? Ev salek, du sal e ji KT’yê xwe xwedî dikin, bûn sedema bi hezaran hevalên me şehîd bikevin. Ji bo pênc hezar Barzanî baş bên xwedîkirin, Kurdên Îranê, Kurdên Başûr şikandin. Ev rewşeke xeternak e. Ez vê ji bo wê analîz û tehlîl dikim. Ev di nav me de jî bin dikevin, di hişê wan de weke ku wê bên nîjada xwe berdewam bikin derbas dibe. Li gorî te ez di vê mijarê de çi bikim?

**Çekdar:** Serokê min, misoger feraseteke ku ji hêzê dixîne ye.

**Rêbertî**: Li gorî te tedbîrên min girtine rast in?

**Çekdar:** Serokê min misoger rast in.

**Rêbertî:** Ji bo bîrdoziyê neçar dike.

**Çekdar**: Neçarkirina ber bi bîrdoziyê ye.

**Rêbertî:** Armanca mezin mirovan neçarî siyasetê dike. Ma tu yê li ber xwe bidî?

**Çekdar:** Serokê min ez ê li ber xwe bidim.

**Rêbertî:** Tu ciwanî, pêwîst e hinek din tu li ber xwe bidî.

**Çekdar:** Serokê min ez dikarim li ber xwe bidim.

**Rêbertî:** Weke cinsê mirov li şûna nîjadê xwe zêde bike, pêwîst e ji aliyê bîrdozî, rêxistinî ve nîjada xwe berdewam bikin. Gelekî girîng e ne wisa? Ez di vê derê de teoriyekê pêk tînim, pir zor e, lê belê her hal tenê ev çareserî ye. Yanî di wateya zayendî de nîjada we ziwa bibe jî weke bîrdozî, siyasî jî nîjad pêş dikeve. Weke bîrdozî, siyasî, rêxistinî, heta weke leşkerî jî nîjad mezin dibe, yanî rizgariya neteweyî eger hate têkûzkirin, wê demê ew welêt dibe xwedî qîmetekî, ma ne wisa ye?

Ez dixwazim vê berevajî bikim. Ma li gorî te rast e? Çareseriya ku min peyda kir ev e: weke bîrdozî, siyasî, yên nikarin tehemûl bikin, me got em wan bixin nav jiyaneke erzan û wargehê de. Lê nikarin li ser xerîzên xwe bandor bin, pirsgirêkan derdixin û direvin. Bala xwe

bidinê, kesên tenê ji bo refên me belav bikin û xeyidîn hebûn. Tu dizanî çi hate serê hevalê min ê kevin, heta niha jî hîn nehatiye ser xwe. Yên di siyasetê de bi bin dikevin dawiya wan ev e. Li Afrîkayê jî ma ne wisa ye? Ez nizanim, hîn tu ciwanî. Weke Bedirxaniyê dawiyê di vê wateyê de em di te de hem felsefeyê û hem jî pratîkê biguherînin. Ez bawer im îdîaya te heye.

**Çekdar:** Serokê min ez heta astekê di guhertin û veguhertinê de derbas bûm.

**Rêbertî**: Rast e, her hal ji bo guhertin û veguhertinê temenê te hîn ciwan e, lê belê tu mezin bûyî. Ma tu di 13 saliya xwe de tevlî bûyî?

**Çekdar:** Serokê min, ez hinekî di nav rêxistinê de mezin bûm, lê dema ku ez tevlî bûm ez 16 salî bûm.

**Rêbertî:** Zêde ne xerab e, niha tu wek xortekî, pir rehet dikarî xwe li ser piyan bigrî.

**Çekdar:** Seroke min, ez dikarim li ser lingên xwe bimeşim.

**Rêbertî:** Em ji şer nerevin.

**Çekdar:** Serokê min, ya herî zêde me ber bi guhertinê ve dibe şer û çek e.

**Rêbertî:** Waneyên ku me dane we bes in?

**Çekdar:** Serokê min, li gorî pêdiviyê zêdetir hate dayîn. Her tim em li gorî rewşeke ku ji rêxistinê dixwazî dijîn.

**Rêbertî:** Rast e, hêza we ya ku hûn bidin jî nîne.

**Çekdar:** Eger mirov nede, wê ji rêxistinê dûrketin çêbibe. Xwe nerêxistin kirin wê nehêle ku em xwedî li rastiyên taktîk derkevin. Ez ji vî alî ve xwedî îdîa me, ez dixwazim xwe parve bikim.

**Rêbertî:** Hemû rast in, tuyê wê hêzê pêk bînî? Tu ciwanî tu yê bikarî çêbikî? Mînak; tu yê li Çiyayê Cûdî wer bi hêsan nemirî.

**Çekdar:** Serokê min ez namirim.

**Rêbertî.** Weke Cûdî û çiyayê wê tu yê xelas nebî.

**Çekdar:** Nabe Serokê min. Xwedî biryar im ku bi hêsanî nemirim.

**Rêbertî:** Tecrûbeyên te hene, ne wisa?

**Çekdar:** Rast e Serokê min.

**Rêbertî:** Tu dikarî li çiya xwe tevger bikî. Ev tedbîrên pêş in, ji ber ku ev nebin, berdewamkirina rastiya jiyanê jî nabe. Di nav malbatê de wek kur tu tenê bû?

**Çekdar:** Rast e.

**Rêbertî**: Ew jî pir xerab e! Ya ku hat vê derê dayika te bû?

**Çekdar:** Serokê min dapîra min bû.

**Rêbertî:** Dapîra te bû. Wê nîjad ziwa bibe, em çi bikin.

**Çekdar:** Serokê min tiştên gelek girîng hene, zêdekirina nîjadê û meseleya malbatê zêde ne girîng e.

**Rêbertî:** Dibe hêsan bê, lê ka biçe ji wan bipirse? Pêwîst e em hinekî wan jî bihizirin. Çima bavê te bi çend kesan re nezewicî?

**Çekdar**: Serokê min hinek nêrînên wî yên şoreşgerî hebûn.

**Rêbertî:** Niha li ku derê ye?

**Çekdar:** Serokê min li Riha ye.

**Rêbertî:** Yanî rewşenbîr e.

**Çekdar:** Serokê min rewşenbîr e, komûnîstê kevin e.

**Rêbertî:** Komûnîstbûna wî jî heye.

**Çekdar:** Piştî 12’ê Îlonê di girtîgehê de li gel hevalan dikeve guftûgoyê û naskirina wî ji partiyê re çêdibe, dawiyê jî ji bo partiyê sempatiya wî çêdibe.

**Rêbertî:** Yanî sempatîzan e.

**Çekdar:** Sempatîzan e.

**Rêbertî**: Baş e! Bi dil tu da partiyê?

**Çekdar:** Serokê min ez bê agahiya wan hatim.

**Rêbertî**: Piştre te çawa xeber şand? Dibêje bila bi rêya dapîra xwe bê? Ji bo te dibêjin wê çi bike?

**Çekdar:** Em axivîn lê bele tiştek negotin.

**Rêbertî:** Ma wê çi bibe, li şûna ku em nîjad bihizirin em ê Kurdistanê bifikirin. Ewqas zarokên Bedirxaniyan çêbûn, ma çi bû, ma ne wisa? Pêwîst e tu bi baldarî xwe biparêzî, bêyî ku Bedirxaniyê dawiyê jî bikeve em zû Kurdistanê rizgar bikin.

**Çekdar:** Mirina wî û jiyana wî jî mezin dibe.

**Rêbertî:** Gengaz e. Ji vî alî ve pêwîst e tu pir baş li xwe binêrî. Tu ciwanî, herdu îhtîmal jî gengaz in. Dema ku tu mirî em çi bikin? Bêşansiyek jî dibe ku gengaz be, heval Cûdî jî wisa bû. Wer dizanî ku

xwe baş amade kiriye, porê xwe jî weke te şeh dikir. Zarok bû, jiyan nû nas dikir, çawa çû diyar nebû. Bêguman di vê derê de sûcê rêveberiyê jî heye, ciwanên me yên wisa neparastin, dikarî bixwe jî xwe biparastibûya. Ez bawer im tişta di vê derê de girt jî nekarî bi pratîka xwe re bike yek. Di operesyonekê de dijminî jê re banga teslîmbûnê kiribû! Her hal rastî wê operasyonê hat. Di nav van hemûyan de pêwîst e mirov pir bi plansazî tevbigere, bi aqil, bi plan…

**Çekdar**: Eger mirinek hebe pêwîst e ji bo dijmin bi awayekî giran bê dayîn.

**Rêbertî:** Mirin wê herî dawiyê bê fikirandin. Di wan çiyayan de mirin wisa ji ber xwe ve nabe; yan di encama ehmeqiyekê û yan jî lehengiyek; yan wê di berxwedanekê de gengaz be. Mirinek bi ehmeqtî û mirinek bi lehengî jî di destê te de ye.

**Çekdar:** Ji bo wê pêwîst e mirov hemû tiştên xwe deyne holê.

**Rêbertî:** Rast e, pêwîst e tu hemû tiştê xwe deynî holê, ji vê re guman tine. Hevpeymana me û ya hevalê Çekdar bi dîrokê re rastiyeke, di heman demê de jî xeyalî ye, lê belê ew qasî jî watedar e. Tişta ku destpêkê bike ev e ku divê erzan nemire. Weke Gilgamêş tuyê ji mirinê birevî, tu dizanî rêbazên Serokatî dişibin wî.

**Çekdar:** Serokê min, meşa bêmiriniyê.

**Rêbertî:** Rast e, meşa bêmiriniyê, ev rast e. Bila ev hest dijwar be. Li gorî ku te şêr xeniqand, tu cengawerekî çawa yî wê derkeve holê. Bila ev hest jî bi te re xurt be. Dema ku mijara evînê jî çêbû weke Bedîrxaniyan neke, xwedavendekê bigere!

**Çekda:**…

**Rêbertî:** Zêde girîng nîne, dibe gengaz be. Dibe ku wê demê xwedawendeyek jî pêş bikeve. Di rewşa niha ya keçên me de ku tu bibî evîndar pir sînordar e.

**Çekdar:** Serokê min mirov nabe serkeftinê.

**Rêbertî:** Bêguman bravo! Te fêm kiriye, lê belê dibe ku pêş bikeve, tuyê baldar bî.

**Çekdar**: Serokê min, yên ku min berevajî kir partî bû. Bi naskirina navenda partiyê bû.

**Rêbertî:** Em di we de guhertinek bi trajedî dikin, ev jî gelek bandorker e. Bextewer be. Xwezî weke Bedirxaniyan bûya, lê belê li ser bingeha serketinê. Jixwe ez jî bi hemû hêza xwe ve dibim alîkar.

**Çekdar:** Serokê min, bi rêbaza şerê rast.

**Rêbertî:** Rast e. Li ser vê bingehê ciwanên Botanê divê wer bi hêsanî nemirin. Bingehên nû bên nirxandin û mezin bibin, wê demê dikarin xwe ji paşverûtiya xwe û hovberiya xwe rizgar bikin. Ev şans hîn heye û divê tu vê pir bi dijwarî binîrxînî. A niha Botan hilweşayiye û weşiyaye, zarokên wê jî pir cûce ne, nayên xwedîkirin. Min beriya çend rojan di televîzyonê de dît, digotin di kanên komirê yên Şirnexê de "Em ji bo pariyek nan 18 saetan dixebitin." Hemû jî zarok bûn, hemû di nav komirê de fetisîbûn.

**Çekdar:** Şert û mercên jiyanê zehmet in.

**Rêbertî:** Bêguman ew zarok pêş nakevin. Aliyên xwe yên din jî bi keçan dagirtine. Zarokên Botanê çûn! Ji vî alî ve bi her çar destan hembêz bikin, lez bikin ku em van zarokan jî rizgar bikin. Ya girîng zarokên me nînin, zarokên Botanê ne. Ya girîng ne zarokên Bedîrxaniyan e, zarokên Botanê ne, ya girîng ne zarokên Barzaniyan e, zarokên Behdînanê ne.

Belê Hevalê Çekdar, me bi te re li gel van hemûyan hevpeymaneke çarçoveya wê xurt, hem dîrokî hem jî siyasî pêş xist. Tu hîn ciwanî, ji xwe ez jî dişibim zilamekî xedar, zarokekî ciwan wê çawa vê hevpeymanê bi cih bîne? Eger ez ne xedar bim jî lê peywirên giran didim ser milên we. Tu pir rehet dipeyîvî, dema ku ez jî li van karan dinêrim ditirsim, ev karên pir cidî ne. Em ê bi hemû hêza xwe ve alîkarbin, lê hêza me jî têr nake. Înşelah baş derbas bibe.

**Çekdar:** Serokê min, ya girîng hewldana me ye.

**Rêbertî:** Tu ji bo dapîra xwe jî diyariya dawiyê yî. Ez bawer im tu wan di demeke kurt de naxî nav rondikên çavan. Weke zarokê kur ê malbatê herî dawiyê înşealah tu nîjadê wan xelas nakî. Hemû tişt ji nû ve ji bo avakirina Kurdistanê te neçar dike, berevajî vê weke ku ti carî nejiyayî wê bê hesapkirin. Hevalê me Çekdar her çiqas ciwan be jî, em neçarin, lê bawer bikin û peywirên giran bêxin pêşiya wî. Cudatir ne namûs dibe, ne nîjad û ne jî jiyan dibe. Wê şansê xwe biceribîne, wê berdewam fêr bibe. Eger pêwîst bike wê biryargeha

xwe jî ava bike. Em ê wî şansî jî bidinê. Lê belê wê bi dijwarî bi ser xwe de biçe. Eger bi ser bikeve wê serkeftina xwe bêk bîne, eger bi sernekeve jî wê di dîrokê de weke şehadeteke bi rûmet jiyana xwe bi dawî bike. Ev jî hêja ye. Di vê çarçoveyê de şêweya peywira hevalê me Çekdar ê ciwan, heta tu bibêjî bi aqilane û bi plan, wê her gava xwe bi hesap bike û wê mirinê bi dawî bike, em wê hêviyê jê dikin ku bibe xwedî rêbazeke ku serkeftinê jî bi encam bike. Li ser vî bingehî li gel pesendkirinek bi dil, karê wî gelek giran e, lê ne bê derfet e û em destnîşan dikin ku ya herî hêja jî ev e, em serkeftinê dixwazin û silav didinê."

Çekdar kêliya ku li ser deng û soza dabû Serokatiya xwe dihizirî û di wê kêliyê de bîranînên wî û hevalên wî dîsa yek bi yek hatin bîrê. Lê li ber çavên wî her wêneyên heval Egîd Emodê hebûn. Hingê li ber çavên wî ew kêlî bûn dîmen û weke şerîteke filîmê kêlî bi kêlî derbas bûn. Çekdar bi wê birindariya xwe ya giran her dixwest rabe serxwe û dest bavêje çeka xwe, çend guleyan bavêje hêzên dagirker û hevkarên wan. Hevalê wî Celal jî ji bo ku Çekdar avê nexwaze, her jê re qala wî û bîranînên xwe dikir. "Hevalê Çekdar tê bîra te, di çalekiya me ya Bêspinê de, me çi ji wan Romiyên Tirkan kir." Çekdar çavên xwe vekir û li hevalê xwe Celal nêrî, serê xwe hejand.

"Di zemanê gerîlatiya min de destpêkek nû bû. Zemanî xwe di kêliyên xeyalên min de veşartibû. Û min ew keşif kiribû. Ez ber bi zemanê nû ve diçûm. Ewrên biçûk û biçûk xwe hêdî bi hêdî ji dora heyveronê berdidan û ber bi deşta Silopya ve diçûn. Bayeke sar li serê navsera Cudî dihat û bi dijwarî li rûyê min dida, destên min ji sermayê diqerisîn. Ji bo ez destê xwe germ bikim, min çeka xwe avête navmilên xwe û min destê xwe xistin berîka xwe. Ji nobeta min re nêzî bîst deqe mabûn û dîsan min dest bi xeyal û hêviyên ku ez ê çawa bibim şervanekî partiyê kir. Kêliya ku ez bi van xeyalan dihizirîm, hevalê Egîd, destê xwe avête ser milê min û li ber min sekinî ji min re got, 'hevalê Çekdar tu tam bûyî gerîla. Cilên gerîla jî

gelek li te tên. Tu di van cilan de gelek bedew bûyî.' Bi van gotinên heval Egîd, keyfa min gelekê xweş bibû.

Hevalê Egîd ji ber ku li Cizîrê û Sîlopya deşifre bibû, bi perwerdeya milîsan re mijûl dibû. Ji ber ku wê rojê dawiya perwerda me bû, hatibû gel yekîniya me. Her heval ji bo destpêkeke nû ya pratîkê gelek bi kelecan bûn. Ez jî gelek bi kelecan bûm. Xweşiya jiyaneke nû di hizirandinê min de peyv dihûnandin. Hûnandina peyvan têra nivîsandina xeyalê min nedikir. Ew qas ez bi kelecan bûm. Hevalê Egîd haj vê kelecana min hebû. Destê xwe avêt ser stûyê min, "ji naha pêve tu gerîlayeke kevnî. Îcar ez mizgîniyek din jî bidim te. Xalê te heval Seîd di perwerda milîsan de li gel me bû. A niha li gel koma milîsan li Şaxê ne. Jixwe tu dizanî, ji niha pê ve nikare biçe Cizîrê. Wê piştî demek din derbasî Başur bibe. Ger ku derfet çêbû dibe ku tu wî bibînî.

Ji bo vesazbûna xwe ma tu gelek kelecanî hevalê Çekdar, belê heval, di rastiyê de ez ji bo jiyanek nû kelecan im. Ji ber ku her tiştek ji bo me nû wê dest pê bike. Hevalê Çekdar te bi vê kelecana xwe, bîreweriyên min a Akademiya Serokatî înande bîra min. Me jî dawiya perwerdeya akademiyê li hemberî Serokatiyê dema ku soz da, dest û lingê me direcifin. Li hemberî Serokatiyê, sozdayîn ne kareke wisa asayî bû. Dema ku dest û lingê me direcifîn, Serokatî çavên xwe zîq dikirin û li me dinêrî. Jixwe çavên Serokatî weke yê xezalan mezin bûn. Îcar Serokatî didît ku me gelek kelecan girtiye, vê carê ji bo em giraniya soza xwe bizanin, kêmekê li ser lêvan dikeniya û dest bi gotinên xwe yên soz dayînê dikir. Me jî gotinên wî dubare dikirin. Wê demê mirov xwe di çavê wî de didît. Û mirov ew qasê ji xwe bawer dibû. Ji bîrneke ger rojek hat tu çûyî qada Serokatiyê, ji ber min ve wî bi germahiyeke bêdawî himêz bike. Lê belê bila nepenî be." Çekdar li xwe zivirî "çima heval?" "Ji ber ku divê mirov bi

serkeftinên mezin re Serokatiyê himêz bike. Serkeftinên me yên a niha ji bo azadiyê wisa mezin nînin. Têra zeferê û serkeftinê nakin.

Peyv û gotinên heval Egîd li ser Serok Apo, di xeyal û hêviyên min de meraq û lêgerîneke xwe naskirinê dabû dest pê kirin. Lê gotina wî ya dawî ez gelek dabûm fikirandin. Bes ez di wê astê de nebûm ku wateyê bidim wan gotinan. Lê min ew gotin û peyvên xweş ji bo demeke din ku ez ser bi hizirim, hildan û xiste nav xurcika dilê xwe. Piştî xatir xwestina heval Egîd, em jî ketin nav peywir û piratîkê.

Bi vesazbûneke nû em derbasî yekîniya heval Doxan û taxima heval Cudî ya ku li Girêhêrmo bibûn. Li gorî pîlansaziya me ya wê rojê, heval Doxan wê li ser jiyanê û li ser şêwaza tevgerkirina me ya li hemberî dijmin bi me re gotûbêj bikira. Heval Doxan bi meşeke tenhayî, bi ezmûnên xwe bawer dimeşiya û ber bi me ve dihat. Bejna wî, rûyê wî, cilên wî û heta çeka wî hemû di nav ahengekê de li hev hatibûn. Gelek bala mirov dikişande ser xwe. Jixwe bi rêk û pêkiya xwe ve diyarbû ku ew fermandareke jixwe bawer û di şer de xwedî ezmûn e. Di nav vê ahenga heval Doxan Didêrî de, rengê biharê jî xwe di nav gul û kûlîlkên Cudî de xemilandibû. Bêhna wan a xweş li rûyê me dida, dilê me ji bo jiyaneke nû dilxweş dikir. Jixwe mirov her cure rengê kûlîlkan li Cudî dibîne. A niha ez li tenişta kûlîlkeke rengê wê ku zimanê Botanî dibêjin ‘xemrî’, yan jî ‘binefşî’ rûniştî me. Heta niha min qet kûlîlkeke wisa sipehî nedîtibû. Keyfa wê jî ji min re tê û bêhna xwe difirîne ser rûyê min. Gotina heval Doxan a “tevlîbûna ji şerekî bi vî rengî re wêrekiyeke pir mezin dixwaz e” dihêle ku ez gotinên wî hîn baldartir guhdar bikim.”

“Belê hevalên heja, weke hûn jî dizanin hûkumeta Tansû Çîler, mirov divê nebêje hûkmet, mirov divê ji wan re bibêje “koma Çîler û Doxan Gureş”, ev wê hîn rastir bibe; di vê demê de koma Çîller

destûr ji hêza Nato girtiye. Hêza Nato jî wê li gorî berjewendiyên xwe arîkariyê bidin wan. Dewleta Tirk û koma Çîller wê bi arîkariya dewletokên Nato bixwazin bi hemû hêza xwe ve vê salê bê ser hêza me ya gerîla û tevgera azadiya gelê Kurd ve werin. Ev sal salek wisa dijwar e. Li gorî tevgera dijmin, wê bixwazin operesyonên pir mezin li ser gerîla çêbikin. Navenda van operesyonên mezin jî gor tê dîtin Botan e. Koma Çîller û hevkarên wan wê bixwazin pêvajoya van operesyonên leşkerî li ser Botanê pêşbêxin.

Weke şerê navenda Natoyê ya giştî, ku bi Tirkî jê re dibêjin “topyekûn savaş”, ango “şerê giştî”, wisa bi nav dikin. Dewleta Tirk wê hemû derfetên xwe bêxe bin xizmeta van operesyonan. Wê bi van operesyonan bixwazin gelek gundên Kurdistanê hîn jî vale bikin û bişewitînin. Wê di heman demê de jî bixwazin darbeyên pir mezin li tevgara azadiya gelê Kurd bixin. Lê li hemberî “şerê topyekûn” tevgera gerîlayê Kurdistanê jî her ku diçe mezin dibe. Weke hûn jî dibînin li her çar parçê Kurdistanê û cihanê tevlîbûn ji tevgera me ya gerîla re heye. Gerîla bi çalekiyên xwe yên mezin zerbên mezin li dijmin û hevkarên wan dixin. Ji bo wê tevlîbûnên vê pêvajoyê wêrekiyeke pir mezin dixwaz e.”

Hîn peyva wêrekî li ser lêvên heval Dogan diçû û dihat, ji nişkave çavên wî li ser min zîq bibûn. Ji min re got: “heval navê te çiye?” “Çekdar.” “Belê hevalê Çekdar tu yê bikarî bibî şervaneke wêrek. Tu çima di vî temenî de tevlîbûyî? Yan jî tu dikarî di nava vî şerê dijwar de bibî gerîla? Lê tu pir zeîfûk diyarî û her wiha ji aliyê fîzîkî ve çavê mirovan tejî nakî. Ger hûn biçin di nava xwendekarên Cizîrê de kar bikin wê hîn baştir be?” Çekdar hinek ji gotinên hevalê xwe Dogan şaşma, lê bi hesteke xwe bawer “belê heval ew kar jî pêwîst e. Lê belê ez ji bo gerîla biryara xwe didim.”

Hevalê Dogan bi keneke li ser lêvan beşişî, “hevalê Çekdar diyare hûn ji bo jiyana gerîla xwedî biryarin. Cûdî weke ku tê zanîn qadek ya şer e. Erdnîgariya Cûdî tê naskirin. Erdnîgariya Cûdî gelek asê û zehmet e. Li Cûdî gerîlabûn û gerîlatî kirin wisa ne hêsan e. Ciheke pîroz e. Weke ku tê zanîn, cihê Keştiya Nebî Nûh e. Weke Cûdiyê Miradan jî tê naskirin. Weke cihekî dîrokî tê naskirin. Ji bo me jî cihê şehîd Cuma ye. Berî demekê me fermandarê xwe yê mezin li Cudî şehîd da. Ji bo bîranîna fermandarê mezin rêheval Cuma, divê em bibin şervanên tolhildanê. Di her kêliya jiyanê û şer de divê em tola fermandarê xwe li ser dijmin rabikin.

Hîn heval Dogan di gotûbêjên me de bi axaftinbû û pesnê heval Celal Kobra dida, hevalê Piling bi lezgînî agahî da ku hevalê Cehfer (Cehferê Sorî) hatiye yekîneya me. Me bi dilê hevaltiya germ merasîmek ji heval Cehfer re çêkir. Hevalê Cehfer hatibû şûna şehîdê mezin û pêşengê gelê Kurd ku berî mehekê me ew di encama êrîşên firokeyên şer yên dewleta Tirk de şehîd dabû. Hevalê Cehfer jî bi germahî em silav kirin. Ew jî weke hevalê Dogan, ji xwe bawer û xwedî ezmûnên şer bû. Gelek xwîn germ û qise xweş bû.

Bi qasê dar û kevirên Cudî, leşkerên dewletoka Tirkan hatibûn operesyona Cudî. Hevalê Cehfer di van kêliyan de di bin barana hûr a biharê de, li ser lingan li dijî vê dagirkeriyê bi van gotinên xwe behsa tevgera me ya taxim û yekineyên gerîla wê çawa bi çalekiyên xwe operesyonên dijmin valederêxînin tanî ziman.

“Hevalên hêja û rûmet, ji Girê Hermo heta gundê Bilikan nêzî 400 hevalî bi rêbazê gerîla û bi yekine û bi taximê biçûk me cih bi cih kiriye. Li gorî texmînên me ji hejmara tê payîn zêdetir leşkerên dijmin ketine Cudî. Jixwe em gerîla ne. Kengê hate xwestin em dikarin derbasî Gabar û Besta jî bibîn. Li wê derê jî bizivirîn bên li dijmin bixin. Em ê ketina dijmin ya li Botanê jê re bikin dojeh. Jixwe

navê vê operesyona xwe ya berfireh jî, xistine "operesyona bayrakê." Qaşo wê bejin, "em di Cudî de ala xwe badidin", wê wisa pesnên xwe bidin. Lê belê bersiva me jî ji dijmin re wê ev be. Hûn dikarin bikevine Cudî, lê wê fatora wê ji bo we giran be. Hûnê bi asayî, wisa bi rehetî ji Cudî dernekevin. Em ê Cudî ji we re bikin, avzêmeke reş."

Piştî axaftinên heval Cehfer yekîneya wan bibûn du taxim û ketibûn nav şerê germ û operesyonan. Dijmin weke gurê har ax û kevirên Cudî dida ber topan û dihate operesyonan. Taxima wan li girê Hêrmo û li Atatûrk Burnu'yê bûn. Çekdar hîn dihizirî ji ber çi dewleta Tirk ji vî girê xweşik re dibêje "Atatûrk burnu." Devê xwe tejî kir ku ji heval Cudî pirsyar bike? Lê di wê kêliyê de hevalê Piling got: "hevalno, hûn dizanîn çima ji vî girî re dibêjin, Atatûrk burnu, ji ber ku pozê Atatûrk jî weke vî kevirê serê gir dirêj bûye." Bi vê mînaka hevalê piling ya sosret, taxim gişt bi hev re bû pîqepîqa kenê wan. Hevalê Cudî dîsan li ser pûtên hevalê Piling de hatibû. "Hevalê Piling, te dîsan lêneda. Ka ez ji we re bibêjim. Ka çima dibêjin "Ataturk burnu." Li gorî hinek agahî lekolînên me ji mirovên rihspî û bîremendên Şaxê girtî, dibêjin; "di dema dagirkirina Osmaniyan ku dema Mîr Bedirxan de Cizîrê dagirdikin, ev nav lê hatiye kirin. Ji xwe rastiya dewleta Tirka li ber çav e. Çûye kî dera Kurdistanê dagirkiriye û navê kalik û sûlaleyên xwe lêkiriye. Navê gundên Kurdistanê jixwe hemû dane guherandin." Di ber axaftinên xwe de jî, di bin lêvê xwe de keniya û got: "Lê hûn bizanibin, tenê destê wan negihiştiye gundikê Remo yê kalikê min." Gotinên heval Piling ji bo pêkenînê xweş bûn. "Lê hevalno, ma ne heyf û mixabine navê vî girê Kurdistanê û Cudiyê Miradan, em bi xwe û bi gotinên xwe bibêjin Atatûrk Burnu. Nabe heval. Divê em gotinên dijmin bilêv nekin. Sedan şehîdên me hene. Divê em navê wan şehîdan rabikin."

“Hevalno dema ku bû esir divê em xwe bêxin du-sê kom û li hêzên dijmin yên operesyonê bidin. Divê em Cudî ji wan re bêkin dojeh. Ji bo careke din nekarin bikevin Cudî. Tîma hevalê Jîr tîma êrişê ye. Komên hevalên din wê bi rêbazê gerîla xwe veşêrin û li dijmin bidin. Jixwe we li ser tektîkên gerîla gotinên dawî yên hevalê Cehfer guhdar kirin. Hemû heval divê di tevgera xwe ya şer de van rêbazên gerîla bi baldarî nêz bibe. Koma hevalê jin jî wê li girê jora me bigrin û wê ji wê komê jî du heval bikevin koma êrişê.” Hîn axaftina heval Cudî neqediya bû, hevalê Delîl yê ji Rihayê, di bin lêvê xwe de beşişî, bi şêwazeke pêkenîn got: “Ma hevalê jin wê çawa parastina me bikin. Yan jî wê çawa di koma êrişê de bikarin şer bikin.” Delil di wê hizrê de bû, kesê dengê wî yê ku hevalên jin biçûk dike nebihistiye. Lê belê gotin ji devê wî firiya bû. Çav hemû li ser Delîl zîq bibûn. Cûdî dora xwe zivirî, nêrînên xwe yên dijwar birin ser Delîl. “Heval gotinên wisa bê qîmet ji bo hevalê jin neke. Jixwe tu ji vîna jinê bawer nakî. Serokatî ew qas qîmetê dide vîna jinê.” Delil piştî gotinên Cudî çavê xwe nizim kir û li erdê nêrî.

Cudî fermandarê taximê bû. Yekî bejin zirav, por reş bû. Porê xwe her tim di kêleka porê xwe de şeh dikir. Çavên wî girover, bêvla wî biçûk û lêvên wî tenik bûn. Ahenga fîzîka wî gelek li hev hatîbû. Temenê wî nêzî bîstan bû. Di heman demê de jî di şer de gelek jîr û jêhatî bû. Ew ji Gundikê Remo bû. Gundikê Remo dikeve qûntara navsera Cudî. Bi rastî weke wî jî di nava gotinên xwe de bilêvkirî bû, destê dagirkeriya dewleta Tirk ji aliyê bişavtinê ve negihiştîbû gundê wan. Ji wî gundî gelek ciwan tevlî hêza gerîla bibûn. Mirovên wî gundî weke axa xwe gelekê germ û paqij mabûn. Gundê wan ji aliyê dewletê ve di salên notan de hatibû xirakirin û şewitandin. Piranî mirovên wî gundî koçberî Başurê Kurdisranê bibûn. Ew ji wî gundî bi temeneke pir biçûk tevlî refên gerîla bibû. Ew di van salên xwe de

carekê birîndar bibû û derbasî qada Serokatiyê bibû û di perwerdehiya Serokatî de derbas bibû.

Çekdar berî ku bikevin tevgera çalekiya bejayî ku taxima wan wê li ser dijmin çalekî bikirana, li ser fermandarê xwe Cudî ji bo lênûsa xwe bi van gotina qala taxima xwe dikir. Lê hîn pênûs destê wî de bû dinivîsand ku Cudî ji nişkave serê xwe xwar kiribû ser lênûsa wî. "Merhaba hevalê Çekdar" "merheba heval." "Ev qedereke ez te meyze dikim, tu her dinivîsînî." "Belê heval, ev fêrbûna min ya dibstanê ye. Car- caran ez wisa dinivîsînim." Cudî bi şêwazeke şaşmayî li lênûsê û peyva navê xwe meyze dikir. Hizirandinên wî di wê kêliyê de çûn ser Serokatiyê. Serokatiyê jê re gotibû: "Divê tu bizanîbî di her kêliya şer û piratîkê de xwe perwerde bikî. Ger ku tu wisa nekî tê winda bikî." Ji ber ku ev gotinên Serokatiya xwe baş cih neanîbûn, bi dilekî xemgîn xwe zivirand û li nav çavên Çekdar meyze kir. "Hevalê Çekdar, di nav hevalên Botanê de ji ber hêza piratîkî ya qebe û ferasetên şaş her çiqas pirtûk xwendin û nivîsandin weke tişteke pir ecêp jî tê, lê hûn berdewam bikin." Çekdar weke ku hîn ne li benda bersiveke wisa bû, "çima tişteke pir ecêb tê heval? Ew qas pirtûkên Serokatiyê hene, em ê çawa bixwînin?" Cûdî hem gotinên Çekdar guhdar dikir, hem jî bala wî li ser lênûsa Çekdar bû. Ka çima navê wî nivisandi bû? Tenê peyva navê xwe karibû bixwîne. Cardin serê xwe rakir li nav çavên Çekdar nêrî, ji xwe re got, "Hevalê hêja, hûn baş daxwivîn, lê ferasetê qadroyê Botan û Zagorosê wisa ye."

Tarîtiyê hêdî bi hêdî cihê xwe dida ronahiya berbanga sibê. Stêrka berbangê jî weke werîsekê bilind dibû, dixwest ji aliyê rojava de biçe ava. Çekdar çavê wî her li ser stêrka berbanga sibê bû. Wî dixwest berî ku bibe sibe, jimara leşkerên ku çûne kemîna wan bizane. Çekdar li derdûra xwe zivirî, dît hevalê Jîr bi hilhila nefesa xwe girtiye û ber bi wî ve tê. "Çibû hevalê Jîr?" Jîr bi dengekî hêdî jê re got, "xwe bigihîne girê jor." Piştî ku Çekdar gihişte girê girê jor, Jîr

bi dengekî nizim, “dijmin ji piş me ve ziviriye. Kemîna me ferq kirine.” Çekdar çavê xwe danî ser nişana sîxwûrusiya xwe, bi kişandina tetîkê re leşkereke tîmên teybet gêrbû erdê. Dîsan tetîka çeka xwe ya çav reş kişand, bi gêrbûna leşkereke tîmên teybet re çend leşkerên din jî gêr bibûn. Tîma leşkerên ku dihatin arîkariyê ji ber gulebarana çeka Çekdar, neçar man xwe kişandin ber keviran.

Hîn Çekdar li ser serê leşkeran gule dibarandin, Jîr di sengera(mevzi) jêra wî de ji zikê xwe giran birîndar bibû. Piling hatibû arîkariya wan. Hevçûn ji her du aliyan ve germ bibû. Çekdar bi çeka xwe ya sîxwûrûsî, bi bîksiya hevalê Jîr ketibû nav leşkeran. Leşkeran nedikarî ji ber guleyên bîksiya Çekdar serê xwe rabikin. Neçar bibûn ji aliyê Şirnexê ve paşvekişin. Piştî ku leşker paşve vekişiyan Çekdar û Pilingî birîna Jîr girêdabûn. Çekdar û Piling ketibûn heman taximê û heman mangeya hevalê Jîr. Ew hevalên hev yên şervanên nû bûn. Wan ji hev pir hezdikir. Piling hîn zêdetir Çekdar hezdikir. Di vê çalekiy de ew ne li gel hev bûn. Lê dîsan jî Piling bi fermana fermandarê xwe Cudî hatibû arîkariya fermandarê xwe yê mangê Jîr û Çekdar.

Rûyê Jîr ji ber herikandina xwîna zêde zer bibû. Çavên wî yên zerik ji ber êşa giran ya birîna wî diçû û dihat. Tenê dikir ‘ay’ û av dixwest. “Hevalê Çekdar, hevalê Jîr avê dixwaze.” “Nabe heval. Bîrîna hevalê Jîr pir girane, tu avê bidiyê wê di destê me de şehîd bikeve. Jixwe hevalê doktor Agirî di rê de ye û ber bi me ve tê. Heta ku heval bigêhê me, ez ê çend dara bêxim darbest ji bo em bikarin hevalê Jîr daynin ser.”

Jîrî li ser darbestê bi zorî henase dida û distand. Çekdar û Piling ji bo birîna Jîr pir ne êşê pir hêdî dimeşiyan. Girê ku li pêşiya wan bû ew derbas kiribûn. Hîn doktor Agir di rê de bû. Doktor Agir bi kodê Cesur banî kodê Jîr “Firtone” dikir. Piling bi dengê bilind,

"hevalê Çekdar ma tu nabihîsî, banî Firtine dikin." "Firtine guhdare. Ka hûn li ku derê man Cesur?" "Raste heval, tam were wê nokta ku em jê çûbûn dîlanê. Doktor rewşa hevalê Jîr çawe ye? Ma wî pir zêde xwîn daye." "Em niha nikarin teqez tiştekê bibêjîn. Bîrîna wî giran e. Me jêre serûm girêdaye. Ji bo em serûmê bi darê ve girêbidin ji me re paçek pêwîst e." Çekdar û Piling hinekê li dora xwe zivirîn lê tiştek nedîtin. Ji nişkave fanîleyê Çekdar hate bîrê. Fanîlê wî yê ku bi xwehdana germahiya rojê weke avê lêhatibû, li ber darekê derêxist û bi serûma hevalê xwe Jîr ve girêda.

Çekdar di nav hizirandinekê de bû. Li ser tolhildana hevalên xwe dihizirî. Taxima wan derbeyên pir mezin li operesyona dijmin ya bi navê bayrak dabûn. Dijmin gavek paşve vekişiya bû. Lê bi temamî hêzên xwe ji Cudî venekişandibûn. Di van çalekiyên wan de du hevalê wan yê hêja bi navê Berîvan û Jiyan jî şehîd ketibûn. Çekdar bi şehîd bûna wan hevala gelek xemgîn bibû. Lê dema ku doktor Agirî got; "hevalê Çekdar, derbeyên ku te û hevalê Jîr li dijmin xistin, we hem tolhildana wan hevalan rakir, hem jî we hişit ku komên hevalên din jî baştir li ser dijmin çalekiyan bikin. Dijmin bi gelek windahiyê xwe ve gavek paşve vekişiya. Hîn doktor Agirî dixwest tiştek din jî ji Çekdar re bibêje, lê Piling axaftina wî nîvçe hişit got: "rewşa hevalê Cudî wan çawa ne? Heval hemû baş in. Piştî ku dijmin di vê qadê de derb xwar ber bi Şirnaxê ve vekişiya. Hevalên taximê jî li wî cihê ku hevalê Cehfer ji me re civin çêkirîbû, hem bêhna xwe vedidin hem jî amadekariyên tîmekê dikin ku îşev jî li dijmin bidin. Jixwe hevalê Cudî û taxim li benda we ne. Lê belê berî ku hûn biçin, divê em cihê hevalê Jîr, li gorî rewşa operesyonê saxlem bikin."

" Bi teqez divê ez di vê tîma îşev de bim." "Tu wisa çi di ber xwe de dipeyîvî heval?" "Hevalê Piling, îşev divê em tola hevala Berîvan û hevala Jiyan û hevalê Jîr rabikin." "Jixwe tu dizanî hevalê min, ma ew jî gotine… ma bêyî me çalekî dibin." "Tu mirov bi zorê didî kenandin

hevalê Piling. Bi qurana bapîrê te seydayê Bedirxanî yê çil jin û 99 zarokê wî hene, tê niha bibêjî tu zirtê Şirnexiyan didî.” “Jixwe hevalê Piling tu ji Şirnexiyan zêdetir Şirnexiyî û zirtê xwe dikî.” “Bapîrekî te jî weke bapîrême hebûya, rewşa jinê wê li Rihayê û li Kurdistanê hîn kembaxtir biba. Lê divê em ji Serok Apo re her roj bist û çar seatan dua bikin ku di şexsê rizgariya jinê de em hemû ji koletiyê rizgar kirin. Ji ber pêşketina Rêbereke wisa li cihekî weke Rihayê rê li ber Serokekî hemdemî, weke Serok Apo vekir. Mîrtî û axatî ji bo bapîrê te nema. Ger ku biba xwedê dizane wê li ser jinê çi axayeke zalim bûya.” Piling di ber xwe û bin lêvên xwe de hinek keniya, bi dengekî hêdî ji xwe re got, “jixwe netirsa rêxistinê bûya, niha jî li ser jinê em her yek axayek bûn.”

Roj çûbû ava. Reşatiya şevê hêdî hêdî dikete erdê. Bayê hênik ji navsera Cudî li pelên dara dida û rûyê wan hênik dikir. Çekdar û Pilingî cihê fermandarê xwe Jîr û doktor Agir saxlem kiribûn û çeka xwe jî dabûn milên xwe û di dibin reşatiya şevê de winda bibûn.

Birîna Jîr pir giran bû. Demekê bi zorê hinase distandin, tenê av dixwest. Lê belê vê carê nekarîbû avê jî bixwaze. Bi henaseya xwe ya dawî tinê çavên wî zîq li doktor Agirî aliqî mabûn. Destê wî yê cemidî jî di destê doktor Agirî de bû. Beriya stêrka berbangê ew tevlî karwanê şehîdan bibû. Doktor Agirî destê wî li ber kêleka wî rast kir û çavên wî yên vekirî mabûn hêdî hêdî destê xwe danî ser rûmeta wî û çavên wî girtin. Doktor Agirî yek ji wan doktorên gerîlabû ku bi sedan hevalên xwe yên birîndar di rêya çalekiyan û kêliyên mirinê de xilas kiribûn. Lê ji ber bêderfetiyên dermanan nekarîbû hevalê xwe Jîr xilas bike. Ew ji bo wê gelekê xemgîn bû. Cenazeyê hevalê xwe bi şûtikê pêça û di kêleka cihê lê dima de bi bistika çeka xwe nêzî çend seatan ax kola û hevalê xwe Jîr li wê derê veşart.

Giyayê çiyayê girê Hêrmo ji tirêjên rojê zerbibûn, hilmeke germ ji wan radibû. Germahiya rojê rûyê wan germ dikir û xwehdana li ser rûyê wan zêdetir dikir. Çekdar û Piling ji ber westandina çalekiya şeva din, hîn di xew de bûn. Tirêjên tavê raste rast li ser serê Çekdar û Piling bûn. Mêş û pêşû yên ku ji ber germahiya rojê xwe kom kiribûn, li ser serê wan dikirin vize viz. Di nava her saniyekê de Piling xwe dizivirand, bi zivirandina lingê xwe Çekdar ji xew hişyar dikir. Çekdar xwehdana li ser rûyê xwe paqişkir, "îca ev Piling di xew de jî bela xwe ji mirov venake. Çibû heval, ka rabe te nehişt ez xew bikim, ez jî nahêlim tu xew bikî." Piling bi çavên girtî rabibû û kêleka Çekdar rûniştibû. "Hevalê min çiqas xewa te nexweş e, ya tu di xew de dikî pixe pix, yan jî tu di cihê xwe de nasekînî." Erê wile heval tu rast dibêjî, ez baş nizanim lê ez bawerim ez heft mehî hatime dinê. Dîsa te tiştek ji xwe re peyda kir. Ka rabe berî ku hevalê Cudî me ji xew rabike, em biçîn ser kaniyê ser û çavên xwe bişûn, hinekê jî tiraş bibin û ji bo em paqij bikevin civînê."

"Deryayê bangî Avareş dike, Avareş guhdare. Belê heval me girt, bi teqez em ê serbisekinin. Eger ku hûn tiştekî bibêjîn em guhdarin." Cudî di derbarê çalekî û operesyonên li qadê û dîsan windahiyên ku dabûn de tekmîla xwe dabû deryaya jora xwe. Cudî bi agahiya dîlgirtina hevalê Yilmaz û hevalên pê re bûn pir xemgîn bibû. Lê rêxistinê jêre gotibû divê bi çi awayî niha ji hevalê taxima xwe re ranegîhîne. Jixwe dijmin wê di radyo û tv'yên xwe de binkeftina xwe ya li hemberî gerîlayê Kurdistanê bi dîlgirtina koma hevalê Yilmaz, ji bo rayagiştî û dinyayê re xwe weke serkeftî derbixîne pêşber. Jixwe di taxima wan de yek radyo hebû, ew jî di destê Çekdar de bû. Çekdar rojane nûçeyên girîng guhdar dikir û bi taximê re parve dikir. Cudî li ser vê mijarê pir nekete fikaran, ji ber ku hevalê Çekdar radyoyê guhdar bike jî, wisa raste raste naçe ji taximê re nabêje. Li seata xwe nêrî ji civînê re nêzî du seatan zêdetir mabû. Kêmek hizirî

û jixwe re got, “piştî nanxwarina nîvro em ê dest bi civîna çalekiyê bikin. Lê divê berî civînê talîmata Serokatî ya ji bo Botanê ku ji aliyê fermandariya bîryargeha navendî ya Botanê ve li ser cihazê hatibû dayîn, hevalek wêna derbasî nivîsê bike. Yan jî bi vê xwuşe xwuşê nayê famkirin. Li xwe zivirî û destê xwe bir berîka êlekê xwe, paçek ji berîka êlekê xwe derxist û bire ser enya xwe û xwehdana enya xwe bi wî paçî paqij kir. Pişre jî ji hevalê kêleka xwe re got, “ka zû banî hevalê Çekdar bike.”

Di bin sîbera dara berûyê ya ku temenê wê nêzî sedsalan dibû, civîn wê dest pê bikiribûya. Lê berî civînê li ser temenê dara ku di bin sîbera wê de kom bibûn, ew qas nêrîn hatibûn pêşxistin, lê di encam de dar li gorî nêrîna Piling û gelek hevalan nebibû sedsalî. Dengeke nazik ji gotinên hevala Selcan derket, “heval dev ji darê berdin, berî ku heval Cudî bê li ser civînê bihizirin.” Kemal gotina Selcan pişrast kir û got, “hezar rehmet li babê te be heval. Jixwe ev gotinên teşqele hemû di bin sere Piling de derdikev in.” Pilingî dîsa xwe negirt, “heval hûn nahêlin mirov di derbarê xwezayê de jî bibe xwedî zanyarî.” Hinek acizbû û di cihê xwe de rûnişt.

Tîrêjek rojê di bin pelê sîbera darê da li rûyê Çekdar dida. Di bin wê birîqîna rojê ya fediyokî de Çekdar li ser gotinên Serok Apo yên ji bo qada Botanê, li ser şerê gerîla û mîlîtaniya lehengî dihizirî. Wî gotinên Serokatî hevok bi hevok wergerandibû ser kaxizê. Her ku ew hevok dihatin bîra wî şehîdbûna her du hevalên jin li bîra wî nediçû. Ji ber ku Serokatî li ser şehîdbûna hevalan û teybet windahiyên dawî yên li Botanê gelek rexne kiribûn. Û dîsan ji xwe re digot, “gelo birîna hevalê Jîr çawa ye? Doktor Agir karibûye wî xilas bike? Gelo ma dermanê wî têra birîna hevalê Jîr kiriye?” Ew kêliyên dîmenên heval Jiyan hatin bîrê. Ji xwe re got, “hevalê Delîl baş nekir. Teqez divê di civînê de hevalê Delîl ji bo nêzîkatiyên xwe yên feodal rexnedayîneke baş bide hevalên jin. Jixwe ez bawerim hevalê jin wê di civînê de wî baş rexne bikin.” Çekdar dîsan li ser hizirandinên xwe de çû, “gelo ma ez jî li hemberî hevalê jin ew qasê feodal im! Her çiqasê ez li hemberî dayîka xwe û xwişka xwe baş jî bûm, lê ev têrê

nake. Ji ber ku Serokatî artêşa jinê û vîna jinê, di nava artêşa ARGK'ê de di asta pîvanên azadiyê de dinirxîne. Di vê mijarê de ez hîn baş xwe nas nakim."

Cudî di destê wî de kaxeza spî ber bi cîvînê ve dihat. Lê ew ne tenêbû, li gel wî doktor Agirî jî hebû. Çekdar bi xemgînî, çavên wî zîq li doktor Agirî mabûn. Jixwe berî demekê jî radyo guhdar kiribû. Nûçeya dîlgirtina hevalê Yilmaz, raste neraste di nav fikaran de bû. Lê nedixwest wisa asayî jî ji heval Cudî pisyar bike. Bi rabûna hemû hevalan re ew jî rabibû. Civîna ji aliyê heval Cudî ve bi deqekê rêzgirtina li ber giyanê pak yê şehîdan hatibû destpêkirin. Bi hatina doktor Agirî hemû endamên taximê hêdî dizanîn hevalê Jîr şehîd bûye. Dîmenên hevalê Jîr yên herî dawî hatin pêş çavên Çekdar. Hêdîka ji xwe re got; "hevalê Jîr ez mirinê hîç layîqî te nabînim. Mirin li hemberî te pir tiştek ji rêzê ye û biçûke. Ka rabe were." Çekdar ji nişkave dît ku ji xwe re daxive. Pişre xwe komî ser hev kir û guhê xwe da ser axaftinên heval Cudî.

Cudî beriya civînê li ser bîranîn û têkoşîna hevalê Jîr, her du hevalên jin, heval Jiyan û heval Bêrîvanê dest bi gotinên xwe kir. "Jixwe heval dizanin, piştî şehîdbûna hevala Jiyan û heval Bêrîvan, di hevçûna herî dawî de jî me fermandarê xwe yê mangê hevalê Jîr bi lehengî şehîd da. Eger ku me di şer de rêbazên gerîla baş bi cih anîbana bi teqez me yê di şer de jî şehîd nedabana. Lê belê hinek kêm û kurtiyên keyfî rê li ber bedêlên giran vedike. Dibe ku heval di dilên xwe de bibêjîn, em şer dikin em ê şehîdan jî bidin. Lê ne wisa ye. Serokatî me di vê mijarê de bi hêrs rexne dike û hişyar dike. Em ê di civînê de jî ser van kêm û kurtiyên xwe bisekinin. Lê belê beriya civînê em ê giştînameya ji Serok Apo hatiye bixwînîn."

Çav hemû li ser Çekdar bûn. Ji ber ku wî gotinên Serok Apo bi şêwazeke zelal ji zimanê Tirkî derbasî zimanê Kurdî yê devokî dikir. Pir caran hinek hevalên wî jê re bi pêkenîn digotin, "hevalê Çekdar tu li gorî devoka xwe ya Botanê werdigerînî." Lê Çekdar di bin wan gotinan de nedima û ji wan hevalan re jî gotinên baş peyda dikirin. "Îca heval ma ev jî gotine. Mane devoka Botanê Kurdiya eslî ye. Yekemcar ji aliyê kalikê me Celaded Elî Bedirxan ve ristên tîpên Kurdî yên latînî hatine çêkirin. Dîsan yekemcar ji aliyê wî û birayê wî

Kamûran Bedirxan ve kovara Hewar û Ronahî hatine derxistin. Ji bo wê heval, devoka Botanî Kurdiya eslî ye. Vê rastiyê hêdî qebûl bikin." Çekdar bi pêkenîn li esîmanê şîn nêrî, bi hinaseyeke baya ku ji navsera Cudî, ji kêleka gora Lawikê Xerîb û Fermandarê wan Cuma Bilikî dihat û li rûyê wan dida kêşa nava xwe.

Cudî pîştî ku ji beşdarên civînê re mafê axaftinê da, bêdengî li ser çav û lêvan asê ma. Heta çend xulekan deng ji kesê nehat. Cudî awirên xwe li ser Wedad(xiyanet kiriye) tûj kir û got, "ka rabe, te çima parastina hevalên jin nekir. Di encama oportînîstiya te de me hevalên xwe yên gelek hêja hevala Jiyan û hevala Berîvan şehîd dan. Niha jî weke ku tiştek nebûye hûn wisa ji rêzê li xwe meyze dikin." Vedad bêdeng mabû. Gotin di deve wî de asê bibûn. Cudî destê xwe bir pişt xwe û bi hêrs, "ger ku we parastina hevalên xwe bikiraya wê îro ew heval niha bi me re di civînê de bûna." Cudî ji ber vê hêrs dibû. Piştî ku Cudî mijar vekir çend destê hevalên din jî li hewabûn, destûra axaftinê dixwestin. Cudî kaxeza lênûsa xwe zivirand û dirêjî da axaftina xwe, "ji bo Wedad ev qas nirxandin bes e. Wî di şer de tewan kiriye. Ji bo wê ew ê bê cezakirin." Wedad piştî gelek nirxandinên ku di civînê de hatin pêş û dîsan ji ber sekna wî ya jiyanî ji peywira mangê hatibû girtin. Ji ber ku sûcê şer jî kiribû, heta 15 rojan sizayê bê çek mayînê dabûnê. Vesazbûna wî jî li taxima lojîstîkê hatibû pêşniyar kirin. Ji ber nêzîkatiyê feodal û biçûkxistina hevalên jin, Delîl di civînê de ji aliyê hevalên jin ve pir cîdî hatibû rexne kirin.

Rojê hêdî hêdî cihê xwe ji esrê re dihişt. Tirêjên rojê li pişta gir dizivîrîn û diçûn ava. Reşayiya şevê ketibû ser erdê û ew dimeşiyan. Hîva çardeh şevî mîna lokizekî li hinda serê wan diteyîsî. Çavên Çekdar her li ser hîva çardeh şevî bû. Wî dilê xwe li ber ronahiya wê razandibû. Her ku gavek dimeşiya, ronahiya hîvê di xeyalên wî de hêviyên nû dirisandin.

## Di Çalekiyeke Germ De Rihê Tolhildanê

Her hêviyeke pêşerojê ji bo wan rêya serkeftinê bû. Her ku ber bi rojê ve dimeşiyan, hêvî di giyanê wan de destpêkeke nû bû. Wan li hemberî sed hezar leşkerên Tansu Çîller û hêzên Natoyê ku diketin gundên Kurdistanê û Botanê dişewitandin û talan dikirin li ber xwe didan. Bi şev û roj di meşên dirêj de bêyî ku bizanin westandin, bêxewbûn û birçîbûn çiye li ber xwe dabûn. Qermîçûkên kefa destê wan ji berxwedanê zêde bibûn. Giyanê wan ji kevneşopiyên dîroka wan ya berxwedanê zindîbûn. Ji bo wê dilê wan germ û giyanê wan sivik bûn. Di çavên her yek ji wan de stêrka berxwedanê hebû. Di vê çalekiyê de jî ji bo wan giyanê tolhildanê asoyê azadiyê bû. Ew di fêrgeya şehîdê xwe yê destpêkê Hakî Karar de fêrbibûn ku tola şehîdan pêngaveke nû ye. Tola hevalê wan Cuma Bilikî jî ji bo wan tola mezin û destpêkeke nû bû.

Cehferê Sor hinek zendên xwe hilda bûn. Xanîtûkeke bi keviran girê qereqola Bêspin li pêşiya xwe çêkiribû. "Heval hûn dibînin. Vê derê girê qereqûla gundê Bêspin e. Me carekê keşfa wê kiriye. Koma leşkerên wan yê li ser çekên giran hinda vî kevirî ne. Nobedarê wan li vê derê disekinin. Cihê wan yê herî lawaz jî ev dere ye. Koma êrişê yê di vî cihî re biçe. Koma tekwiyeyê jî wê li vê derê bisekine. Piştî ku koma êrişê kete qereqolê ew jî wê bikeve êrişê. Dîsan koma êrişê wê biçe keşfa herî dawiyê bike. Li gel wan heval Celal Kobra jî wê biçe. Ji ber ku heval Celal arazî baş nasdike wê di vê çalekiyê de roleke giring bibîne. Koma êrişê dema ku êrişî qereqolê kir, wê tektîkên gerîla bidin meşandin. Wê çalakî ji çar deqeyan, herî zêde pênc deqeyan zêdetir ne ajo. Eger ku qereqol ket û heval ketin nav wan de, divê qedeme qedeme heval parastina hev bikin. Wisa çekên leşkeran rabikin. Dema paş de kişandinê jî kes li gorî xwe nemeşên. Divê em bi vê çalekiyê toleke mezin ya şehîdên xwe rabikin. Divê tola rêheval Cuma bibe tola vale derêxistina hêza

operesyona Nato ku nûnertiya wê niha hukimeta Tansu Çîller û Dogan Gureş dikin. Divê ev çalekî di şexsê rêheval Cuma de bibe tola hemû şehîdan û şehîdên Botanê û Cudî.”

“ Heval Çekdar, xwe bixin nav wan çiloyan, bila şivan me nebîne. Şîvanên gundê Bêspinê gelek ji wan nebaş in. Piştî wê tevlîbûna qanûna leşkerî me nêzî deh ciwanên wan tevlî kiribûn, xelkê gund li hemberî me ye, pirî ji wan çek rakirine. Hinek jî bi dewletê re kar dikin. Hûn dibînin hevalê Çekdar, qereqola gund ev der e. Gorî ku min jimartî nêzî bîst leşker di qereqolê de hene. Ji te re dûrbîn, hûn jî lê meyze bikin.” Bi dorê li gel Çekdar hevalên din jî keşfa qereqolê kirin. “Heval, berî ku em biçin çalekiyê em ê dîlaneke xweş bikin. Min mêjve dîlan negirtiye. Ez ê têra xwe îro dîlan bigrim.”

“Hevalê Celal, te ew tenûra li ber qereqûlê dît. Çend jin û dayîk li ber wê derê sekinîne. Di aliyê me de meyze dikin. Heval tu heyatî, çavên te jî weke lazerê ne. Ka wê dûrbînê bide min.” Celal Kobra tenê keşfa qereqolê kiribû. Pir zêde bala xwe nedabû derdorê qereqolê. Dayîka navê wê Teybet ji dayîkên din re digot, “di nav wan çiloyên jorî me de hinek reşahî heye. Car caran hinekê xwe dilepitînin. Dibe ku ev dîsan karker bin.” Dayîka Zeynep kete navberê, “min berê gelek ji wan hezdikir. Lê piştî ku kurê min bi zorê birin, ez ji wan aciz bûme.” Helîmaya fîstan zer bi çavên xwe yên kildayî li Zeynebê nêrî, “ma kî dizane kurê te bi zorê birine xwîşkê. Dibe ku kurê te bi dilê xwe çûyî be. Keça min jî ev du sale di nav wan de ye. Ma keç û kurên me neçin, ma kî/kê dê vî barê Kurdistanê rabike. Hemû zarok û kezebên me ne. Divê em dayîk li pişta wan bin. Erê dayê çavên min ji Hesen û ji hevalên wî re birêjê.” Dayîka Helîme rondikên çavên xwe yên kildayî paqij kir û destê xwe dirêjî tenûrê kir.

“Hevalê Çekdar, van dayîkan em dîtin. Dibe ku biçin agahiyê bidin dijmin. Em hinekê wan bişopînin pişre em tevdîrên xwe bigrin.” “Heval, dayîk wisa raste rast naçin qereqolê. Wê li hêviya zilamê xwe bisekinin. Ger ku niyetên wan xirab bin zilamê wan wê agahiyê bidin qereqolê.” “Hevalê Zefer rast dibêje. Wê demê em tevdîrê xwe wisa bikin. Du heval biçin noqteyê û em du heval jî li vê derê bin. Eger ku tiştek nebû, em ê sibê bi şev çalekiya xwe bikin. Pêşniyara min heval Celal û Leşker biçin. Ez û Çekdar bimînin.” Leşker çavên xwe yên weke karxezalan kesk li ser Zafer zîq kirin. “Na ez qebûl nakim. Ez ê li vê derê bimînim.” Zaferî gulîka porê xwe yê reş hêdîka pê destê xwe li ser çavên xwe rakir, bi nêrînên xwe yên tûj, “heval tu pir li gorî xwe yî, ez dimînim. Hûn her du jî namînin. Ez û heval Celal dimînin.” “Nabe heval.” “Çima nabe. Hûn ger weke zarokan şer nekin, wê demê dibe.” “Hevalê Çekdar, tu dema mirov rexne dikî, weke guleyê hewana hevalê Celal lê didî.” Celal destê xwe yê mezin, jixwe destê wî weke destê mirovên dêw û eslî bûn, li pişta Çekdar da, “ma hemşeriyê kiye?” Ji ber şeqama destê hevalê wî Celal, îska kenê di qirika Çekdar de mabû. Zefer bi nêrînên xwe yên qure qure, “heval ji xwe hemşeriyê te zeîfûke. Tê wî hemşeriye xwe bikûjî. Hûnê vê carê bê hemşerî bimînin.” Bi hev re bû pîq pîqa kenê wan.

“Qereqûl ket, qereqûl ket. Ew ket. Herekol hûn dengê min digrin. Em niha li ser hevde cenazeyên leşkerên Tirk in. Me A- 6, 2 adet MG- 1 adet topeke 51 û her wiha 10 adet G-3 û gelek amûrên leşkeran jî rakirine. Firtine dengê te tê min. Sehet xweş. Sehet xweş. Wisa xweş lê bidin. Hûn çavên min in. Firtine direvin. Nehêlin birevin. Lê bidin û qira wan bînin. Lê dema ku hûn paşve vekişiyayîn bi teqez nekevin bayê sermestbûnê. Bi şêwazê tektîkê gerîla lê bidin.”

Cehferê Sor, li ser girê jora girê Bêspin kordîna şer dikir. Binya wî de jî girê qereqola gundê Bêspin hebû. Cehfer ji wî girî pir xweş

dengê guleyên çalekiya hevalên xwe dibihîst. Li ber çavên wî bi hezaran gule diteqiyan û şev bi çalekiya hevalên wî weke mahşerê lê hatibû. Hinek ji gundiyên Bêspin jî bi keyfxweşiya wê çalekiyê derketibûn ber deriyên xwe. Çavê Cehfer ji xweşiya çalekiyê sor bibûn. Ji ber tola hevalên xwe yên şehîd rakirîbûn dilê wî rehet lê dida û giyanê wî sivik bibû. Hemû hevalên ku di çalakiyê de cih girtibûn pîroz kir û çavê xwe bi ser Çekdar û Celal Kobra gerand. “Hûn gelek jîr û serkeftî bûn. Divê bi teqez em koma we hemûyan xelat bikin.” Piştî çalekiyeke wisa xweş Çekdar bi dîtina xalê xwe şa bibû. Lê tişta ku ew herî zêde kefxweş kiribû silav û nameya hevalê wî Egîd bû.

“Komutan, îro ez dibînim keyfa te li cihe, lê hûn pir zêde meşrûbê vedixwin. Pişre hûnê ji vê vexwarinê sermest bibin.” “Efser, ger ku ez îro venexwim û ji vexwarinê sermest nebim, ma ez ê kengê vexwim. Çûkên ku em li esîmanan lê digeriyan ger ku xwedê qîsmet kiribe û bêgoman wê qîsmet jî bike. Ger pirsgirêkek di rê de dernekeve wê îro bên ber destê min. Me nêzî hezar leşkerên xwe di bayrak Operasyonê de bire ser Çiyayê Cudî, me nekarî zerbeyeke wisa xweş li wan bidin. Îro hinek ji wan terorîstan li gorî encama agahiya zilamê me yê baş Îsmet dayî wê bên berdestên me. Li gorî zanyariyên Îsmet, di nav wan terosîtan de fermandareke mezin jî heye. Lê heta niha em navê wî nizanîn.”

“ Hasan Kundakçı komutan, ma hûn ji zanyariyên Îsmet Tatar yê xwediyê maşîna sor ew qas bawer dikin?” “Belê belê efser, İsmet Tatar û Aziz Tatar li gel dewleta me ya mezin in. Eger ku îro ketin destê min, ez ê ji Hîtler jî derbas bikim. Bi navê xwedê ez ê laşê wan parçe parçe bikim. Ez ê weke vê şerabê xwîna wan vexwim û serxweş bibim. Efser ma tu nizanî Hîtler gotiye; ‘dema ku min Yahudî di komkujiyên gazê û subunê re derbas kirin, min dersên xwe yên

herî baş ji Mustefa Kemal Atatûrk girtin. Ji bo wê ezmûnê me hene efser. Ezmûnên me yên komkujiyên li ser Ermeniyan û dîsa Kurdan hene. Îro me li gel tevgera xwe ya operasyonê, li gel hevkarên xwe Îsmet Tatar û Aziz Tatar pîlangeriyeke ku em wan dîl bigrin çêkiriye. Ger ku ev pilana me bi serket, ne mutlu Tirkiye ji bo me. Tenê ji bo pilana komtanê xwe dua bike ku di rê de tiştek dernekeve. Ha efser, hûn ne Kurd bûn ne wisa?" "Haşa komtanim." "Efser jixwe hûn Kurd jî bin, ji bo me Kurdê baş heye û Kurdê terorîst heye. Ji bo wê Kurdê ku li hemberî dewletê serî rabike, li ser wî hemû komkujî rewa ne. Efser vêna jibîra neke ha! Û baş bêxe guhê xwe."

Efser ji tirsan di bin simbêlên xwe yên zirav û zer de haşayetî ji Kurdîtiya xwe jî kiribû. Dest û lingê wî direcifîn, lê di dilê xwe de jî digot, "ev çi zalimeke îmansiz e. Xwedê ji heqê îmansizan derkeve. Xwedê neheqiya Îsmet û Aziz ku li ser birayên xwe yên Kurd kiriye, jê wan re nehêle. Xwedê mala wî jî bişewitine."

"Heval Behdînan, ka bi tavilê xwe kom bikin em ê rêbikevin. Me li gundê Konserê maşînek amadekiriye, wê hevalê Yilmaz û hevalên ku pê re bûn biçin Başur. Hevalê kêleka Behdînan pirsî, "heval ma we gund baş kontrol kiriye?" Hevalê Behdînan, "belê heval, ew maşîna ku heval Yilmaz bibe kesekî nexirabe. Şêniyên gundê Konserê piranî baş in. Ew jî ji wî gundiye. Bi min re Hevalê Gabar, Selîm, Botan, heval Yilmaz û Seyit Abdullah tên."

Dema ku hevalê Yilmaz cilên sivîl li xwe dikirin, hevalê Behdînan ji koma xwe re çend axaftinên girîng bi lêv dikirin. "Heval, jixwe hûn dizanin hevalên li qadê piranî bi komên biçûk ji Cudî derketine. Lê bi şêwaza ku wê dijmin bixapînin û bi komên biçûk dîsan bikevin Cudî û li dijmin bidin. Peywira me jî ewe ku em heval Yilmaz heta Başur biparêzin. Jixwe hûn dizanin, hevaleke ji girtîgehê derketiye û hevaleke kevn e. Û her wiha rêveberiya me ya Cudî ye.

Di rê de çi xeterî derbikeve pêş, divê bi şiwazeke fedayî em wî hevalî biparêzîn. Dîsan hevalên cephecî rêyeke nû di Silopayê re derbas dibe amadekirine û em ê bi sivîlî di wê rêyê de biçin.” Gabar pirsî, “hevalê Behdînan, ma em ê çi li çekên xwe bikin?” “Ma ew jî pirse heval, çekên me jî wê bi me re bin. Hevalê Yilmaz divê hûn bi çi awayî di maşînê de û di rê de nepeyîvin. Dema ku xwediyê maşînê jî pirs kir, em ê bibêjin ew heval pir nexweş e.” “Belê heval, hûn çawa guncav bibînin.” “Hevalê Botan, divê hûn jî pir zêde pirsan nekin.”

Îsmet Tatarî serê xwe ber bi dîreksyona maşîneyê xarkir û bi çavên xayînane ji wan re got, “heval hûn bi xêr hatin.” Hevalê Behdînan jî bersiv da “hûn jî di nav xêrê de bin.” “Heval divê hûn çekên xwe bixin boxaja maşîneyê.” “Çawa dibe tiştên wisa kak Îsmet. Qet tişteke wisa nabe.” “Heval bêxem be, ciheke pir hindike, dema ku me ew cih derbas kir ez soz didim hûnê dîsan çekên xwe bigrin. Jixwe ger ku tiştek çêbû çeka min jî di boxajê de ye. Min rêya Silopiya hemû qontrol kiriye, tiştek nîne. Heval jixwe îro dijmin nederketibû araziyê jî. Piştî wê çalekiya gundê Bêspin pir ketine tengasiyê. Gelek fermandarên wan yên ku pêşiya operasyonan pêşengî dikirin, di wê çalekiya gundê Bêspin de hatin kuştin.” Behdînan bi gotinên jixwe bawer, bi nêrînên serfirazane, “kak îsmet em wisa li dijmin didin. Em ê bi teqez dijmin ji Kurdisanê derêxînin.” Îsmet dîsan bi wan nêrînên xwe yên xayînane di bin simbêlê xwe yê boq de keniya û got “îşeleh heval. Heval navê we çibû? Ma hûn jî di wê çalekiyê de hebûn?” Weke ku sed mirov ji Behdînan re bibêjin; “ji wî xayînê çav beloq re navê xwe nebêje.” Hîs, hest û hişyariyên ku di wê kêliyê de di nava mejiyê Behdînan re derbas dibûn, ew şiyariyê xwe parastineke cewherî dikir.

Kêliya ku Îsmet bi Behdînan re dipeyîvî û pirsa hevalê wan Yilmaz jî dikir ku çima wisa nexweş bûye, Botan û Gabar jî di bin

guhê hev de dikirin piste pist. Botan di gûhê hevalê xwe Gabar de hêdîka got, "hevalê Gabar, ev zilam qet nekete serê min. Hîsê min dibêjin, di bin serê vî zilamî de tiştek heye." "Hevalê Botan kêliya din hevalê Yilmaz jî wisa digot. Lê dîsan digot ma ne hevalê me yê cepheci eyar kirine. Divê mirov ji hevalê xwe bawer be. Ji bo wê dilê xwe rehet bikin." Lê ew jî pir bi fikar bû, me çekên xwe xistiye di baxaja maşîneyê de. Hevalê Gabar tu li ber deriyê maşîneyêyî, ger ku tiştek hate pêş xwe bavêje ber derî û baxaca maşîneyê veke. Ez jî hinek ajotina maşîneyê dizanim, ez ê xwe bavêjim direksîyonê û maşînê bajom. Hevalê Gabar bila ev pîlan jibîra te neçe ha!" "Bêxem be heval."

Hevalê Yilmaz di kêleka pencereya maşîneyê de, bi fikar li rêya deşta Sîlopiyayê temaşe dikir. Lê belê tûrikê dilê wî tejî hêvî bûn ku wê careke din vegere qada Cudî. Wî ji Cudiyê miradan gelek hezdikir. Di girtîgehê de ji çîroka Nûh Pêxember bigre heta gelek çîrokên evînê li ser Cudî xwendibûn. Dîsan gelek bîranînên hevalên xwe yên ku li Cudî şehîd ketibûn, hîn çîrokên lehengiya wan nehatibûn nivîsandin guhdar kiribûn. Wî bi vî dilê tejî hêvî careke din dixwest vegere Cudî. Dixwest di wê kêliyê de bifire biçe Cudî. Di eynika cama pencereya maşîneyê de Serokatiyê û kêliyên azadiyê înandin ber çavên xwe. Ma ne ji Serokatiya xwe yê azadiyê re soz dabû ku wê ji bo azadiyê, di nav nêçîra guran de bi serkeftî bimeşe. Dîsan hezar tişt di wê kêliyê de di hizrên wî re derbas dibûn. Yilmazî kêmekê cama pencereya maşînê vekir, mistek baya deşta Sîlopiya kişand hinavê xwe û di hizrên xwe de derbas kir. Li gorî axaftina ajokar Îsmet, rêya xeter hindik ma ye. Me ev rêya xeter jî derbas bikiriya wê pir baş bûya. Çavê wî her li ser Behdînan bûn. Ji jîrbûna Behdînan gelek bawer bû. Hevalê din jî weke Behdînan jîrbûn. Lê Behdînan ji aliyê rêxistinî ve hestiyar û gelek jî hişyar bû.

Dil dixwaze ceng bike û di cengê de merg bide. Dil dixwaze şa bibe û di şahiyê de bistirê û dîlan bike. Dil dixwaze bextewer be, bi wê bexteweriyê û bi baskan bifire. Dil dixwaze evîndar be. Bi evîna xwe şa be. Û dîsan dil dixwaze her tim bi hêvî be, bi hêviyan xeyalan bihûne. Lê mixabin sed mixabin. Hêvî û xeyalên wan ketibûn nêçîreke qewmê kewê. Yan jî ketibûn nava kurmê darê. Çavên Îsmet Tatar, yek bibû kew û yek jî bibû kurmê darê. Wî rûyê xwe ji xwîna birayên xwe yên herî bedew şûştibû. Û dîsan wî li hestên dilê xwe ji hestên dijminên xwe yên xwînxwar bar kiribûn. Ev çi xiyaneteke bêbext bû ku ev bêbextî û xiyanet di xwehdana rûyê Îsmet de dihate xwarê!

Çavên Îsmet zîq li ser Behdînan bûn. Ji xwe re digot, "ev heval pir jîr e. Ger ku bizane min şîkayeta wan kiriye, teqez ew ê min a niha let û letî bike û bavêje ber segan. Her wiha ger ku pîlana min a radestkirina wan bi sernekeve wê fermandar jî min bikuje. Berî ku ew ji vê pîlana min bihesin Azîz û fermandar Hasan Kundakçi bizanin û ez zû wan radestî fermandarê xwe bikim."

Behdînan bi bertekek hişk, "kak Îsmet ev dere kîdere û çima em disekinin?" Îsmet bi çavên tirs û şaşmayî, "heval vê derê parka Hecî Silop ya ye. Tirk jê re dibêjin "Hacilar parki." Heval hûn pir westiyane. Em biçin parkê çayekê vexwîn û pişre jî rêbikevin. Jixwe ez ê hinek benzînê jî ji bo maşîneya xwe bigirim." "Na na, em çayê venaxwin. Hûn benzîna maşînê dagirin, em rêbikevin." Behdînan dîsa xwe bi Îsmet re dîsa bi tûndî aciz kir. "Îsmet ew kî ne li ber wê darê sekinîne û li me meyze dikin?" "Bêxem be heval, ez ê niha lê binêrim. Heval ew kesên ku we guman lê dikir, polîsên sivîlin. Ji bo ku pir guman neyê ser me ji maşînê dakevin, hinekê binê vê darê rûnin û pişre jî em ê rêbikevîn." Yilmaz û Behdînan û bi hevalên xwe ve ji maşînê daketin. Lê çavên wan her li ser çeka wan ya ku di

baxaja maşînê de bûn. Dilê Yilmaz û Behdînan bi teredûd lêdida. Ew ji vê rewşê bi fikar bûn. Yilmaz serê xwe zivirand ji Behdînan re got, "heval ka binêre vî zilamî derê baxaja maşînê kilît kiriye. Hûn bawer bikin vê carê ew dest min bikeve, ez ê guleyeke nav guhê wî bidim. Ka bi ku derêve çû." Hevalê Behdînan got, "li vêderê rûnin ez ê biçim çayê bînim." "Ka bila bê ez ê çaya wî jî di serê wî de bikim."

Îsmet bi çavên xwîn û weke ebda destê xwe ber bi jêr ve şor kir û ji fermandar re got; "Fermandar dilê te rehet be, çekên wan jî hemû di boxaja maşîna min de ne û kilît kiriye. Hemû ji bo nêçîra te di bin wê darê de amadene. Hûn dibînin ne wisa." Fermandar rûyê xwe yê reş û tejî pirzigên sor zivirand, bi çavên xwe yên beloqî got, "Îsmet aferîn, a niha hûn bûyîne zilamê dewleta xwe ya mezin. Jixwe dewlet babê we ye. Ez ê serê her yekî ji wan zêrekê bidim te."

Piştî nîv seat derengmayîna Îsmet êdî Behdînan, Yilmaz û tevî hevalên xwe goman kirin ku pişt vî zilamî pîlaneke ji nerê heye. Hema tavilê berê xwe dan baxaja maşîneyê. Lê zilamê xiyenetkar Îsmet Tatar baxaja maşînê kilît kiribû. Yilmaz û hevalên wî bi xwestin bi lezgînî derê baxaja maşînê bişkênin û çekên xwe derêxînin. Lê mixabin, hezarcar mala felekê bişewite, dora wan bi komên cendirmeyên teybet yên dewletoka Tirkan hatibû dorbêçkirin.

Bi dengekî bilind Hasan Kundakçî got, "hemûyan bavêjin erdê û destê wan zincîr bikin. Ma wisa hêsane hûn di bin serweriya artêşa Tirk re derbas bibin. Hûnê ji destê min wisa asan nefelitin. Ez ê di bin fermandariya xwe de we bêxim şîva guran. Hûn dizann gurên du ling wê goştê we xavî parçe bikin û bixwin. Yek bi yek hemû avêtibûn erdê û destê wan bi kelepçeyan girêdabûn. Behdînan li ber dara pêşiya xwe çavê wî ji nişkave li Îsmet ket. Îsmet jî ew dît. Bi tirs dilê wî lêdida û direcifî. Lê navê wî nedizanî. Di hizrê xwe re derbas kir, ger ku fermandar destpêkê wî nekuje, bi teqez Apocî wê tola xwe

nehêlin erdê. Hemû laşê wî dilerizî û dengê lezirandina didanên wî nedisekinî.

Ji mirinên hovane wêneyeke wehşiyetê di şev reşê de li ber perên esmanên şîn dengê nalîna mêrxwasan a bêdeng dihat. Koma stêrkan ji vê nalînê û lorînê veciniqîbûn, yek bi yek dihatin xwarê. Şeveke reş bû û tenê dengê segên har dihatin. Hest û dilê dayîkên wan hevalên wan yên çiya lê didan û xew nediketin çavên wan. Wê şevê wêneyeke ji wehşiyeta dewleta Tirk a li ser gelê Kurd zêde dibû. Behdînan bi laşê tazî û îskence kirî, di asqiya hilawêstî ya odeya wehşiyetê de temaşeyî wêneyên laşê hevalên xwe yên ku serê wan hatibû jêkirin û çavên wan hatibûn derêxistin dikir. Di asqiya kêleka wî de jî Seyit Abdullah Zaxoyî hebû. Ew jî ew qasê hatibû îskence kirin hal di wî de jî nemabû. Serê milîsê me Seyit Abdulah Zaxoyî, bi îşkencê û bi wêneyên wehşiyetê di kêlekê de şûr bibû.  Guhê wî jî hatibû jêkirin. Lê ew di xema guhê xwe de nebû.  Wêneyê hevalê Yilmaz ku çawa serê wî ji aliyê fermandarê wehş ve hatibû jêkirin li ber çavê wî nediçû. Selîm teslîm bibû û navê hevalê xwe Yilmaz dabû. Lê teslîmbûna Selîm ew xilas nekiribû, bi tavilê ew jî kuştibûn. Wî nedikarî wêneya wehşiyeta li ser heval Yilmaz û hevalên din jibîr bike. Berxwedana heval Yilmaz, Gabar, Botan jibîr nedikir. Her çi qasê laşe wî ji îşkencê dişewitî jî, lê berxwedana wan hevalan ji bo xwe mînak digirt û nedikir ‘ay’ jî.

Behdînan nedikarî wêne û dîmenên dengê pîqe pîqa fermandarê wehş ku dema serê hevalê wî Yilmaz jêdikir û çavê Botan derdixist, dest û difina Gabar çawa parçe dikir jibîra bike. Behdînan serê xwe kêmekê rakir, dît ku kes li odeya îskencexaneyê nîne û tenê nobetdar li ber deriye. Ji hevalê xwe Seyit Abdulah re îşaret kir. “Heval heval, ma dengê min tê we.” “Erê heval Behdînan, şikur ji xwedê re, ma tu saxî?” Behdînan di bin wî laşên xwe yên bi

îskencê herişîbû bi dengek hêdî, "belê heval. Ez ê ji te re tiştekê bibêjim. Berî ku ez şehîd bikevim, divê ez wî fermandarê wehş û îskencekar û hinek ji van zaliman bikujim û wisa şehîd bikevim."

Seyit Abdulah bi kelegirî ji Behdînan re got, "hevalê Behdînan tê çawa vî halê xwe yê hilawistî û nîv mirovî bikarî wan bikujî?" "Ka guhê xwe bide min. Ez ê ji wan re bibêjim, ez teslîm dibim. Dema ev pîlana min pêkhat, bi teqez şertên wan yên ku bibêjin, divê tu li gel me bê operasyonê wê hebe. Cihek heye min û heval Celal Kobra mayîna antîtang daniye. Ez ê ji wan re bibêjim, ew cih cihê cebilxanê û nexweşxanê ye. Dema ku em çûn wê derê ez ê di wan de mayînê biteqînim." "Heval, wê demê hûn jî şehîd dikevin." "Erê heval. Lê em heyfa xwe û hevalên xwe û partiya xwe jî mezin radikin. Lê divê hûn jî tiştekê bikin." "Hûn çi bibêjin ez amade me bikim heval." "Wê piştî demeke din ji bo kuştina me jî bên hûndir. Dema ku min ew bi teslîmbûnê ve mijûl kirin, hûn jî weke miriyan li xwe bikin. Ez ê ji wan re bibêjim ew miriye. Min çiqas bangî kir, lê bersiva min neda. Wê pir zêde bi te re mijûl nebin. Ji ber ku wê ji xwe re bibêjin, nêçîreke din ketiye destê me. Em zû biçin wê nêçîra xwe bikin.

Vê carê bi teqez wê we di nava cenazeyên hevalan de bavêjin çaleke nêzî ava Hêzil. Hûn jî dikarin xwe bavêjin avê û wisa xwe xilas bikin. Lê belê tiştek din jî heye hûn bikin. Îsmet Îsmet, xweyê maşîna sor. Hate bîra te?" Ma jibîra min diçe heval Behdînan. Ma ne wî ev bêbextiya mezin li me kir." "Dema ku hûn xilas bûn, jibîra neke navê wî û li gel wî jî Azîz Tatar heye, bi teqez ji hevalan re bibêje û teqez jibîr neke."

Dema ku di cengê de merg hebe, cengeke mezin jî heye. Behdînan bi tolhildaneke mezin, fermandar û bîrîma wî biribûn ser mayîna xwe û mayîn bi wan ve teqandibû. Tola cenga mezin bû. Di cengê de hinek ji wan bibûn çend parçe, lê laşe fermandarê wehşî

parçe parçe bibû. Çavekê wî jî ji teqîna mayînê firiya bû. Behdînan ew li gel xwe biribû ser mayînê û jê re gotibû, "keremke vê derê goma cebilxanê ye."

"Hevalê Cehfer pêwîstî bi lêpirsînê nake, em ê wî bi destê xwe bikujim. Heta ku em wî nekujin, dilê me rehet nabe heval. Nabe em bê tolhildan bin. Hevalê Celal, heval Çekdar, hinekê xwîn sar bin. Xelkê gund hemû nesîxur in. Divê em kêmasiyên berê xiyanetkarên weke Hogir, Şemo, Dixtor Silo, her wiha gelek kesan kirî li ser partiyê dubare nekin. Jixwe milîsê me Seyit Abdulah Zaxoyî ji me re hemû tiştek behs kiriye. Ew sîxurê bi navê Îsmet girtiye û di destê me deye. Tiştê kirî bêguman nayê efûkirin. Wî bi xayîntiya xwe komkujiyeke mezin kiriye. Wî bi xayîntiya xwe serê pêşengê me hevalê Yilmaz jêkiriye. Dîsan wî bi xayîntiya xwe guh, çav, dest û canê hevalên me parçe kiriye. Ew xayînekek mezin e. Bi teqez divê neyê efûkirin.

Lê divê em ji xelkê gund û ji malbata wan re bibêjin: "di nav we de xayînên wisa mezin derdikevin û divê ew xayînên wisa alçax ku ji dewletê re wisa dixebitin bên siza kirin. PKK li hemberî alçaxtiyên wisa ne di destpêkê de û ne jî niha ti caran bê deng nemaye û dê nemîne. Ne tenê ji alçaxên wisa re bêdeng namînin, li hemberî dewletê jî bêdeng namîne. Tolhildana me rêya bexwedanê û zeferê ye."

Cehferî mijankên çavê xwe bir û anîn, heta jê hat baya payîza navsera Cudî kişand hinavê xwe û berê xwe zivirand ser girseyê. "Gelê me yê heja, hevalê me Behdînan bi lehengiyeke mezin tola partiya xwe û hevalê xwe û xwe mezin rakiriye. Divê em jî weke rêhevalên wî, tola wî mezin rakin. Îsmet Tatar û Ezîz Tatar divê bên cezakirin."

## Li Cudî Bihar Tê

Ji sermestbûna bihara Cudî, rengê keske sorê jî xwe dida jor û dilê mirovên evîndar ji bo rûpeleke nû bi kelecan dikir. Di wê bihara xweş de gul û kulîlk, rengê giya jî weke guhreşk, tirşo, nançûk, soryaz, elok, kîvark û ti çi bixwazî di nava giyayê biharê de mirov dikare peyda bike. Ma tinê ev! Bêhna gula binevşê û kulîlka beybûnê difûre ser rûyê mirov. Pişre mirov hinaseyekê ji bêhna wan dikişîne nava dilê xwe. Hûn dizanîn di biharê de dara behîva çiyayî jî ya yekemîn ku kulîk dide bi xemla xwe ya spî û pîvazî çavê mirov ji bedewbûnên xwe têr nake. Xwezî her tim bihar bûya. Lê ez tinê ne ji biharê hezdikim. Ez ji payîzê jî pir hezdikim. Dema ku pelên daran zer dibin û weke emrê mirovan ji salekî derbasî saleke din dikin, pêre jî pelên wan diweşên ser axa zêrîn. Pelên herî xweş yên ku zer dibin, pelên dara çinarê ne. Dema ku zer dibin û li ser hev dikevin erdê çi dîmeneke xweş e. Payîz çi naveke xweş e. Hestên dilê min a dilbera hîva çardehşevî tîne bîra min.

Rengînê serê xwe ji kom kirina kîvarkan rakir û berê xwe da Çekdar, "hevalê Çekdar, ez li we meyze dikim, hûn tiştekê kom nakin. Hûn hema ji xwe re daxivin." "Hevala Rengîn, ma mirov dema ku giya kom dike, divê mirov baxive. Divê mirov dengê xwezayê hîs bike." "Hevalê Çekdar mirov dibêje qey tu helbestan dixwînî." "Erê heval, a niha helbesteke xweş di hizrê min re derbas bû. Ma tu nizanî ez ji bajarê Melayê Cizrawî me. Hûn wî helbestvanê nav û deng nas dikin?" "Ma qey ez her roj helbestan dinivîsînim hevalê Çekdar. Hevala Bihar tu helbesta dinivîsînî?" "Car caran. Teybet li ser hevalên şehîd." Dîsan Rengînê dest bi kîvark komkirinê kir, di ber xwe de jî got, "ka we çiqas giya kom kir, direnge em zû biçin. Hûn dizanîn min nava kefiya xwe tejî kîvarik kirine. Ez ji we zîrektirim. Hûn pir xwedî şansin hevalê Çekdar." "Çima heval dema ku hûn dibin xwarinpêş piranî hevalê jin arîkariya we dikin.?" "Gelo ma ew jî gotine hevala

Rengîn, hûn jî dema dibin xwarinpêj, bila weke pesin neyê famkirin, lê karê xwaringehê hemû ser milê min dimeşe. Ma ne wisa ye hevala Bihar."

"Destê te xweş be hevalê Çekdar, giyayê we pir xweş bû." "Noşîgiyan be heval." "Hevala Sozdar, ma hûn nabêjin destê we jî xweş be. Ez û heval Bihar jî çûbûn giya." "Hevala Sozdar, ev hevala Rengîn sebir nake, em jê re bibêjin destê te jî xweş be." "Ez bi xwe nizanim lê diyare ku nakokiyên we li ser giya pir in. Hûn jî dibihîsîn? Dengek tê." "Deng tê min jî heval." Hîn ji hev re digotin dengek tê, leşkeran bi leza teyreke baz xwe berdan jêr. "Heval heval, xwe kom bikin. Elîkopterê li jora me îndirme kir. Hevalê Çekdar zû her sê tîmên xwe cuda cuda bêxin nav dar û gihayan. Dîsan her heval li ser çente û cilên xwe çend darê çiloyê girê bidin. Divê bi çi awayî em tevger nekin. Ez ê jî li hinda vê darê û kevirî keşfa wan bikim. Bila cîhaza te vekirî be hevalê Çekdar. Caran jî li ser qenalê dijmin wan guhdar bike. Eger ku tiştek ji aliyê me ve nedîtin, wê berê roj biçe ava paşve vegerên." Hevala Sozdar, nabe hûn tenê li vê derê bin." "Tiştek nabe heval, jixwe ez nêzî her sê tîmame jî."

Bihara biçûk bi dilê xwe yê germ û kelecan û bi hirs bersiva Çekdar da got, "heval ma em êdî bûne YAJK, taxim û yekîniyê me çêbûne. Ma em ber pîvazane. Bêguman em ê bi hevalê xwe re bimînin." Çekdar bi çavên şermkirî xwe zivirand, bi pê kenîn "hevala Bihar me tiştek negotiye." Leşker di nav pelên darê de serê xwe rakir û bi dengeke hêdî "çi YAJK' a te ye hevala Bihar, hîn berê çend rojan bû komtanê we yê YAJK'ê Rengîn Efrin, di operasyonê de çeka xwe li ber avê berda." Çekdar bi acizbûn li Leşker zivirî, "heval ma ev çi gotinin. Bila qet hevala Sozdar van gotinan ji devê tîmame nebihîze. Ma ew şexseke, ma çawa di şer de hemû hevalên mêr ne weke hev in, hevalên jin jî wisa ne.  Ji zilaman jî hinek bizdonek derdikevin."

Guhê Çekdar li ser cihêzê bû, çavên wî jî li ber dûrbînê li paş de vekişandina dijmin dinêrî. Hizrên wî çûn ser axaftina Leşker. Di dilê xwe de derbas kir, ji bo Rengîn Efrîn, her çiqas gotinên hevalê Leşker rast bin jî, lê belê di şer de hevalê jin yên gelek zîrek hene. Mirov her hezdike bi wan hevalan re şer bike. Di şer de bîksî şixûlandina hevala Rengîn Mardîn ji gelek hevalên me yên mêr derbas kiriye. Wêrekiya gel wê hevalê mirov nikare bi gotinan pênase bike. Hevala Sozdar jî weke karxezalan jîr û zîreke. Dema ku dimeşê weke xezala ye. Bi tena serê xwe û wêrekiya xwe dikare biçe ser artêşa dijmin. Dîsan dikare di şer de gelek mêran bide meşandin. Çekdarî gotinên Fêrdarê xwe yên li ser jinê di pirtûka "çawa bijî" de gotibû, "Jiyankirina bi jinê re xweşik e, lê belê bi jina azad re, ya ku şer dike re. Ya ku xwe li ser vê bingehê diafrîne re, jiyan hîna zêdetir bi rûmet e. Pêwîste rêzdariya zilam jî ji bo vê hebe" hîn di serê xwe re derbas dikir ku hevala Sozdar li hinda serî wî sekinî bû. Çavê Çekdar zîq man, weke ku ji xwe re bibêje, "mirovên qenc tên ser gotinên xwe."

## Hevalên Yek Giyanîbûn

Çekdar û Demhat li Cizîra Bota hevalên hev yên eynî rê yên dibistanan bûn. Çekdar Îmam xetîba Cizîrê dixwend, Demhat jî liseya Cizîrê dixwend. Li ser rêya wan jî Mizgefta Sor hebû. Her ku dihatin ber mizgeftê silaveke bi giyanê Mela Cizrawî didan hev. Û kêmek jî bi hev re digirnijîn(tebesim). Bapîr û mamostê Çekdar jê re gotibûn; “ev Mizgefta Sor ku tu her roj di taxa wê re derbas dibî, di wexta xwe de Medresa Sor bû. Yek ji navendên herî girîng ê îlim û îrfanê ya hemû Mezopotamyaya jorîn bû. Lê îro mixabin ketiye çi halî. Ne îlimdar û nejî wêjevan û ne helbestvanên welat jê derdikevin. Bûye cihê sofî û şeytanogên dewleta Tansu Çîller û Dogan Gureş. Jixwe ev dewlet her roj, zarokên Kurdan bê ser û şûn dikin. Yên ku kêmek azadiyê dixwazin her tiştekê tîne serê wan. Kurê min di rêya dibistanan de divê agahiya te ji te hebe, bi kesên xirap re qet hevaletiyê neke. Her çiqas li hemberî vê zilmê, Cizîrî li ber xwe didin jî, lê sofî û xayînên me pir in. Gotina helbesta Mela yê Cizîrî jî jibîr neke, “heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf, di dinyayê de tu nabî ne meşhûr û ne marûf«”

Çekdar û Demhat, di bilindahiya çiyayê Cudî de bibûn hevalên heman riyê. Silavdayîna wan ya li ber rêya Medreseya Sor, bibû yek ji armanca şoreşgeriya welatê rojê. Hevalê yek giyanî bûn. Wan di rêka bilindahî û sernûşîviyên lûtkeyên Cudî de gelek caran silav dabûn hev. Lê di heman yekîniyê de nemabûn. Yekem car bû zeman û dema hevre mayînê xwe di çavên wan de dîtibû. Ew ji vê gelek keyfxweş bûn. Lê kêleka vê keyfxweşiyê rojên zehmet jî jiyandikirin.

Demhat ji keşfa çalekiyê nû hatibû. Lê rêbazê ku Xeyrî(Xeyrî pişre diçe xiyanetê) jê re gotibû, kir û nekir nedikete serê wî. Ew westayîbû û bi ser de jî dilê wî nerehet bû, bêhna wî teng bû. Bi vî şêwazê Xeyrî, di çend çalekiyê dîtir de hevalên xwe yên herî hêja

şehîd da bûn. Êdî vijdana wî qebûl nedikir. Divê bi çi awayî be ji Xeyrî re bibêje, “şêwazê te ya taktîk şaş e û bi vî şêwazê ne tu dikarî çalekî bikî û ne jî tu dikarî şer bikî.” Gelo wê Xeyrî çawa bersiva wî bida. Bi teqez ew ê li ser min pir aciz bibe. Lê dîsan jî Demhat ji xwe bêbawer nebû. Ji tûrikên hêviyan azweriyek kişand dilê xwe û di bin lêvên xwe yên tenik de, bi hêdî ji xwe re got; “jixwe Serokatî di kongra pêncemîn de şêwazên di fermandariya şer de ku xwe dubare dike û şer pêş naêxe rexne kiriye. Û gelek tişt jî di şexsê fermandariyê de mahkûm kiriye. Ez ê jêre bibêjim. Bi teqez ez ê jêre bibêjim.”

“Dibe ku hinek deran baran hatibe hevalê Demhat. Ji ber ku hewa nerme û bêhna axê tê.” Çekdar hingî jêhat bêhna axê kişand hinavê xwe. “Demsala payîzê jî gelek xweş e. Hûn jî bêhna axê digrîn.” Lê hizrê Demhat her li ser axaftinên Xeyrî ku jê re gotibû hûn oportunîst û newêrekin bû. Ji bo bîstekê jî be berê xwe nezivirandibû, li Çekdar meyze nekiribû. Lê çavên Çekdar her li ser Demhat bûn. “Ew çi bûye ji te? Hûn çima wisa bêdengin. Îcar wisa bi kul û keder li ser wî kevirî rûniştîne heval.” Qirika Demhat tejî kelegirî bû. Lê onûra wî rê nedida çavên xwe yên şîn paqij bike. Lê dîsan nekarî ji Çekdar re nebêje. Demhat destê xwe li ber çena xwe rakir û berê xwe zivirand ser Çekdarî. “Heval ji ber ku min şêwazê Xeyrî yê şer rexne kir, hemû tiştekê ku hate ber devî wî ji min re got. Ji bo wê bedêlê vê çi dibe, ez ê îşev bi teqez biçim wê çalekiyê bikim. Û kî wêreke û newêreke ez ê nîşanî Xeyrî bidim.”

“Hevalê hêja, ka hinek bêhna xwe fireke û bêhna axa vê payîzê bikişîne hinavê xwe. Jixwe fermandariya gerîla hemû ne Xeyrî Serhat û Sarî Hisênê Şirnexî ye. Wan çavên xwe yên şîn jî veke û dunyayê jî li xwe teng neke.”

Demhat dîsan kesereke ji dil kişand û bi dileke tejî ji Çekdar re got: “Heval ma hûn jî dibînin û hemû taxim jî dibîne. Ma ji terzê wan

û ji ferasetên wan me gelek heval şehîd dan. Hevalê Ferhat ji vî terzê Xeyrî bi întîharvarî çû çalekiyê û nehat. Disan hevala Çîçek û hevala Rengîn Mardîn, ew heval jî bûn qurbana terzê Xeyrî. Jixwe kesek ji me li hemberî ferasetên Sarî Hisên deng jî nake. Kêmek maye taxima hevalên jin, ji xwe re bixe kole. Hinek hevalên jin jî di bin navê parastinê de xistiye ewlekariya xwe. Ger ku ne ji hevala Sozdar Mardîn bûya, Sarî Hisên wê weke şêwazên xwe yên kevin, kefî bida serê hevalên jin. Rengîn Afrînê (Rengîn Afrîn jî pişre xiyanet dike) li hemberî wan qet vîna wê nîne. Xeyrî û Sarî Hisên çi bibêjin ew serê xwe dihejîne."

Her çi qasê Çekdar gotinên Demhat rast didîtin jî, lê ne dem û wextê wê bû ku wan gotinan piştrast bike. Li gorî Çekdar divê şêwazên Xeyrî û Serî Hisên yên jiyanê û şer di platformeke rêxistinî de bên rexne kirin. Ji bo wê Çekdar bi dileke hîn xwînsar destê Demhat girt û destê xwe avêt ser milê wî, "ka îca rabe ser xwe. Em biçin amadekariyên xwe bikin. Min ji Xeyrî re gotiye, ez ê jî îşev bi te re bêm çalekiyê." Demhat devê xwe tejî kir ku ji Çekdar re bibêje nabe. Lê gotina Xeyrî ya ku tu newêrekî hate bîrê. Peyv di devê wî de asê ma û tenê li Çekdar meyze kir û keniya.

Ji barîna barana payîzê bêhna axê li ser Gundikê Melê difûriya. Zarokên gund jî ji barîna baranê şa bibûn. Ji axa ku kêmek şilbibû, ji xwe re xanîtûk çêdikirin û veşartok dilehîstin. Gundiyên gundikê Melê, ji bo lawirên xwe çilo kom dikirin û giyayê ji baranê şil nebibû, berhev dikirin. Şivan û bêriyên gund jî, di nava pezên xwe de bûn. Dema zayîna pez bû. Pezê hinek şivanan jî ciwik înandibûn. Hinek şivanan cêwikên pezê xwe ji ber dengê guleyên ku ji qereqola gund dihat di rê ya gund de hiştibûn.

Piştî ku Demhat koma xwe ya çalekiyê bi cih kiribû, ew û Çekdar jî li gel hev guhê wan her li ser tevgera dijmin bû. Çavên wan

ji bo vê  kêmek jî be li ber dûrbînê nehatibû xwarê. Dema ku Demhat xwest heriya binê pilava xwe paqij bike, li gel dengê guleyên çekên leşkeran, dengê bilûra şivanekê jî dihat. Demhat pişt xwe zivirî û ji Çekdar re got, “tu jî dengê bilûrê sehdikî?” “Erê heval, çi qas dengeke xweş e. Tirsa dijmin ya vê esra êvarî li ser gundiyan jî bilav dike.” Çekdar destê xwe avêt guliya porê xwe bir û anî, guhê xwe da ser bilûrê û ji Demhat re got: “tu dizanî ew şivan çima vê esra êvarî bilûrê lê dide. Ji ber pezê wî belave, ji bo pezê xwe komî govê bike bilûrê lêdide.”

“Dema ku ez biçûk bûm. Bapîrê min li ser bilûrê ji min re çîrokek gotibû. Berî ku em biçin çalekiyê ka ez vê çîrokê ji te re bibêjim. Di berê de Keyayek(qiral) hebûye. Şivanek ji dûr tê û dibe şivanê Keya. Pişre jî ew û keça Keya dibin evîndarê yektir. Şivan kesên bîrmend têxe qasidê xwe û diçin gel Keya, qîza Keya ji şivan re dixwazin.” Çekdar kêmek sekinî, berê dûrbîna xwe zivirand ser qereqola gundikê Melê. Demhat bi kelecanî pişre “çibû?” “Îca ka were şûna min ez ê hîngê çîroka xwe berdewam bikim. Ma te di kîjan dîrokê de dîtiye Keya wisa belaş keça xwe bide şivanekê hejar. Şivan ji qasidan re dibêje; şertê min heye. Şertê wî jî tu dizanî çibûye?” Demhat kêmekê hizirî, “bêgoman şerteke pir giran bûye ku şivan nekariye bi cih bîne. Şertê wî jî li ser bilûrê bûye. Keya ji qasidan re dibeje: “ez ê bê av, heft roj û heft şevan di govê de xwê bidim pezê xwe. Piştî heft roj û heft şevan, ez ê pezê xwe berdim. Pez piştî vê ecêba xwê dê bi lezgînî biçe ser avê. Eger ku şivanê min karî bi bilûra xwe pezê min şûnve vegerîne, hingê keça min jê re pîroz be. Lê ger ku nevegerand divê bi tavilê axa welatê min cih bihêle.”

Qasidên bîrmend ji vê şerta Keya sosret dimînin. Lê şivan şertê Keya qebûl dike. Piştî xwê dayîna pez a heft roj û heft şevan, xizmetçiyên Keya pezî ji govê berdidin. Şivan jî bilûra xwe datîne ser

lêvên xwe yên tenik û di çavê evîna xwe ya reşbelek de lêdide. Pezê ku heft roj û heft şevan xwê xwarî, şûnve vedigere. Lê belê tenê pezeke reş ku di wêjeya devkî û dengbêjî de jêre dibêjin, “Qerê” venagere. Keya li ser vî pezî dibêje, ji ber ku ew pez venegeriya şivan nekarî şertê min cih bîne. Hemû kesên bîrmend ji vê axaftina Keya dîsan sosret dimînin. Şivan ji Keya re dibêje, “dilê qerê nîne,” Bi Keya re hemû kes matmayî dimînin û dibe piste pista wan, dibêjin, ew zindiyeke bi teqez dilê wê heye. Şivan aqilê xwe xwariye. Dîsan şivan ji Keya re dibêje, “eger ku te qerê şerjê kir, dilê wê hebe, wê demê bi teqez ez ê jî dev ji evîna xwe berdim û welatê te cih bihêlim.” Keya vê pêşniyara şivan qebûl dike û qerê, peza reş şerjê dikin. Dibinin ku bi rastî dilê wê nîne.

Demhat jî weke hemû mirovên di çîrokê de şaşmayî bibûn, şaş mabû. Çavên xwe yên şîn kêmeke din mezin kirin û sîq li Çekdar meyze kir. “Lê heval hemû lawiran weke mirovan dilê wan heye.” Çekdarî bû pîqe pîqa kenê wî. “Hevalê Demhat, jetonê te neket, ew pezê reş nexweş bûye.” Demhat li hemberî Çekdar êdî ne carekê şok bibû, du caran şok bibû. Serê xwe hejand, “ya heval çawa min nederêxist. Ê Keya keça xwe da şivan?” “Heta wê derê nayê bîra min. Eger ku nedabiyê vê carê camêrtiya Keya li ku derê dimîne. Çîroka me hemû li ser bilûrê bû. Şimşal û bilûr di çanda dengbêjiya Kurdî de roleke giring dibîne. Ma te dengê bilûra Egîdê Cimo guhdar nekiriye. Awaza bilûra wî dengbêjiyê dihelîne hevalê min.”

ji aliyekê ve guhê Demhat li Çekdar bû, ji aliyê din jî çavê wî li ber dûrbînê li ser qereqola Gundikê Melê bû. Demhat dema xwest ji Çekdar re bibêje, “min awaza bilûra Egîdê Cimo guhdar nekiriye, çavên wî çûn ser komên leşkeran ku di kozikên xwe de pir belavebûn. Dûrbîn li ber çavên xwe danî û ji Çekdar re got; “hevalê Çekdar tam wextê wê ye. Divê em vê fersendê bernedin. Ka banî heval Dijwar û Kanî jî bike. Jixwe hevalên din jî cihê xwe girtine. Divê

em bi leza teyrêbaz xwe berdin ser cadê û li wan bidin. Em bi rêbazê Xeyrî ji me re gotiye çalekî nakin. Em ê weke koma êrişê xwe bikin du tîm û em ê êriş bikin. Ger ku me dît em pir ketin tengasiyê wê demê hevalê din wê bikevin êrişê. Heval divê em vê hêza operasyonê belav bikin. Ger ku îşev zerbe xwarin wê bi teqez nekarin sibê oprasyonê jî bikin. Jixwe we dît ew kozikên wan kozîkên kemînê ne. Berî ku ew me bixin kemînê divê em li wan bidin.”

Esra êvarî qulîpîbû ser şevê. Sehma reşatiya şevê ketibû erdê û tenê li esmana ronahiya stêrkan dihate xwuya kirin. Lampên derdora qereqola Gundikê Melê, bi ronahiya xwe derdor weke rojê lê kiribû. Lê ronahiya lempên qereqolê zêde nedigihişt kozikên leşkeran. Ew jî ji wan re fersendek bû. Demhat û Kanî li ser dest û çokan xwe gahandibûn ber kevir. Pir nêzî kozika leşkeran bibûn. Demhat çeka xwe hîn zêdetir nêzî xwe kir û zivirî ji Kanî re got, “Hevalê Kanî tu li ber vî kevirî parastina min bike, ez ê tenê êriş bikim. Hevalê Çekdar jî wê ji aliyê din ve êriş bike. Piştî ku te dît min kozika pêş îmha kir. Hingê tu dikarî bikevî êrişê. Jixwe sê leşker di wê kozika pêş de ne.” Demhat bi hêdîka li ser destê xwe ku wan jêre digotin meşa qazê, ber bi kozikê ve çû. Dema ku nêzî kozikê bû, dît di destê leşkerê nobetdar de fenereke ronahiya wê weke mûmekê ronî dike û hinek kaxez hene. Lê ji ber reşatiya şevê tam kişif nekir çiye. Dûrbîna şevê ji ber rextê xwe derêxist û lê meyze kir. Dît ku leşker wêneyên malbata xwe meyze dike. Dîsan dûrbîna xwe xiste nav rextê xwe û dest avêt narincoka xwe û ji xwe re got, “her çiqas dilê min ji bo te disoje jî, lê ma ji vê hedefê û zeferê tiştek din xweştir heye?” Berî ku narincoka xwe bavêje kozika leşkeran, hizrê wî dîsan çû ser axaftina Xeyrî Serhat ku jê re gotibû tu tirsonekî. Hinaseke ji dil kişand û di bin lêvan de ji xwe re wiha got; “ez ê niha nîşanî Xeyrî Efendî bikim ka ew tirsoneke yan ez!”

Dengê narincok û bomba Demhat toz û duman li ser kozika pêşî ya leşkeran rakiribû. Kêliya ku toz, duman û agir di hindirê kozikê de bilind dibû, Çekdar, Kanî û Dijwar jî êrişî kozikên din kiribûn. Şev di serê leşkeran de weke heşra qiyametê lêhatibû. Qereqola Gundikê Melê matmayî û şaşmayî bibûn. Têlên elektirîkê jî hatibûn qût kirin. Leşkerên qereqolê ji tirsên xwe de li derdora xwe ketûber gule dibarandin. Çekdar û Demhat, Kanî û Dijwarî piştî çalekiyê di hundirê çend teqeyan de, xwe dabûn quntarên binya Cudî.

Di berbanga sibe rojê de Çekdar şiyar bibû. Hema di cihê xwe de dûrbîna xwe derêxist, li derdorê xwe û cihê çalekiyê meyze kir. Dît ku elîqopter tê û diçe. Li kêleka wî jî Demhat hebû. Ew bîst deqe bû Demhat bi xew ve çûbû. Lê di xew de pix pixek pê ketibû, te digot qey ev heft sal û zemane neraza ye. Her çiqasê dilê wî pir pê şewitî jî, lê neçar bû hevalê xwe ji xew rabike. Xewa Demhat jî hinek giran bû. Dema ku bi xew ve diçû, kesek hevalên wî nedixwestin Demhat pey wan nobetdar be. Lê Çekdar rêbazê şiyar kirina Demhat baş dizanî. Rêbazê xwe ji kesekê re negotibû. Tinê di navbera wî û Demhat de ma bû. Ya rast Demhat nehiştibû ji kesekê re bibêje.

Çekdar zilikeke giyayê hişk ji erdê rakir û bire ber guhê Demhat, hêdîka bir û anî. Weke ku pişta guhê wî bixwerîne. Demhat bêyî ku xwe bilepîne çavê xwe zîq vekir, “hevalê min ez şiyar im.” Çekdar zilika xwe ji ber guhê wî rakir. “Ka rabe. Elîqopter ev du care tê cihê çalekiyê û cenazeyên xwe radikin Şirnexê. Diyare ji hesabê me zêdetir leşker hatine kuştin.” Demhat bi keyfxweşiyeke mezin hema rabû serxwe û dûrbîn ji destê Çekdar kişand û li cihê çalekiyê meyze kir. Pişre jî bi dileke germ Çekdar himêz kir û bi kenekî jixwe bawer, “de bila vê carê Xeyrî Efendî ji xwe re lotikan bavêje.”

Heval sozdar bi dilekî keyfxweşî ji Xeyrî pirs kir? “Heval we radyo guhdar kir. TRT qenala Tirka behsa gelek kuştiyên xwe dikin. Hevalê Demhat û hevalê Çekdar li hêzên operasyonê dane. Ji bo wê îro dijmin nekarîn operasyonê li ser Cudî bikin.” “Hevala Sozdar her du jî ji hev quralsiztirin. Eger ku li ser qereqolê çalekî bikirana wê hîn zêdetir encam bigirtana. Ew Demhat pir zêde li gorî xwe ye.” Sozdar bi awireke çavan a tûj li Xeyrî meyze kir, “heval hûn jî tiştekê na ecibînin. Bi teqez ji ber hêzên operasyonê nekarîne li qereqolê bidin. Ji bo vê jî  însyatîfa xwe şixulandine û li hêzên operasyonê dane. Bijî ji wan re. Divê ji aliyê rêveberiyê ve ew kom bên xelat kirin.” Xeyrî bi dengeke hêrs; “we çi got!” “Er ê heval, ew kom wê bên xelat kirin, wê ji bo hevalên qadê jî baş be. Wê ji bo hinek fermandariyên me yên mangê jî bibe mînak.”

Li ser rêya ku dihate wargeha wan, Sozdar û Xeyrî li ser Çekdar û Demhat û koma wan hîn gengeşe dikirin. Koma Demhat a çalekiyê kete wargehê. Hinek axaftinên Xeyrî ketibûn ber guhê Çekdar lê belê weke ku Çekdar tiştek nebihistiye û ji Demhat re jî negot, bi hev re bi dileke germ û bi keyfxweşî silav dan wan û derbasî wargehê bûn. Çavên Demhat di wê kêliyê de çûn ser Xeyrî. Weke ku Xeyrî ji vê çalekiyê nerazîbû, rûyê wî ew qasê qermiçî û tirş bû. Guhê Çekdar her li ser Demhat bû. Di bin çavên xwe de jî li Xeyrî meyze dikir. Ji ber ku Çekdar jî ew bê moraliya Xeyrî dîtibû.  Di rûyê Xeyrî de dihate xuya kirin ku ew ji vê çalekiyê nerazî bû. Di dilê xwe de kêmekê ji xwe re axivî, “ev zilam ji çalekiyên serketî û bê windahî her tim bê moral dibe. Ev du mehe ez li biryargehê me, lê min tiştek ji rêbazê wî dernexistiye.  Tinê ez jê gomana dikim. Jixwe di şer de jî weke qesaban e. Dema ku pîlansaziya çalekiyekê dike, bi teqez windahiyê giran biha dide. Dîsan ji bo deshilatiya xwe ji fermandariya jor re bide qebûlkirin, çi ji destê wî tê dike.

Dema ku Çekdar wisa li ser Xeyrî ev hizirandin di serê xwe de derbas dikirin, Demhat çaya wî di dest de li ber Çekdar sekinî. “Hevalê Çekdar ez mizgîniyekê bidim te.” Çekdar kêmek beşişî, “ew çi mizgîniye ku wisa tu keyfxweş kiriyî heval.” “Taxima me weke teqwiye derbasî Heftanînê dibe. Li gorî zanyariyên heyî, KDP wê li gel Tirkan li ser hêzên me yên Başur operasyonê bike. Ji bo wê hevalan taximek ji Cudî xwestine. Hevalan jî taxima me guncav dîtîne.” Demhat ji vê vesazbûnê gelekê keyfxweş bibû. Ji ber ku heta demekê wê dûrî Xeyrî biketa. Lê ew qasê jî xemgîn bû, ji ber ku wê ji hevalê xwe Çekdar qut biba.

Çekdar bi vê vesazbûna heta demekê jî be, ji bo hevalê xwe Demhat gelekê keyfxweş bibû. Bi rûyeke ken û bi dileke germ hev himêz kirin. Çekdar hêdîka di guhê Demhat de wiha got: “jibîr neke, bi raporêkê jî be divê tu li ser Xeyrî agahî bidî rêxistinê.” Dîsan bi hinaseyeke germ destê hevdû girtin û hev himêz kirin. Demhat bi zerdexaneyeke li ser lêvan dîsan Çekdar himêz kir. “Bi teqez em ê careke din hev bibînin” û xatir ji hev xwestin.



## Zivistana Sar Û Ava Hincê

Heval, reşo amadeye hinek navber bidin kar, werin çayê vexwin. Destên Çekdar pir cemidîbûn. Hema bi banîkirina hevala Kurdistanê re hate ber agirê çaya reşo(çaydan) û destên xwe germ kirin. Kurdistanê jî çaya ku xistibû qutîkên pilastîkên heşoyên bîsivingê, hema ber hevalên xwe Çekdar û Xebat Dêrik dirêj kir û banî hevalên din jî kir. "Heval ka werin, yan jî wê çayê bicemide." Çekdar qurtek çaya xwe vexwar, bi dilekî germ li ber agirê çaya reşo, ji bo çayê destxweşî li hevala xwe Kurdistanê kir. Xebat Dêrik, çavê wî her li ser agirê çaya reşo bû. Li ser tevgera dijmin û li amadekariyên perwerda zivistanê û ji bo sala nû wê çawa xwe amade bikin dihizirî. Bi dengê Çekdar ku jê re gotê: "hevalê Xebat hûnê çayeke din jî vexwin" veciniqî. Xebatî serê xwe hejand, "li ber vê sermaya Serikê Mehmedê Oso û baya ku ji keviyên berfa Kela Memê tê, ma mirov sê çar çayan nevexwe, wê çawa germ bibe." Xebat qurtek li çaya xwe da, "hevalê Çekdar zivistana Serik jî gelekê sar e. Ma hûn berê lê vê derê mane." Çekdarî kêmek din agirê çaya reşo geş kir. "Na heval, yekem zivistana min e." "Hevalê Çekdar, ev cihê ku em lêne dibe aliyê rastê yê Kela Memê û Serikê Mehmedê Oso. Li gorî gotinên xelk dibêjin; "Serikê Mehmedê Oso navê reyîsê eşîretekê ye. Bi demê re êdî dibêjin Serik."

"Wê rojê dema ku min xwe ji deriye Qaçê berda ez ê bihatama Besta. Min di rêya xwe de şivanek dît. Temenê şivanî hema bêje nêzî heftê salî hebû. Li gel neviyê xwe hatibû ber pez. Wî şivanî jî digot, em jî ji eşîra Serikin. Ji me re qala serpêhatiya Mîreke Herekolê jî kir.

Mîrekî Herelokê dibêje, "Kî bi tena serê xwe karibe zivistanêkê li Herekolê derbas bike, ez ê keça xwe bidim wî." Her sal kesek, an jî çend kes dikevin nav pêşbirkê, hewildidin ku vî mercî pêkbînin. Lê belê yên li hêviya wan kesên ku payîzê diçin Herekolê dimînin û wan

çavdêrî dikin, biharê nabin şahidê vegera tu kesî. Lê belê cardin nikarin dev ji pêşbirka xeyalên xwe yên riya gihiştina cihên herî jor berdin. Ji bo wê jî gelek Egîd winda dibin û diçin.

Di wan kêliyên ku hêvî windabûyîn de, yek ji wan kesan di biharê de vedigere. Di wê bihara ku digotin, “Misoger ew jî miriye” de derdikeve û tê. Hemû kes matmayî û şaş dimînin. Devê her kesê vekirî dimînin! Ji hev re dibêjin, “Çawa dibe! Yên herî Egîd nekarîn ji lûtkeyên Herekolê vegerên, lê ev ê gêjik û sistik çawa dibe vegeriya û nemiriye.” Lê belê di demekî kurt de hertişt hatibû fêmkirin...

Zivistanên Herekolê hem gelekî sar in, hem jî ba û bahoza wê hişk û dijwar e. Dengê bayê, gumîniya ku bahozê derdixist, ji zebaniyên dojehê tirsnaktirbûn. Yên ku hewildidan zivistanê bi tena serê xwe li Herekolê derbasbikin, ji ber van dengên tirsnak ên cûrbecûr, ziravên wan qetiyabûn û miribûn. Sermaya Herekolê li gel van dengên tirsnak netiştek bû. Ya ku ew tirs ji wî kesî dabû derbaskirin wêrekî nebû; ya ku ev serkeftina bîrawer yan jî nejibîr (unutulmaz) dabû qezenckirin, kerbûna wî kesî bû, ango wî kesî deng nedibîhistin.” Hîn gotina kerbûnê di devê Xebat de xilas nebibû, hevalên ku li ber agir çaya reşo vedixwarin, bi hev re bû piqe piqa kenê wan. Bi hev re û bi dengê bilind ji hev re gotin, “divê em jî xwe ker bikin, ji bo em bikarin bibin zavayê Mîrê Botanê.”

Çekdar di destê wî de talîmatê Serokatiyê, xwe li ser amade dikir ku di perwerdê de bixwîne. Li ber soba daran rabû hate ber deriye mangê. Hinekê jî ji xwe re hewaya sar meyze kir û di dilê xwe de derbas kir ‘îsal zivistan her ku diçe sar dibe û dijwar dibe. Berfa ku li erdêye her roj berfek din jî li ser zêde dibe. Berf heta çokên me zêdetir hatiye.’ Di jêra wargeha wan de jî newala geliyê Hêzil a ku di bin keviyên berfê de dengê wê dihat, guhdar dikir û darên berûyê yên ku di bin quntar û beravên Serikê Mehmedê Oso de li ser berfê

reş û cemidî li pêşberî wî weke nokteyeke reş diyar dibûn. Çekdar çend kêliyan li wan daran nêrî û hişê wî çû ser bihara finalê ku Serokatiya Partiyê di talimat û dahûrandinên îsal de bi tektîkên nû behsê kiribû.

Li seata xwe nêrî, ji xwe re got, “hîn ji perwerdê re deh xulek maye. Xwe zivirand ku pêlava xwe ya qîr û reş bêxe lingê xwe û biçe dibistanê. Dît ku li şûna pêlava wî pêlava hevalê Goran ku reqema lingê hevalê Goran 44 nimare bû, hevalê mangê jê re cih hiştibûn. Êdî neçar bû destê xwe dirêjî pêlavê kir, “ya ev hevalên jin hene, cihê dibistanê nebese, dema ku tên manga me jî pêlava min tevlî hev dikin û dibin. Ev hemû teşqeletiya hevala Kurdistan û hevala Newrozê ye.” Pişre jî hizirî “gelo hevalê Goran çi li berkiriye?”

“Çi bûye hevalê Çekdar?” “Tiştek nebûye hevalê Xebat.” “Belê belê tiştek bûye. Vê sibeha roja xweş zêde keyfa te nîne. Ew çi pêlava mezine di lingê we de?” Hîn ku Çekdar xwest ji Xebat re bibêje dîsan hevalê jin pêlava min birîne, dengê pîqe pîqa kenê manga hevalên jin di kêleka dibistanê de hate guhê Çekdar. Xebat jî weke hevalê jin hîn zêdetir pêlava Çekdar meyze dikir û dikeniya. “Ya hevalê Çekdar ma em çi bikin lingê te jî weke yê hevalên jin biçûk e. Dema ku me biharê ji hevalê jin re pêlavên 37 xwest, divê em hesabê te jî bikin.” Xebat ew qas dikeniya, dengê kenê wî li ber baya siberojê bilind dibû û dikete qelîştokên Herekolê olan dida. Çekdar çavê xwe bi ser Kurdistanê de gerand, dît ku pêlava wî di lingê Kurdistanê de ye. Rûyê wî ji serma hinekê sor bibû. Xwe nêzî Kurdistanê kir û di guhê wê de wiha got, “te dîsan pêlava min li berkiriye, eger ku min tu û hevala Newroz di perwerdê de nerakirin bila ez jî ne Çekdar bim. Ka zû bikevin dibistanê em ê talîmata Serokatiya Partiyê bixwînin.”

Kurdistanê cihê nobetdariyê li binê dara mazî rûniştiye û temaşeyî bihara Bestaya belek dikir. Heta ji dilê wê tê bêhna bihara Besta dikişine hinav û dilên xwe. Di hizrê wê de jî li ser Bestayê ev gotin derbas dibin. “Gul û kulîlkên biharê, hemû cihên Besta xemilandine. Bi bedewbûna xwe ve mîna bihuştekê ye. Ji vê bedewbûna xwe ya xweş ve bêguman giyayê xwarinê jî lê kêm nabe. Dengên çûk û teyran jî di nava vê bihuşta xweş de bilind dibe. Bi dehan çûk bi hev re ewaz dixwînin. Li hinek cihan dengên xwûrîniya kewan jî di nav teht û latan de bilind dibe. A niha ev cihê ku em lêne bi serê çend metreyan kaniyeke ava biharê diteqê û li hemberî min bi xuşe xuş diherike. Jixwe gelek kanî li mêrgên Bestayê hene. Bi mîlyonan darê mazî û yên berû jî lê hene. Dema ku mirov li ser Serê Pîro, Kor Qendîl, Herekol, Qeplanê û Şehrîbana Mehrîwan li temaşeyî Bestayê dike, ew keskahiya Bestayê mîna zeryayeke kesk xwuya dike. Mirov qet û qet ji wê bedewbûnê têr nabe.”

Dema ku Kurdistanê ev xweşiya Bestayê li cihê nobetdariyê di serê xwe de derbas dikir, bi tavilê hevalên ku çûbûn gir girtibûn, ji wan hevala hevalekê agahiyeke lezgîn înandibû. Ew hevalê ew agahiya lezgîn înandibû dema ku gihişte hinda hevala Kurdistanê, berî ku bibêje merheba heval Kurdistan, hema bi hilehila henaseya xwe ve “heval, hevala Kurdistan dijmin, ji milê Çêlên Nimêjan, Şehrîban, Çinarok û Rîsor ve tevgera dijmin heye. Divê hûn bi lezgînî xeberê bidin hevalê Xebat û hevalan.” Kurdistanê pora xwe ya dirêj kiribû kezî, li ber keziyên pora wê de jî piskên pora wê hebûn. Li ber baya ku ji nava çiyayê Herekolê dihat biskên porê wê jî dihejiyan. Hêdîka pora xwe li ber kêleka mile xwe rakir û ji aliyê pişta xwe ve avêt. Bi zerdexeneke xwînsar li wî hevalî nêrî û bi dileke germ silav dayê. “Heval ka were kêmek vê avê vexwe û henase bigre. Heta ku ez jî agahî didim hevalan.”

"Hevalê Çekdar ka zû hûn hevalên rêveberî kom bibin. Divê em bi tavilê pîlansaziyekê çêbikin û kom bi kom belav bibin. Li gorî agahiyên hevalên ku li gir digrin dane me, dijmin ji aliyê Çêlên Nimêjan, Şehrîban, Çinarok û Rîsor ve bi tevger e." Xebatî di civînê de destê xwe bir û înand û hizrê wî çûn ser talîmatê fermadariya Botanê. Jixwe fermadariyê ji wan re gotibû, "divê di operasyonên berfireh de, li gorî perspektîfên Serokatiya Partiyê ku di kongira pêncemîn dabûn, bên tevgerandin." "Hevalno dibe ku sibê bi berbanga rojê re dijmin ji aliyê Heştanê ve û ji aliyê Sêgirk û Hêzilê ve bên operesyonê. Ji bo wê divê em Bestayê vala bikin." Hîn Xebat Dêrik gotina xwe temam nekiribû, çavê hemû hevalên di civînê de şaş man. Lê çavên Kurdistanê hîn zêdetir zîq û bi ecêpmayi man ser hevalê Xebat. Kurdistanê hema berê xwe zivirand, "nabe hevalê Xebat em ê çawa Bestayê ji dijmin re bihêlin."

Xebat dît ku hemû kes bi şaşmayî lê meyze dikin, hema hîn zêdetir bi dengê fermandareke bi heybet dengê xwe bilind kir, "heval ka baş me guhdar bikin. Hûn dizanin me ji zivistanê ve li ser perspektîfên Serokatî ku di kongra pêncemîn de li ser tevgera gerîla ku wê çawa li Botanê dijmin bikişîne erazî û lê bide perwerde dît û me nîqaş kir. Em ê li hemberî vê operesyona ku ji her alîve amadekariyê xwe kiriye ku dixwaze zerbeyên mezin li me bidin bi rêbazê şerê gerîla qadên xwe bihêlin û pişre jî bi komên biçûk em ê wan bixapînin û li ser wan çalekiyên surprîz bikin." Piştî gotinên Xebat deng ji kesê nehat.

Piştî tevgera operasyona dewleta dagirker, ew neçar bûn ku wargehên xwe li cîh xwe hiştin û ber bi qada Garisa û Kela Memê ve çûn. Bi komên biçûk li pişt dijmin zivirîn û li ser hêza operasyonên dijmin çalekiyên bi bandor pêkanîn. Nêzî deh hevalên wan jî, ji bo dijmin şaşomaşo bike, di nava Bestayê de bi rêbazên gerîla li ser dijmin çalakî pêşdixistin û bi vî rengî ev şer nêzî çend rojan

berdewam kir. Dijmin bi windehayike giran û bê ku encamên mezin dest bigire operosyona xwe paşvekişand.

“Dê heval ka xwe amade bikin, em ê bikevin rê. Hevalê ku dizanin, di demsalên biharê de ava Hincê gelek radibe û pêlên wê jî gelek dijwar dibin. Berî heftiyekê dema ku em hatin Kela Memê av wisa boş nebû, ne wisa hevalê Çekdar?” “Raste hevala Kurdistan wisa boş nebû. Divê her heval li gorî telîmatan tevbigerên. Kes bi serê xwe li avê nedin û nebêjin em şêr û şêre jinin, dikarin derbasî wî aliyê avê bibin. Hevalê Hemze, ka bila ejmar hevala bê.” “Hevalê Çekdar bi min ve bist.” “Êdî kes xwe şûnve nehêlin. Hevala Berîvan ka zû biçe pêş, ji hevalê Serkeft re bibêje bila li gorî tempoyê hevalan bimeşe. Ji bo ku heval pir ji hev qut nebin.”

“Hevala Kurdistan em ê di berbanga rojê de bigihîn gundê we yê xweş Hîlala Zêrîn. Em sibê xwe di quntarê gunde de veşêrin û îsrehet bikin, êvarî jî em li ava Hicê bidin û derbasî Bestayê û ji Bestayê jî derbasî Garisa bibin. Hûn çi dibêjin? Ma wisa neguncavtire.” “Yê wisa hîn baştir be hevalê Çekdar. Heval jî wê hem bêhna xwe vekin û hem jî em ê hîn berî esrê bikarin xwe li ser ava Hincê derbas bikin.” “Hevala Kurdistan em niha tam beramberî Kela Memê ne. Ka vê çîroka Kela Memê ji me re bibeje ku em ji destê te xilas bibin. Ev saleke her tu behsa çîroka Kela Memê dikî, lê heta niha jî te ji me re negotiye.”

Kurdistan vê carê ji destê Çekdar negengaz bû xilas bibe. Hemû hevalên taxima wan li ber agirên xwe rûniştin, weke zarokan guhê xwe dan ser çîroka Kela Memê. “Heval ez ji we re bibêjim: silsila Kela Memê ji Beytuşebabê dest pê dike, heta qadeke dirêj digire ber xwe. Heta noqta me ya Serikê Mehmedê Oso diçe. Li gorî hinekan dibêjin bilindbûna wê 40000 metre ye. Kevir û tehtên wê jî pir tûjik in. Jixwe sermaya wê weke kêra li rûyê mirovan dide. Heta havînê jî berfa wê naqede û bi heybeta xwe ve weke împeretorekê

ye û xweşiya biharên wê jî nayê pênase kirin. Bi sedan gul û çîçek vedibin. Jixwe pincarê wê nayê behs kirin. Ew qasê pirin, nayên jimartin.” Kurdistanê tarîfa xweşiya Kela Memê kir û nedikir nedixwest xilas bike. Hevala Newroz hema bi nişka ve xwe negirt û ji Kurdistanê re got, “hevala Kurdistan, wile em dizanin Kela Memê beheşta Kurdistanê ye. Êdî vê çîrokê ji me re bibêje, wile em teqiyan.” Hevalên di jî bi hev re tevlî hevala Newrozê bûn.

Kurdistanê careke din serê xwe ji ber xwe rakir û li Kela Memê nêrî û pîçek ji baya wê ya hênik kişande hinavê xwe û dest bi çîroka xwe kir. “Ê heval em li ku ma bûn.” Çekdar jî hema xwe negirt, “hevala Kurdistan ma te hîn dest pê nekiriye.” “Belê heval min hîn dest pê nekiriye. Lê hinek hikayet hene rastiya destanên dîroka Kurdistanê tînin ziman. Ji bo wê dîroka me jî bi êşe heta ku mirov tîne zimên pir zehmetiyan dikîşine.

Kêla Memê jî yek ji van çîrokan e. Pîrika min digot: “hebû nebû, wî zemanî şivanek bi navê Kêla Memê hebû. Ew şivanî navê xwe Mem bû, ji bedewbûna wî keçikan li ser şer dikirin û gelek jîr û zîrek jî bû. Di heman demê de jî nêçîrvaneke gelek xurt bû. Ji deh saliya xwe ve dest bi şivantiyê dike û ew qas zîrek bûye, nehiştiye yek pezê wî jî gurg bixwin. Pezê xwe jî di zozanên herî xweş yê silsila Katoyan de daye çêrandin. Giyayê herî xweş daye pezê xwe. Pezê xwe ger ku ser giyayekê re bibiriya, careke din li ser wî giyayî nediziviri û pezê xwe nediçêrand. Ji bo wê dema ku pezê wî diza cêwî tanîn. Ger ku pezê xelkê yek berhemê xwe hebûya, pezê Memê deh qatî berhemê xwe diafirand. Navê Memê ji her alî ve nav û deng bibû. Ew jî êdî weke xelkê bibû xwedî keriyê pezê mezin. Dîsa bibû mêrxwaseke mezin û neheqî ne li ser xwe ne jî li ser gundiyan qebûl nedikir. Dema ku tê bîst saliya xwe dibe evîndarê keça axayê ku jê re şivantî dikir.

Hinek Beko Awanan xeberê didin axa û dibêjin; şivanê te bûye evîndarê keça te. Axa dîn dibe. Bi tavilê banî çil zilamên xwe dike û fermanê dide wan Memê bi zincîran bigrin û lê îskence bikin. Mem digrin û îskence dikin. Axa dest datîne ser hemû pezê wî û şivantiya wî jî ji dest digrin. Lê zincîr û qeydên axa têra girêdana Mem nakin.

Hêza Mem xurt e, zincîr û qeydên axa dişkîne û xwe ji destê wan zilaman xilas dike. Vêca heval, li gorî pîrka min digot, Mem xwe digihîne wan girên han yên tûjik li pêşiya me diyar dikin. Yanî xwe digihîne Kêla Memê.

Dema ku Mem şivantî dikir, ticar kopalê şivantiyê kar naîne. Her tim di destê wî de bilora wî hebûye. Dema ku digihêje wan tehtikên tûjik yên Kêla Memê, di jêr xwe de dinêre keriyê pezê wî diyar dibe. Bi bilora xwe banî evîndar û pezê xwe dike. Evîndar û pezê wî tên digihênê. Mem li gel evîndar û pezê xwe heta demekê di nav asê bûna tehtên Kelê de xwe diveşêrin û bi hev re şa dibin. Neyarên Memê heta demekê nikarin wan bigrin. Lê sedcaran mixabin Memê hesaba serma û berfa Kêla Memê nekiribû. Heta ku zilamên axa wan dibînin, Memê û evîndara xwe, li gel keriyê pez ji sermayan de hişk dibin. Ji wê roje ve ji wan tehtê he yên ku li hev meyze dikin re dibêjin, yek Memê û ya din jî evîndara wî ye. Tehtên ku li dora wî ne jî keriyê pezê wî ne. Disa ji wê rojê ve navê vî çiyayî bûye Kêla Memê."

"Te xewa me înan hevala Kurdistan. Dema ku pîrika min ji min re çîrok digot, ez tim bi xew de diçim." Kurdistanê li hemberî axavtinên Diyar xwe negirt, "ji bo wê tu heta niha gêj mayî." Lê Diyar nekete ferqa gotinên xwe. Çekdar hema baya bezê bêyî ku Diyar gotinekî din zêde bike, "çîroka te pir xweş bû hevala Kurdistan. Min heta niha dizanî navê Kêla Memê ji destana Mem û Zînê hatiye girtin." Dibe wisa jî be hevalê Çekdar. Ji ber ku silsila Kêlê dirêje. Lê belê di rastiyê de tiştên wisa hatine jiyîn. Ji bo wê gelê vê derê li ser vê çîrokê dibêjin "Kêla Memê." Mem jî di çîrokên Botanê de li hemberî zilimkaran mêrxwaseke."

Çekdar bi rûkenî "heval ka werîn vê derê, min cihek peyda kir ku em avê derbas bikin. Em ê xwe bi ser vî kevirî de bavêjîn wî milê avê." "Hevalê Çekdar ez bawer nakim hemû heval bikarin xwe ser vî kevirî bavêjin." "Hevalê Hemze tu li vî aliyê kevir be, ez ê jî li wî aliyê

din yê kevir bim. Em ê destê hevala bigrin, wisa yek bi yek derbas bikin. Hevalên ku derbas dibin bê tirs û hinek jî xwînsar bin û bila li avê nenêrin." Serkeftî hema zîrekî û jîrbûna xwe nişanî her kesê da, xwe li ser kevir avêt û firda çû wî aliyê avê. Hemû hevalê wî jê re çepik lêdan. Çekdar li ser pesnê Serkeft got, "bila hemû heval weke Serkeft zîrek bin û xwe bavêjin." Êdî hevalên ku derbas dibûn bi hirsa ku ez jî weke Serkeft zîrek im xwe li ser kevir davetin wî aliyê avê.

Piranî hevalên wan derbas bibûn. Lê Kurdistan û Berîtan, Çekdar û Hemze mabûn. Ji ber ku Kurdistan li ser tîma hevalê jin bû, divê hemû hevalên xwe derbas bikiriya pişre ew derbas bibûya. Berîtan gelek ji avê ditirsiya. Gavek pêşde davêt lê gavek jî li paşde dihat. Taxim bi giştî ji aliyê Besta ava Hincê ve li Bêrîtanê temaşe dikirin. Dizanîn gelek ji avê ditirse. Her çiqasê Çekdar di nava hewldanekê de bû ku Berîtan tirsa xwe derbas bike, lê Berîtan her ku gava tavête ser kevir gaveke din paşde davêt û derbas nedibû. Ava Hincê hemû bibû tirs û ketibû nava dilê Berîtanê. Xuşe xuşa ava Hincê di guhê Berîtanê de dengeke wisa dida ku dengê hevalên xwe jî nedibihîst. Heta Çekdar destê xwe dirêjî Berîtanê kir. Berîtan berî ku destê Çekdar bigre niqotî avê bû.

Ava Hincê li gel Bêrîtanê dîsa herikî, lê hevalên wan bi ketina Berîtan ya avê hemû bi dileke xemgîn şaş mabûn. Di kêliyê de Berîtan li ber çavê hevalên xwe hemûyan ketibû avê û di nav pêlên avê de hewar û qîrîniya Bêrîtanê digihişt ber erşê esmanan. Çekdar bêyî ku xwe şaşû maşû bike, bi melevaniyeke xiza masiyan xwe gehandibû Berîtanê. Hema nav tenga Bêrîtanê girt û hat ber qurmeke darê sekinî û xwe li darê girt. Hîn Kurdistanê dixwest xwe bavêje avê, lê heta Kurdistan ketibû tevgerê, Çekdar Berîtan ji avê xilas jî kiribû.

## Agahiya Şehadetekî Bi Êş Û Xemgîn Tola Hevaletiya Mezin Dixwaze

Dema ku ez li ser rêya Gabarê bûm min xebera şehadeta hevalê Egîd Emûdê bihîst. Dilê min hate guvaştin û janeke mezin kete dilê min. Çokên lingê min li gel min nedimeşiyan. Rondikên çavên min zûwa dihatin xwarê. Hemû giyanê min, ji guştê serê min heta guştê neynûkên lingê min hemû di nava tevzînokê de diêşiyan. Lê ez dimeşiyam. Lê ez çawa dimeşiyam min haj xwe nebû. Hemû dîmen û wêneyên heval Egîd li ber çavê min weke şerîteke filîmê diçûn û dihatin. Car hebû ez di rê de diketim û destê min tejî sitiriyên guniyan dibûn lê disan min haj xwe nebûm û ez li gel heval Egîd di meşeke dirêj de bûm. Di meşê de hevalên ku li gel min ji qada Cudî hatibûn, ji vê bandorbûna min matmayî mabûn. Hevalê Nîdal û hevalên din gelek xwestin li ber dilê min bidin, lê dîsan min haj xwe nebûm.

Di giyanê min de êşeke mezin û birîneke mezin hatibû vekirin. Dilê min pir hatibû êşandin. Bêgoman şehadetên hemû hevalan ji bo me giran in. Lê cihê heval Egîd Emudê li gel min cuda bû. Di çanda heval Egîd ya civakî de ehlaq û vijdan gelek li pêş bû. Ticar ji aliyên cuda ve ji bo xwe tawîzeke biçûk jî nedida. Ehlaqê xwe yê civakî li gel rista felsefa Apocîtî hîn zêdetir rêxistin kiribû û bi hêztir kiribû. Ji bo wê te digot, "ev mirov ji dayîkbûye, hema bûye Apocî." Kesayetiya wî ya resteqînî, avaniya zihnî, şêwaza fikirandina wî û her wiha di sekna wî de giyanê PKK'ê hatibû avakirin. Wî xwe di hevîrê Apocîtiya rasteqînî de stirayî bû. Çi karên mezin û biçûk bikiriya bi teqez vijdanî dikir û serdixist. Ji bo wê şehadeta rêheval Egîd ji bo partiya me û gelê me êşek û windahiyeke mezin bû.

Çekdar di navbera meşa ber bi Gabarê de, li ser kaniya ku bêhna mendik, pûng û tûzikê jê dihat, dest û rûyê xwe şûşt û heta jêhat bêhna pûngê kişande nava hinavê xwe. Pişre jî di dawiya lênûsa xwe de ji bo hevalê xwe Egîd Emûdê nivîsa xwe wisa bi dawî kir. “Hevalê min yê hêja û bedew, em ê her dem te bi hêza azadiyê û serfiraziyê bibîr bînin. Em ê tola te li erdê nehêlin. Em ê ew destê neyaran û xiyanetçiyan dirêjî te bûne bişkînin, em ê nehêlên di jiyanê de keyfxweş bibin û her wiha bijîn. Em ê te bi hemû xweşikbûna Kurdistanê û Botanê her tim bibîr bînin. Em ser giyanê te yê Apocîtî soz didin ku wê tola te bi teqez bê rakirin.” Lê tinê tiştek jibîra Çekdar nediçû, gotinên heval Egîd ku jêre gotibû, “ger ku rojek hat we Serokatî dît, ji bo min bi nepenî be jî pir himêz bikin. Ji ber ku me heq nekiriye ku em ducaran Serokatî himêz bikin. Ji bo ku mirov ducaran Serokatî himêz bike, divê mirov zeferê û serkeftinên mezin û teqez dest bêxe.” Ev gotinên heval Egîd qet jibîra Çekdar nediçûn.

Dema ku Çekdar dixwest lênûsa xwe bêxe çentê xwe, hevalê wan ê qurye banî kir, “hevalno! heval dikarin çend seatan bêhna xwe vekin. Pişre em ê keşfa rê baş bikin û wisa bikevin tevgera meşê.” Ji vê agahiya hevalê wan ê qurye hemû heval keyfxweş bûn û hema zû reşo danibûn ser agir. Leşker hinek xemgîn diyar dibû. Çekdar di hizrên xwe de got, “gelo ma wî jî şehadeta heval Egîd bîhistiye. Ji ber ku tevlîbûnên me yên 1994’an piranî hevalê Egîd rêxistin kiribûn.” Niha di vê komê de ez û hevalê Leşker şervanên heval Egîd in. Hema di wê kêliyê de hişê wî çû ser axaftinên milîsê wan hevalê Xebat yê ku agahiya wî li ser şehadeta heval Egîd hebû.

Hevalê Egîd bi bêbextiyekî xayînane hatibû Şehîd xistin. Ew Cîhanekî Teyî hebû. Piştî ku ew xayîntî dike, dewlet heta demekê ji

bo bibe xayîneke mezin li gel xwe dihêle. Ev xayîn jî tiştê ku li ser tevgera hevalê Egîd, li Silopya û Cizîrê çi dizane hemûyan ji dewletê re dibêje. Dewlet bi hevkariya malbata wî û mamên wî yên nêz, bi rêya erzak kemînê datînin pêşiya heval Egîd û heval Şakîr. Şereke dijwar rû dide. Xayînên malabata Kamo, li gel leşkeran ji heval Egîd û heval Şakir re dibêjin teslîm bibin, ev dawiya we ye. Heval Egîd jî bersiva wan dide û dibêje, “yên weke we xayîn û bêşeref teslîmî bêrûmetiyê û bêşereftiyê dibin. Hûn bizanin, sûcê xayîntiyê ti car nayê jibîr kirin. Hûn biçin esmanan jî hûn ê berdîlê xayîntiya xwe bidin.” Heta dawiyê şer dikin. Wisa tevlî karwanên şehîdan dibin.”

Berbanga rojê ji Rojhilat hilhatibû. Şevê cihê xwe ji rojê re hiştibû. Dengê guleyên tangên Tirkan û hevkarên wan berdewam bû. Serê Çekdar li ser lingê hevalê wî Celal bû. Bi bîranîn xwe û hevalê xwe Celal hinekê êşa birînên xwe jibîr kiribû, kêmek be jî xew kiribû. Lê bi zorî hilma xwe dida distand. Dîsa ji hevalê xwe Celal av xwest. Lê hevalê Celal bi “ez gorî û bi qûrban” serî wî û destê wî maç dikir û jê re digot, “ma tu nizanî ji birîndaran re av nabe.” Kêliyên ku hevalê wî Celal pê re henek dikir û dixwest ber dilê wî bide, hilm û nefesa Çekdar qut bibû û rihê wî yê paqij ji bedena wî derketibû  bi axa wî ya pîroz re bibû yek û tevlî karwanê şehîdan bûbû. Destê Çekdar di destê hevalê wî Celal de cemidî mabû. Hevalê Celal xwest bi bistika çeka xwe gora hevalê xwe çêbike. Lê mala felekê di serê xayînan de xira bibe. Wî di wê kêliyê de bi teqîneke mezin a bêbext de xwe di nava gola xwînê de dîtibû. Û li kêleka hevalê xwe Çekdar, giyanê xwe bi vê siberoja xemgîn bexş kiribû.



“Gelê me dibêje, li şûna em weke koleyan bijîn, di kolanên Cizîrê de wek şervanên azadiyê em bimirin, şehîd bikevin ji bo me rûmet e. Lewma baweriya min bi şoreşa Cizîrê bêdawî ye.”

**Mehmet Tunç**

## Ew Giyanê Gabar Bû

Gabar, weke ku Şehîd Xelîl Dax jî dibêje, "Ger ku we, ew çiyayê bi keskayî ve hatiye xemilandin û ew erdnîgariya wê ya ku bost bi bost hatiye neqişandin ne dîtibe, we li vê cîhanê pir tişt nedîtiye." Bi rastî jî wisa ye… Gabar di nava çiyayên Kurdistanê de ciheke rengîn e. Tu dibêjî qey kevirên wê yên nexşînî ku temsîla her mirovekê dike, ji aliyê xwedawend û xwedayan ve ji bo mirovên wê derê hatine diyarî kirin. Jixwe ew mirovên ku li ber van kevir û erdnîgariyê de ked dayîne hemû xwedawend û bîrmend bûne. Dîsa ji vê erdnîgariyê tê diyar kirin ku mirovên wê xwedî hêzeke kedê bûne. Dîsa tê diyar kirin ku vê erdnîgariyê malûvanî ji gelek qehremanên Kurdan kiriye. Kevir, dar, şkeftên wê ji gelek lehengên Kurdan re himêza xwe vekirine. Ew, her tim ji bo lehengî û egîdiya Kurdan bûye mertal.

Dema Çiyayê Gabarê tê gotin, di hişê her Kurdekê de rêheval Egîd zindî dibe. Ji ber ku dengê awaza guleya wî dinya hejand û Kurd ji xewê hişyar kirin. Awaza vî dengî weke ku dinya hejandî be, li ser vê erdnîgariya Gabarê jî gelek leheng û mêrxwas da afirandin. Ji wan mêrxwasan ji wan hinek ev in: Heval Erdal, heval Adil, Apê His û heval Çekdar. Her weke din gelek hevalên ku em navê wan nizanin li ser vê erdnîgariyê bûne gul û kulîlk û bêhna xwe dayîne her deverê. Li her bostek erdnîgariya vî çiyayî bêhna wan hevalan jê tê.

Min li vî Çiyayê xweş û pîroz heval Çekdar nas kir. Di pêvajoya 1999'an de em bi hev re li Gabarê bûn. Piştî Kongreya 6. ji aliyê Rêbertî ve talimat hatibû ku Gabar bikeve ser Mêrdînê. Jixwe tê zanîn Gabar berê li ser Botanê bû. Em weke hêzê Mêrdînê li Gabarê disekinîn. Di wê demê de hevalên ku em bi hev re diman, Ş. Erdal, heval Hûseyîn, Ş. Çekdar û hevalê Hekî bûn. Ş. Çekdar jî cihê xwe di rêveberiya eyaletê de digirt, di heman demê de jî Fermandarê Biryargeha Gabarê bû. Herî zêde di wê demê de ez û heval Çekdar bi

hev re man. Pêvajoya sala 1999'an pêvajoyeke pir giran û pir zor bû. Plangeriya navnetewî ya ku li ser Rêbertiya me hatibû pêk anîn. Dijmin di wê plangeriyê de dixwest gerîla bê hêz bike û carek din Kurdan bêhêvî bike. Dîsa tevgera gelê Kurd a azadîxwaz ji holê bide rakirin û tasfiye bike. Êrîşên dijmin ên bê navber li ser hêza me ya Bakur, Botan, Amed û hwd. berdewam bûn. Jixwe êrîşa herî mezin jî li ser Rêber Apo berdewam dikir.

Rêber Apo plangeriya di şexsê wî de li ser Kurdan hatibû pêk anîn, bi pêş dîtinên xwe ve pir baş dahûrandibû. Li ser vê bingehê bi stratejiyeke nû di pergala me ya rêxistinî de guhurandinên bingehîn dabû avakirin. Bi vê pêngavê re hem têkoşîna me mayînde kir, hem jî êrîşên dijmin û komplo heta radeyekî vala derêxist. Rêber Apo li ser du armancên bingehîn pêvajo dabû dest pê kirin. Em jî di pêvajoyeke wisa de li Botanê bûn.

Gabar her çiqas bi Mêrdînê ve girêdayî bû jî lê weke qada Mêrdînê em li ser Botanê bûn. Jixwe me weke du eyaletan bi nav dikirin; Eyaleta Botanê û Eyaleta Mêrdînê. Di wê pêvajoyê de dijmin bi ser van herdu eyaletan de pir dijwarî dihat, dixwest hêzên gerîla û hêza rêxistina me bifetisîne. Heta pir dijwarî erdnîgariya Kurdistanê wêran û talan dikir. Ji bo êrîşên dijmin vala bên derêxistin, erkekî girîng diket ser milê herdu eyaletan. Heval Çekdar jî di nav wan erkan de xwedî mîsyoneke teybet bû. Jixwe li qadên weke Mawa, Mêrdîn û Gabarê bi mîsyona rêveberiyê cihê xwe digirt. Di wê demê de jî nû ji qada Rêbertiyê hatibû. Xwedî erk û mîsyonên girîng bû. Temenê wî biçûk bû, lê gelek jêhatî û jîr bû. Bi coş û moraleke mezin tevlî jiyanê dibû. Dîsa xwedî îddîa û biryarekî mezin tevlî pêvajoyê dibû. Di her civînên me yên li ser mijara şer û taktîk de jî xwedî nêrînên cihêreng bû. Ji bo taktîkên şer, jiyana rêxistinî û nirxên hevaletî ji aliyê menewî û madî ve bê xurtkirin xwe gelek berpirsiyar

didît. Li ser her têgîna rêxistinî û jiyanî nêrînê wî yên dewlemend hebûn. Li himberî êrîşên dijmin di xeta Gabarê de divê em çi bikin, xwedî nêrîn bû. Êrîşên dijmin ên ku li ser xetê dihatin pêşxistin bi wêrekiya xwe û bi jîrbûna xwe ve vala derdixist. Jixwe ji her alî ve diyar bû ku li qada Rêber Apo lêhûrbûnek û dahûrandineke girîng dabû çêkirin. Hem xwe ji aliyê bîrdozî ve û hem jî ji aliyê taktîk û fermandariyê ve pêş xistî bû. Bi wan teybetmendiyên xwe ve wî her tim bal dikişand ser kesayetiya xwe. Yekî pir sempatîk jî bû.  Ji aliyê hevalên eyalete ve jî pir dihat hezkirin.

Tevlîbûna wî ya ji jiyanê re bi giştî bû. Wî ti caran xwe bi mijarekê ve sînordar nedikir. Hem ji aliyê felsefî ve, hem jî ji aliyê perwerdehiyê ve xwedî lêgerînên mezin bû. Mînak, dema ku ji çalakiyê dihat, piştî seatek an jî du seat bêhnvedanê hemû hevalên qadê kom dikir û li ser giştîname û dahûrandinên Rêber Apo perwerde dida hevalan. Pir girîngî dida giştîname (talimat) û perspektîfên Rêber Apo. Perspektîf, giştîname û dahûrandinên Rêber Apo ji bo xwe girîng didîtin. Weke farmanekî jî nêz dibû. Wî kesayetiya xwe ji aliyê bîrdozî û rêxistinî ve perwerde dikir. Û dixwest kesayetiya xwe ji aliyê leşkerî û fermandariya taktîkî ve nûjen bike. Dîsa wî di jiyanê de jî şêwazê fermandariya klasîk ji bo xwe qebûl nedikir. Li hemberî wê jî têkoşîn dikir. Pênaseya Rêbertî ya ku digot; “kesayetiyên fermandar bi giştî ne û ji her alî ve pêşeng in” ji bo xwe girîng didît. Di çalakiyên ku di qadê de dihatin pêşxistin de jî her carê bi rêbazên cuda, ji bo ku em bikaribin hîn baştir darbeyekê li dijmin bixin, bi taktîkên nû diçû ser dijmin. Şêwazê wî yê şerkirinê ji aliyê her hevalên qadê ve gelek dihat pejirandin û hez kirin. Dema ku me bi hevalên xwe re plansaziya çalakiyê çêdikir, her heval dixwast li gel hevalê Çekdar biçe çalakiyê. Wî û heval Erdal di yek rêveberiyê de cihê xwe digirtin. Jixwe şêwazê wan yê jiyan û çalakiyê mîna hev bû. Pir caran me digot, ew herdu cêwî ne. Bi rastî

kesayetiyên wan pir weke hev bûn. Û wan ji hev jî hez dikirin. Pir caran diyar nebû ku ev heval di nav hevalan de rêveberin. Ew qas bi jiyanê ve û bi hevalan ve dibûn yek. Herdu heval jî ji bo hevalan dibûn hêz, bawerî û hêvî. Şehadeta heval Erdal û heval Çekdar ji bo rêxistinê windahiyên pir mezin bûn.

Her çendî temenê wî ciwan bû jî, lê wî zû fêm dikir û zû jî pêk dianî, xwedî têgihiştinek û qabilyeteke mezin bû. Dîsa xwedî teybetmendiyên cuda bû. Ev cudabûyîna xwe jî di kesayetiya xwe de û di pratîka xwe de diyar dikir. Di jiyanê de jî her wisa bû. Ti caran ne digot, "ez vî karî nakim" yan jî "peywira min heye, ev kar ne li gorî min e." Tevlîbûna wî ji her karî re hebû û xwe tevlî dikir.

Hevalên ku wê demê li Gabarê mane, rewşa wê demê dizanin. Wê demê weke hevalên li Gabarê, em pir di nava zorî û zehmetiyan de bûn. Dijmin pir dijwarî dihat ser gerîla, ji bo tişteke biçûk jî nemîsoger bû ku me bikarîbûna biçûbûna gundekî jî. Her çiqasî êrîşên dijmin li ser Gabarê pir dijwar bûn jî, lê me ji xwe re plansaziyek çêkirîbû, me xwe bi xweza û fêkiyên Gabarê têr dikir. Jixwe tê zanîn, erdnîgariya Gabarê dewlemend e û gelê me yê li wê heremê bi rastî kedeke mezin dabû wê erdnîgariyê. Heta ji kevir û teht û darên Gabarê sûd wergirtîbûn. Rexmê ku dijmin ew qas dişewitand, talan û wêran dikir jî, lê xwezaya Çiyayê Gabarê li hemberî dijmin xwe nû dikir û digot, "vaye çi qas tu min talan û wêran bikî jî, lê ez ê xwe her û her nû bikim û ez ê her tim xwe zindî bikim û gerîlayên xwe jî têr bikim." Ango dayikaxweza di her şert û mercî de ji bo me dibû alîkar. Me di wê demê de ji bo xwe ji tiriyên wê dims çêdikir; guz, behîv, kom dikirin. Ji bo zivistanê me gelek tişt ji bo xwe kom dikir. Rêheval Çekdar çawa ku di çalakiyên şer û jiyanê de pêşengî dikir, di heman demê de di nav wan karan de jî, her li pêşiya hevalan kar dikir. Ti caran, min rojekê jî nedît ku bibêje, "ez

fermandar im, ev kar biçûk e, ez nakim." Li gel vê yekê jî di nava jiyanê de lê dinêrî ka kîjan heval ji aliyê jiyanî û rêxistinî ve zehmetiyan dibîne, yan jî alîkarî jê re pêwîst e dixist rojeva rêveberî û bi xwe jî pê re eleqeder dibû. Hestên berpisiyartiyê û hişyariyê li gel wî pir zêde bûn. Ew xwediyê vîn û sekneke teybet bû. Ew bi eşq tevlî jiyanê dibû. Ji bo wê, ew her tim di nava lêgerînan de bû. Li gel vê yekê jî wî kesayetiya xwe her tim nû dikir.

Hevalatiya wî ya li gel hevalên jin jî, pir rasteqînî û jidil û can bû. Jixwe di civaka Kurdistanê de deshilatiya mêr bi bandor e. Dîsa di kesayetiya mêr de, di hindurê jiyanê de jî ji aliyê deshilatdarî ve her tim xwe cuda dîtin û hêz dîtin heye. Ev feraset weke diyardeyekê di kesayeta mêrê deshilat de tê jiyîn. Rêhevalê Çekdar, ev şêwazê mêrê paşdemayî û klasîk ji bo xwe nedipejirand û li hemberî wê zîhniyetê hişyar bû. Di heman demê de jî wî têkoşîneke jidil dida meşandin. Ji bo wê hevaletiya wî li gel hevalên jin bi naverok bû, weke mêrek deshilat nêzîkatî nedikir. Li hemberî hevalên jin pir dilnizim bû. Hevaletiya wî ya li gel hevalên jin jî pir semîmî bû. Jixwe di wê demê de li Gabarê em nêzî 20 û 24 hevalên jin hebûn. Ji aliyê hemû hevalên jin ve rêheval Çekdar cudabûna xwe dabû diyar kirin. Gelek caran wan hevalên jin digotin: "rêheval Çekdar, hevlatiya wî li gel hevalên jin, pir jidil û samîmî ye."

Ger carînan di şêwazê wî de kêm û kurtiyên rêbaz derbiketibûna jî, lê bi şêwazekê dihat taxima hevalên jin, rexnedayîna xwe dida. Rojekê li gel komek hevalan diçe peywirê. Ji koma wan hevalek jin çeka xwe li cihekê ji bîr dike, dema ku qederekê dimeşin ew hevala jin pê dihese ku çeka xwe ji bîr kiriye. Ji bo wê heval Çekdar jî hinekê xwe bi ser wê de aciz dike. Jixwe li gorî zagona leşkerî nabe bi çi şêwazekê gerîlayek azadiyê çeka xwe di nava şer de jibîr bike. Çek cih hiştin tawaneke leşkerî bû. Piştî ku êvarê gihiştin cihê xwe siharê li ser wê mijarê Ş. Çekdar hate gel hevalên jin. Ji ber şêwaza xwe ya

teng û çawa xwe aciz kiriye ji taxima me re rexnedayîna xwe da. Bi rastî ew nêzîkatiya wî pir jidil û samîmî bû. Wî zanebûnek ya azadiyê dida raber kirin.  Ew giyanê wî yê germ, giyanê Apogeriyê bû. Ewqas bi hevalên jin re samîmî û jidil bû. Ger ku li şûna wî mêrekî deshilat, feodal û hişk bûna, negengaz bû bê rexnedayîna xwe bide hevalên jin. Wê di ser de jî xwe gelek aciz û tûndtir bikiribûna.

Piştî ku rêheval Çekdar ji wargehê çû, me weke hevalên jin helwesta heval Çekdar ji bo xwe mînak girt. Ji ber ku heval Çekdar şêwazê Rêber Apo ji bo xwe girîng digirt û pir hewl dida di jiyanê de jî pêk bîne. Li hemberî feraset û nêzîkatiyên zayendperestî jî têkoşîn dikir. Nêzîkatiya mêrên desthilat û kole ji bo xwe nedipejirand. Her çiqasî hevaltiya wî li gel hevalên jin samîmî û germ bû jî, li gel vê yekê jî pir cidî û rêxistinî bû. Her tim hewl dida di navbera hevalên jin û hevalên mêr de pîvanên hevaletiyê bilind bike. Parvekirina wî ya li gel hevalên jin bi rêxistinî û bi hevaltîbû. Wî pir girîngî jî dida semîmiyetê. Ji bo xwe jî ev yek girîng didît û di kesayetiya xwe de ev teybetmendî dida diyar kirin.

Bêguman hevalên wisa ji bo me mînak in. Ji ber ku hevalê Çekdar, di kesayet û meşa xwe de şopdarê heqîqetê û azadiyê bû. Ji wê xetê bi bawer bû ku wê jin û mêr jî bide guhertin. Ji bo wê her şêwazeke wî ya kar û hevaletiyê li ser bingehê baweriyê bû. Ew ti caran di şêwazê xwe de diyar nedibû, kar an jî nêzîkatiyê wî li ser bingehê pêwîstiyan bixwe bû. Wî her tim felsefeya Rêber Apo ji bo xwe girîng didît û pê bawer bû. Ji bo wê her tim di jiyanê de xwediyê moralek mezin bû.

Weke ku tê zanîn, qada Gabarê di herêma Botanê de cihekî teybet û zor e. Dijmin bê navber li ser Gabarê radiwestiya. Gelek zorî û zehmetiyên herêmê bixwe jî hebûn. Derfetên wê jî ji ber astengiyên dijmin gelek kêm bûn. Rexmê di wê demê de ewqasî zor

jî bû, lê ti caran rêheval Çekdar nedigot, “derfet tine, em nikarin kar bikin.” Di ciheke ew qas zor de heval Çekdar, ti caran ji bo xwe astengî nedidît. Gelek hevalên wisa hêja di Gabarê de erkên xwe bi cih dianîn. Heval Erdal û heval Hûseyîn jî her wisa bûn. Ti caran behsa zor û zehmetiyên jiyanê nedikirin. Peyva ku “derfet zor e”, yan jî “dijmin derdora me girtiye, em nikarîn bikin” tinebû li gel wan hevalan. Teybet ew peyv li gel heval Çekdar qet tine bû. Berûvajî digot; “Divê em ji bo şert û mercên pir zor û girantir xwe amade bikin.”

Li hember Gabarê di wê demê de ji aliyê dijmin ve polîtîkayeke teybet dihat meşandin. Gabar, di dîroka têkoşîna azadiya gelê Kurd de, ji destpêkê heta niha her û her ciheke dîrokî ye. Ji ber ku warê Egîdan e û yekemîn car di şexsê rêhalê Egîd de li Gabarê bingehê têkoşîna gerîla tê pêşxistin. Guherandina civaka Kurd jî li vê derê tê dest pê kirin. Şehadeta hevalê Egîd ji bo civaka gelê Kurd û Kurdistanê pênaseyeke dîrokî bi xwe re aniye. Dijmin ji bo gerîla di Gabarê de bifetisîne, ji gel qut bike hemû hewldanên xwe dixe tevgerê. Pir bi hovane tê ser çiya û kevirên Gabarê. Jixwe dijmin ji Gabarê jî ditirsiya. Ji ber ku heybeta Gabarê cuda bû.

Rêhevalê Çekdar di ciheke wisa girîng de bi erka Fermandariya Eyaletê cihê xwe di rêveberiyê de digirt û kar dikir. Ji bo Gabarê lêhûrbûneke wî ya teybet hebû. Hevalê Çekdar di zanabûna mîsyona dîrokî ya Gabarê de bû. Mîsyona Gabarê ji bo gerîla çi ye? Divê gerîla li hemberî dijmin bi şêwaz û taktîkeke nû ve xwe çawa li Gabarê rêxistin bike? Li van hemûyan dihizirî, wî ev yek di nîqaşên xwe yên bi hevalan re jî parve dikir. Dixwest ji despêkê ve vî bingehî bi hevalan re pêş bixe.

Dîsa di hemû nîqaş û vegotinên xwe de digot, “piştî ku ez çûm qada Rêber Apo, min girîngîbûyîna rastiya xwe, ya şer, ya têkoşîn û

civakê dît.” Ji ber vê çendê wî ji bo xwe du pêvajo diyar dikirin û digot “berî ku ez biçim qada Rêbertiyê, ji bo jiyanê û şer tevlîbûnekî min a germ hebû. Lê belê piştî ku ez çûm qada Rêbertiyê, min fêm kir ku mijara ku me di Kurdistanê de windakirî mijara zîhniyet û zanistê ye. Û min dît ku ez di vê mijarê de gelek kêm û lawaz im.”

Hevalê Çekdar ji aliyê kesayetî ve jî yekî ne girtî bû. Ew, ne yekî hişk û kalibger bû. Ji bo guherandin û veguherandinê zîhnê wî gelek jîr û esnek bû. Ew, di jiyan û şer de jî gelek wêrek bû. Pir carinan me jê re digot, “çavsor”, ew qasî bi çavsorî diçû ser dijmin. Û li gel van teybetmendiyên xwe yên xweş jî wî li gel qadê û li gel rêhevalan rengekî pir cuda dabû. Ji bo vê yekê ew di pêvajoya paşdekişandinê de li Eyaleta Mêrdînê ma. Navenda Eyaleta Mêrdînê jî li Gabarê bû.

Di pêvajoya ku Rêbertiyê dabû dest pê kirin de yê ku herî zêde xwe di pêvajoyê de zelal dikir û dixwest fêm bike, yek ji wan jî hevalê Çekdar bû. Perspektîfên ku Rêbertî ji bo me dabû diyarkirin, herî zêde wî fêm dikir û dixwest di jiyanê de bide pêkanîn. Kesayetiya wî ew qasî li hemberî pêvajoyê zelal bû. Di Civîna rêveberiya eyaletê de hat destnîşankirin ku hevalê Çekdar li Gabarê bimîne. Ji ber ku teybetmendiyên wî yên berpisiyartiyê û zanebûna pêvajoyê hîn zêdetir bû. Wî, qada Gabarê û Mêrdînê jî pir baş nas dikir. Û di heman de mê de jî dikarî hevalên li qadê li ser pêvajoyê perwerde bike û li gel pêvajoya agirbestê jî li hemberî dijmin hevalan biparêze. Ji bo wê hevalên ku li gel hevalê Çekdar weke farmandariya qadê mabûn, hevalê Heqî û hevalê Apê His bûn. Jixwe Rêber Apo erkên teybet dabûn pêşiya hevalê Çekdar. Ew bi xwe jî ji xelkê Cizîra Botanê bû û ew ji kevneşopiya malbata Bedirxaniyan dihat. Ji bo wê di Eyaleta Botanê de ji aliye Rêber Apo ve bi mîsyonên girîng ve hatibû terfîkirin. Rêbertî dixwest di şexsê hevalê Çekdar de erka

fermandariya nûjen mîna şêwazê rêheval Egîd derbixîne pêş û ev erka girîng û dîrokî ji rêhevalê Çekdar e hatibû destnîşankirin.

Di pêvajoya paşdekişandinê de jî ew erka hevalê Çekdar li Botanê jî her derbasdar bû. Hemû komên ji eyaletên hundir dihatin, li ser xeta Mêrdîn û Gabarê derbas dibûn. Hemû jî di bin berpisyaretiya Şehîd Çekdar de derbas dibûn. Dema ku me komek bê windahî derbas dikir, me ev yek weke çalakiyeke bi serkeftî dinirxand. Hevalê Çekdar di derbaskirina wan koman de erkeke bê sînor dabû pêşiya xwe hemû peywirên xwe bi cih dianîn. Ji pêşwazîkirinê bigire heta di bicih kirina ewlehî û şandinê de erka xwe bi cih dianî. Di pêvajoya paşdekişandinê de xeta ku windahî nedayî ew xet tenê bû. Di sedemên ku di wê xetê de windahî nehatin dayîn jî, bi misoger pareke mezin a rêhevalê Çekdar hebû. Ji ber ku ew li hemberî dijminê xwe pir şiyar û pir jî jîr bû. Jixwe bi wan hemû fedekariyên wî dihat diyar kirin, ka çi qasî di pêvajoyê de zelal e. Û pir jî li ser xwe bû. Lin hember pêvajoya ku ji aliyê Rêbetî ve hatibû dest pêkirin jî, bê didulî nêzîk dibû. Ji ber ku heta dawiyê pê bawer bû. Ji Rêber Apo bawer bû. Ew qasî jî pêve girêdayî bû. Ji şêwaz û rêbazê Rêbertî pir bawar bû. Kesê/a ku li hemberî pêvajoyê zelal û pêvajo nedixist mijara nîqaşên hevalan, Şehîd Çekdar bixwe bû.

Em êdî diketin pêvajoya kongreya PKK'ê ya heftemîn. Hêza fermandariya rêxistinê ya Bakur, ji sedî not hatibûn Başûr. Weke ku tê zanîn em di pêvajoyeke gelek nazik û xwedî gelek berpirsiyartiyên giran de derbas dibûn. Rêbertiya me bi destên dewletên Nato û teybet jî bi destê dewleta Emerîka hatibû girtin û ji bo berjewendiyên xwe weke dîl teslîmî dewleta faşîst a Tirkiyê kiribûn. Plangeriya ku ser Rêbertiya me hatî meşandin, çar aliyê xwe hebûn. Sê alî dewletokên Nato bûn. Aliyê çaran jî xiyaneta Kurd û hevaletiya kêm bû. Hevaltiya kêm ku erkên xwe di wext û demê xwe de neanîna cih bû. Vê ji bo xiyanetgerên weke Ferhat (Osman Ocalan),

Botan (Nizametin Taş) û hwd. valahiyên mezin di nava jiyan û rêxistinê de hiştibû.

Kesê ku di wê demê li ser Biryageha Navendî disekinî Botan bû. Jixwe di nav xwe de çi nîqaş dikin nayê zanîn, lê ji aliyê Botan ve talîmat hatibû dayîn ku divê hevalê Çekdar derbasî Başûr bibe. Hîn di navberê de mehek derbas nebibû, min dît ku ji nişkavan ve gotin, “Hevalê Çekdar şehît ketiye.” Bi rastî jî ez matmayî mam û hemû giyanê min tevizî û cemidî. Ji ber ku ji aliyê rêxistina giştî ve ti biryareke wisa nebû ku hevalê Çekdar were Başûr. Hevalên ku di berpirsiyariya rêxistinê de cih digirtin tên zanîn û li ser hevalê Çekdar biryareke wisa negirtibûn. Di nêrînên rêveberiya eyaleta Mêrdînê de jî li ser hevalê Çekdar biryareke wisa tine bû. Çawa hat Garê û çawa şehît ket? Me gelek hevalan ji vê biryarê guman girt. Pişre me pirs kir ku hevalê Çekdar çima derbasî Garê bûye? Hevalan gotin; “ji aliyê Biryageha Navendî ve talîmat ji wî re hatiye dayîn.”

Cardin weke tê diyar kirin ku kesên xiyanetkar bi teybet jî kesên mîna Botan, rexmê ku di wê pêvajoyê de di rêveberiya rêxistinê de jî bû, lê erkeke neyînî û xirap bikardianî. Weke ku tê dîtin berpirsê şehadeta hevalê Çekdar ew bûn, bi destê wan hatibû pêşxistin. Li gorî berjewendiyên xwe bi şêwazên cuda komên gerîla yên di wê deme de li Bakur bûn, bi vesazbûnên ne di cihên xwe de dikişandin Başûr. Van rêbazên wan bi serê xwe xizmeta dijmin dikirin.

Hevalê Çekdar hevalekî ew qas ji pêşketinê re vekirî bû, ji aliyê Rêbertiyê ve ji bo fermandariya gerîla û fermandariya Botanê hatibû erkdar kirin. Ji bo şêwazeke gerîla ya nûjen derbixîne holê ji aliyê Rêbertî ve hatibû amade kirin. Rêheval Mordem jî her wisa bû. Fermandarekî weke Botanê klasîk û paşverû, ciwanên weke heval Çekdar, ji bo azadiya gelê Kurd hêvî didan, bi biryarên wisa şaş û ne di cih de dibûn sebeba şehîtbûna gelek hevalên mîna hevalê Çekdar. Jixwe Rêber Apo jî debêje, “bi sedan ciwanên ku min bi destê xwe amadekirî di şer de bi şêwazên we yên şaş, bi şêwazên we yên şerê klasîk hatin tine û winda kirin.” Rêheval Çekdar jî yek ji wan ciwanan bû.

Heval Çekdar di sekna xwe de li Botanê mînak bû. Di fermandarî û pêşengtiya xwe de jî her mînak bû. Heviya Rêber Apo ji ciwanên wisa re pir zêde hebû, yek ji wan hevalan jî hevalê Çekdar bixwe bû. Ji ber ku Rêbertî ji bo erkên mezin ew amade kiribû, kesayetiya wî ewqasî hêvî dida.

Şehadeta heval Çekdar ji bo me windahiyeke mezin bû. Bêguman ji bo jiyaneke azad wê bedel û şehadet jî bên dayîn, lê şehadetên wisa bi erzanî nayên qebûl kirin. Yek ji wan şehadetên ku mirov qebûl nake, şehadeta hevalê Çekdar bû. Cardin şehadeta heval Erdal û heval Çekdar ji bo me windahiyên giran bûn. Divê li hemberî şehadetên wan hevalan, bi caran û bi caran em berpisiyaretiya xwe bibînin û xwe dahûrandin bikin, şêwazê xwe jî tê de bibînin. Ji ber ku êş û berpirsiyartiya şehadetên wan hevalan giran in.

Rêhevalê Çekdar dema dixwaze derbasî Başûr bibe, li Garê li gel komek hevalên xwe bi destê xiyanetkarên weke Mala Barzanî, di encama kemîna tangên dewletoka Tirkan de şehîd dikeve. Ger ku li Botanê mabûna, wê di wê pêvajoyê de û di her pêvajoyên din de, ji bo têkoşîn û azadiya gelê Kurd bi erkeke mezin rabiba û bi rêbazê Rêbertiyê fermandariyeke nûjen pêşbixistibûna.

Bêguman şehadeta hevalê Çekdar giyanê hevaltiyê ya di şer de hîn xurtir kiriye. Her wiha xeta berxwedanê jî kûrtir kiriye. Ji bo me şehadeta hevalê Çekdar xeta jiyaneke azad e û wê bîranîn û daxwaziyên wan ji bo me her tim di rêka serketinê de bên jiyîn. Jixwe tê zanîn ku tevger û gelê me şehadetên wisa napejirîne. Şehadeta hevalê Çekdar jî ne şehadeteke di cihê xwe de bû. Hevalên ku hevalê Çekdar nas dikirin, şehadeta wî giranbûnek li ser wan hevalan da çêkirin. Weke ku tê zanîn şoreşa me di Botanê de sih-çil sale di şêwazê taktîk de şêwazek girtibû. Bêguman li gel wê jî daneheveke mezin a berxwedanê derxistibû holê. Cardin di nava gel de jî bibû xwedî hêzeke mezin. Ger ku îro bi hezaran ciwan li Cizîr û Sûrê, bi teybet jî li tevayî Botanê serhildanan dikin û tên tevlî dibin, bêguman ev hemû bingehên destkeftiyên şoreşê ne. Di heman demê de jî giyanê hevaltiya PKK'ê bixwe ye. Lê belê tişta ku Rêbertî bi pêşketina rêhevalê Çekdar û gelek hevalên din dixwest bide pêşxistin,

modeleke cuda bû. Dixwest di şexsê wan hevalan de şêwazê taktîka şer û jiyanê hîn mezintir bike.

Ji bo wê Rêbertî li ser pêşketina hinek hevalan bi teybet disekinî. Yek ji wan hevalan jî hevalê Çekdar bû. Ji aliyê Rêbetiyê ve hatibû perwerdekirin û bi erkên mezin şandibû Botanê. Di demeke kin de bi hevaletiya xwe û bi kesayetiya xwe ji bo hevala bû mînak. Wî, di vê mijarê de jî erka xwe bi eşq cih bi cih dikir. Wî bi vê sekna xwe ve hevaltiya xwe xistibû dilê hemû hevalan û hevalan jî gelek ji wî hez dikirin. Şehadeta wî ji bo hevalên wî gelek giran bû, lê giyanê wî ji bo hevalên wî bû giyanê berxwedanê ku tola wî ji dijmin rabikin. Di wê dema ku hevalê Çekdar şehîd ketî de, Ş. Erdal (Engin Sincer) gelek bandor bibû, her digot; "pêwîst bû ku hevalê Çekdar şehîd neketibûna." Ş. Erdal, şehadeteke wisa ji bo hevalê Çekdar qebûl nedikir û nedipejirand.

Rêhevalê Çekdar temsîla dîroka Botanê ya kevnar dikir. Di kesayetiyê hevalê Çekdar de ev giyan û ev lehengî hebû. Wî kesayetiya xwe ji deshilatdarî û koletiyê paqij û dûr hiştibû. Di Botanê de, du şêwazê karekterê mirovan heye: Ya ku xwe dispêre civaka xwezayî û xwe di nirxên netewî de dibîne, di civakbûnê de xwedî hêzeke parvekirinê û semîmiyetê ye. Karekterê duyemîn jî feodal, axa, ji rastiya civakê dûr, hîn nêzî deshilatî û dewletê ye. Kesayetiya rêhevalê Çekdar, cihê xwe di karektera yekemîn de digirt. Jixwe me gotibû xwedî van nirxên xwezayî yên parveker bû. Li ser vê bingehî Rêber Apo, li ser karekterê Botanê bi hûr û kûr pê re hevpyevin kiribû.

Weke ku min di serî de jî got, şehadeta hevalê Çekdar ji bo me bû windahiyeke pir mezin. Em xwedî biryarekî wisa ne ku şehadeta hevalê Çekdar, hevalê Erdal, hevalê Hûseyîn û her weke din jî hemû şehîdên me yên têkoşînê bikin bingehê têkoşîneke ku azadiyê teqez dike, ji bo wê jî em li hemberî xwestek û armacên wan yên mezin soza xwe nû dikin. Em ê bi têkoşîneke mezin li ser şopa wan bimeşin…

**Rûken Garzan**

"Hemû şerên ji neçarî tên lidarxistin mafeke xwe heye. Cihekê ku hêvî nema be, çek pîroz e."

**Zerdeştê Kal**

## Ji Bo Bîranîna Rêwiyeke Hêviyê Yê Nemir

Weke pelekî li bagerê qelibiye yan jî çivîkeke perên wê vebûne difiriya li asîmanê şînoyî. Xwe daye ber bawerzînekê; dixwest tê de li xwe bigere, bibîne û tehma azadiyê bijî. Dixwest jiyan û xweşikiya wê bi hev re bijî û qet niyeta wî tinebû ku dest ji vê yekê berde. Lewma bêwestan difiriya. Ramanên Wî di îdealên Wî de bi cih bûbûn. Ew, bi qasî Adilan, Erdalan, Doganan, Reşîdan bi îrade, bi qasî Manî bi sebir bû. Heta xwe negihandibûna armanca xwe niyeta Wî tine bû ku raweste. Tevî hemû zor û zehmetiyan jî di rûyê Wî de ti şopên westandinê tine bûn, di meşa xwe ya hêviyê de wî li her cihê diçûyê şopek dihişt û aramiyeke hîn xweşiktir dida henaseyên li wir. Dema hêviyên xwe di nava dilan de belav dikir, tovên hezkirinê lê diçand. Wî, wezîfeya xwe bi coşa murîd û hawariyên Îsa dianî cih. Ji ber ku Ew di fêrdariya xwe de her wisa hîn bûbû. Wî digot; "ji bo jiyaneke sosyalîst û rast, îlehî têkilî." Wî bi têkiliyê ve ev rastî wergirtibû. Dema ku cîhana Wî ya ji hindur ve xwe li jiyana Wî vedida, ew bi vî awayî hîn zêdetir derdiket holê, bi vê yekê Wî çiqas girîngî dida kesayeteke bi cewher ewqas jî dihat rapêş kirin.

Erê hevrê Çekdar! Tu kesayeteke ji bagerê bûyî! Ew kesayeteke ji bagerê bû. Ma fêrdariyê Wî ne wiha gotibû: "Meşên bi bager, kesayetên bi bager dixwaze." Hevrê Çekdar, ji navenda dilê Kurdistanê ya dîrokî Botan û bi girêdayî wê li Gundê Şaxê mezin dibe. Piştî ku perwerdeya xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li Cizîrê temam dike, Ew vê perwerdehiyê ji bo xwe bes dibîne û hîn di dema perwerdehiya xwe ya Seretayî de, ew şervanên azadiyê ku ji nêzîk ve nas dike, ji bo bigihê wan bi azweriyeke weke agir dixwaze tevlî nava refên gerîla bibe. Rexmê ku gelek caran vê xwesteka xwe dubare û sêbare dike û tîne ziman jî, ji ber temenê wî yê biçûk xwesteka wî paş tê zivirandin. Dema ku dibistana amadeyî xelas dike ji keyfxweşiya gihîştina armanca xwe bi salan mîlîstiyê dike, ji bo vê

peywira xwe qedemeyekê ber bi jor ve bibe tevlî refên artêşê dibe. Êdî hevalê Çekdar gihîştibû hêviyên xwe yên bi salan. Dixwest ew berpisiyartî û peywirên dîrokî yên bapîrê wî Bedîrxan Beg ku di nîvî de hiştibûn bi cih bîne. Dema ku ew hîn ji destpêkê ve tevlî refên gerîla dibe, bixwe jî wiha dibêje: "We hîn nû destpêkiriye, karê we hêsan e. Peywira min li gorî yên we hîn girantir e. Ji ber ku pêwîst e ez berpisiyartiya mîrateya dîrokî ku xwe bi teslîmeyetê pêçandibû temam bikim." Tevî ku ew hîn pir ciwan e jî, lê gelek taybetmendiyên wî, kesayetiya wî cuda dide nîşandin. Rexmê ku di wî temenî de ye, ew qasî zû pêşketin ji jîrbûna wî bû, ev yek ji taybetmendiyên wî yên pir cuda dihat.

Ew, ji Botanê bû. Vê jî dihişt ku li hember şert û mercên xwezayê hîn bi rehet bibe. Weke ku ax, agir, av xelas nedibûn, fêrî wê meşa ku di nava daristanên tarî û bêdawî de bûbû. Di lûtkeyên Çiyayê Cûdî de meyzandina bedewbûna bêhempa ya Besta, Herekol, Şirnex û Gundê Şaxê jî zewqeke mezin dida wî û her ku firsend didît, hildikişiya ser lûtkeyan, zewqa wê bi çend hevalên li derdora xwe re parve dikir. Ew yekî têkoşer bû, wî her tim digot; "peskirin mirin e. Yan hênaseyeke bi rûmet û bi serbilindî, yan jî xeweke mirinê ya bêdeng." Bi vê înadê her peywira ku diçû ser bi serkeftî dawî dikir. Ew xwediyê behreyeke nêçîrvaniyê bû. Wî dikarî mîna bazekî dijwar, mîna marekî dize, mîna şêrekî jî afirîner bibe. Çavdêriyên wî zelal bûn, jixwe taybetmendiyên xwe jî ji vê çavkaniya xwe digirt. Aliyên wî yên septîk ku ji bo xwe bigihîne heqîqetê pir kûr bûn. Ew di hemû karan de bêxem nêzîk dibû. Ji vî alî ve jî pêşengtî nedida ti kesekî, ji karê giran ê bi rojane bigre, heta xebatên rêxistinî, di qada şer de jî gava yekemîn wî davêt û piştre jî hevrêyên xwe yên din tevlî şer dikir. Di xeta pêşketina partiyê de jî xwedî nêrîneke pêşketî bû. Ji ber baweriya ku jê re dihat dayîn, çi berpisiyartî û peywirên ku jê re dihat dayîn xwe jê nedida paş. Asta peywirê çi dibû bila bibe bêyî ku

xwe paşde bide ew qebûl dikir û ji bo bi ser bixe hemû zehmetî dida ber çavên xwe.

Di dawiya sala 1997’an de hevrê Çekdar, li gel komek heval ji bo Dibistana Navendî Ya Partiyê tê şandin. Di vê qadê de piştî ku dewreya xwe ya perwerdeya yekemîn xelas dike; têkiliyê wî yên hevrêtî, zewqa wî ya xwendinê, ahengdariya wî, li gel hêrsa wî ya kar û her wiha girêdana wî ya ku jidil ji Rêbertî re berçav tê derbaskirin. (Dibe ku di jiyana xwe de tişta herî hêvî dikir, dixwest bigihîje ev lûtkeya bixwe be, hîn nêzîkî Rêbertiya xwe bimîne û li gel Rêbertiyê bixwe jî bijî, di dawiya perwerdeya xwe ya yekemîn de ev xewnên hevalê Çekdar yek bi yek rast derdiketin pêşiya wî). Weke çavkaniya vejînên nû, sembola bêmiriniyê ji bo dîrokê hêviyên xwe yên jiyanê bexşandî, biryar hatibû dayîn ku ew di ewlekariya fêrdariya xwe ya mezin de hîn nêzîk bisekine. Ev ji bo wî wisa bû ku ti caran bi tiştekî din re nayê qiyas kirin, ew qas nirxê xwe hebû. Hevalê Çekdar wê demê ji bo xwe weke pêvajoyeke ji nû ve ya tevlîbûnê dinirxîne. Min yekem car ew di vê rewşê de didît. Hereketên wî weke zarokekî xwînşêrîn xuya dikirin, di çavên wî de jî diyar dibû ku gelek tişt bi vedanê ve vedigotin. Wî bixwe jî dizanî ku rêwiyê jiyaneke cuda û pîroz pêwîst e. Di vê rastiyê de wê çawa erkên xwe bi cih bîne û vî şansê dîrokî wê çawa bi şêwazeke herî baş pêkbîne û wê çawa layiq derbikeve, derfet ji wî re çêbûbû. Her ku ew dihizirî, weke hesret û hêviyên ku ev firsend nakeve di destên her şoreşgerekê/î de ev bextewerî û keyfxweşî di rûyê wî de diyar dibû. Di roja yekemîn de ji bo ku hevalên ewlekariyê li gel Rêber Apo li maşîneyê siwar bibin, ji aliyê rêveberiya akademiyê ve hatibûn hişyarkirin, lê ew jî li gel maşîneya Serokatî sekinîbûn. Dema ku Serokatî ew li pêşiya maşîneyê dît, çend pirs li wan kirin, piştî ku wan jî pir bi lez bersiva Serokatiyê dan, Serokatî ji nişkan ve li maşîneyê siwar bû, çû. Pêwîst bû ku di wê maşîneyê de hevalên ewlekariyê jî hebûna, lê belê ji ber

maşîne ji nişkan ve meşiya û çû wan jî tenê lê temaşe kiribûn. Di wê demê de her sê heval bi şaşûmaşî li hev temaşe dikin. Ne dikarin bikenin, ne jî êş hîs bikirina, piştî ku maşîne ji dibistanê derket, wê demê zanîn ku di ezmûna yekemîn de li hember tempoya Rêbertî lewaz mane û ji bo vê jî di hindurê xwe de şerm dikirin. Piştî bi demekê şûn ve ji bo wan bigre maşîne dubare vegeriyabû. Piştî çend bûyerên wisa bi kelecan û şûnve fêrbûna Rêber Apo êdî ne zor bû û di cîhanê de weke ku peyda nabe ew qas zû fêr bûbûn. Mîna ku dostekî xwe yê herî nêzîk hîs bike, hevalê Çekdar wisa dest bi jiyaneke nû kiribû. Yê ku ev ava kir jî Rêber Apo bixwe bû. Nûnerê wî yê jiyanê ji bo mirov pêş bikeve hemû derfet û rêga gotûbêjê vedikir. Ji aliyekî ve ew dikişand ser aktîfbûneke sosyal, ji aliyê din ve jî ji bo şoreşgerekê/î hestên bawerîdayîna xwe pêş dixist. Di çi temenekî de bûya, kesayetiya wê/î çawa bûya bandor dikir û ji bo bibe kesayetek sosyalîst jî di wan de guhertin dida avakirin. Nûnerê wî yê jiyanê ew qas bi plansazî kar dikir, kesê ku bi wî re di heman navendê de bûya nedihat hizirandin ku ji vê tempoyê dûr bikeve. Di fikirandineke wisa de bû, yên ku li gel wî bûn tevlî wî karê hevbeş dikir; hûrdeyên jiyana pratîkî jî hemû parve dikirin.

Hevalê Çekdar, roj bi roj bandor dibû û li tevgera Serokatî ya herî biçûk jî bi baldarî nêzîk dibû. Her roj ji gotûbêjên ku dihatin amadekirin re xwe amade dikir. Serokatî wê îro li ser kîjan mijarê bisekine, beriya wê li gel hevalan li ser lê hûr dibû. Wî, di pratîka Botanê de şerê herî dijwar jiyan kiribû. Gelek bîranîn, zor û zehmetiyên xwe ji nû ve di berçavan de derbas dikirin, bi derfeta ku ketî destên wî dixwest wan şaşîtiyan bi niqaş û rêbazên Serokatî yên şênber bîne gelhev û xwe derbas bike. Piştî demekê şûnde wisa bû ku ew giraniya pêşveçûnên ji aliyê kesayetiyê ve dijiya, jixwe rêga hevrê Çekdar jî diyar dikir. Nirxandinên wî hîn bi plan û şênber bûbûn. Bi taybet li ser şerê çors analîzên ku dihatin kirin ku ew bi

salan ji wî dabû windakirin, ew perspektîf dişopand û bandora rêbazên herêma Botanê yek bi yek di kesayetiya xwe de di berçavan re derbas dikir. Te digot qey safok xistiye destê xwe, kêm û kurtiyên xwe yên şexsî û pratîka xwe ya derbasbûyî li safokê dida.

Hevalê Çekdar wisa jixwe bawer bû, di dawiya dewreyê de bi hevpeymana li gel Serokatî re gotibû, “Em ê barê te giran bikin, lê nabe tu di bin de bipelixî, bila dîrok xwe dubare neke.” Li hemberî vê berpisiyartiyê hevrê Çekdar ti caran didulî jiyan nekir, bersiva dayî jî di asta dîrokî de girîng bû. “Serokê min, hêza ku min ji Serokatî girtî ez ê di hemû peywirên xwe de pêk bînim. Tişta herî rast jî, ez ê bibim şopdarê rêbazê Serokatî, ji vî alî ve heta dawiyê ji xwe bawer im. Hêza ku min ji hêviya jiyanê girtî, di wê pirtûka ku min pênûsa wê girtî destên xwe de jî ez ê mirinê têk bibim. Tişta ku ez dixwazim fêm bikim, bêdawîbûn e û bi vê hêrsê jî ez ê MIRINÊ TÊK BIBIM.”

Ev helwest ji bo hevrê Çekdar hemû tişt dida vegotin. Ji ber ku heta dewreya perwerdeyê berdewam dikir, li gel Serokatî gotûbêjên rojane pêk dianî û di ronahiya van analîzan de hevrê Çekdar, li ser “Têkbirina Mirinê” xebata pirtûkekê amade kiribû. Bi temamî xeta gernastiya ku xwe ji bo jiyanê feda dike di kesayetiyên serokên şoreşan de nivîsandibû. Di biryara hevpeymanê de jî wê şopdarê vê xetê be ku ev jî biryara herî mezin bixwe bû.

Belê, dema ku hevalê Çekdar ket ser rêwîtiya welat, weke gihiştiye hemû xwestekên xwe ji Serokatiyê cuda dibû. Dema ku derbasî welat dibin, di derbaskirina sînorê Iraqê de rastî leşkerên Saddam tên û leşkerên Saddam jî dixwazin wan neçar bikin ku dîl bigrin. Lê hevrê Çekdar û hevrêyek li gel wî xwe diavêjin pêş û pîmê bombeyê digrin, li hemberî wan helwesta xwe nîşan didin. Tevî hemû hewldanên wan ew pîmên bombeyên xwe bernadin û tawîz nadin. Heta ku leşkerê bi paye bilind tê û soza ewlehiya wan dide. Lê

tevî vê jî wan dîsa bombeyên xwe li gel xwe cuda nekiribûn. Di dirûşmên wan de “mirin hebû, lê teslimiyet tinebû!” Bi vî awayî serê wî û yên rêhevalên wî bilind, ber bi axên azad ve meşa xwe domandibûn. Li Cûdî, Gabar, Bagok û çendî çiyayên Botana ku tê zanîn digotin li ser wan re ne gengaz e ku mirov bikaribin derbas bibin, wî yek bi yek ew çiya fetih dikirin; bi salan li wê derê bi stranên xwe yên azadiyê deng dabû. Êdî hevrê Çekdar bi wan çiyayên bi heybet re bûbû yek giyan. Hevalê Çekdar bi taybet Çiyayê Gabarê weke dilovaniya dayikê nêzîkî xwe didît û hîs dikir. Piştî ji akademiyê tê heta demekê li Gabarê hesreta xwe ya çiyayan derbas dike. Li Bagokê jî heta pêvajoyekê rêveberiyê dike. Dema ku di fermandariya qadê de jî cih digire, ji bo tola şehîdên beriya xwe rake di nav hêrseke mezin de ye û weke ku soz dide, wê soza xwe bi çend caran pêk tîne û li ser plansaziyan lêhûrbûn dike.

Bagok ji dîrokê heta niha ti caran bê berxwedanî nemaye. Hevrê Çekdar jî li hemberî vê weke ku di serê xwe de bikole dinivîse û tola wan rêhevalan radike. Piştî wê pratîkê her tim ji bo wî girîngiya çiyayê Gabarê hebû, xwe dixist nava dilovaniya wê jî. Heta astekê li ser serweriya partiyê pêş ketibû, her çi qas dîlbûna Rêber Apo ji bo wî pir bi êş be jî, ji bo bibe layiqê fêrdarê xwe û ji ber soza ku dabû şopdarên wî bi hêzeke mezin diçû ser xwe. Pêvajoya ku partiyê ji nû ve dabû destpêkirin xwe tevlî dike. “Ew, ji kesayetiyeke şer, derbasî kesayetiyeke azad û aştiyane dibe.” Berî her tiştekî ji bo wê pêk bîne di nav hewldanekê de bû. Navenda Biryargeha Partiyê, dema ku ji bo xebatên Kongreya VII. bang dike, lê nedikarî ji hevalên xwe û ji Gabarê qut bibe, wî digot; “biçûk jî be hinek din ji bo di pratîkê de bibim alîkar dixwazim li Gabarê bimînim.”


Lê belê partî ji bo hevrê Çekdar hîn jî pêş bikeve  ji bo tevlî kongreyê bibe fermaneke teqez dabû. Wî komek hevalan girt gel

xwe û dest bi rêwîtiya kongreyê kir. Komê gelek qadên welat ku hêzên leşkerî tê de bûn, tevî astengiyên şert û mercên zivistanê jî hebûn, sînor derbas kirin. Keyfxweşiya ku gav bi gav nêzîkî kongreyê dibû dijiya. Vê keyfxweşiyê li ser hemû komê bandor dikir. Ji ber ku ev kongre ji kongreyên din ji gelek aliyan ve xwedî cudakariyan bû. Ew kongre bi biryarên ku ji gelek aliyan ve hatibûna girtin re di heman demê de kongreyekî awarte bû jî. Yanî dîrokê xwe nû dikir, bi vê yekê re wê partiyê jî xwe nû bikiribûna. Beriya ku bigihîjin cihê kongreyê, kelecana wê çawa tevlî bibin di kesayetiya wan de dihat vedan. Wê çawa tevlî kongrê bibin; plansaziya wê çêdikir, her gava ku nîzîk dibû ponijandina wî hîn jî zêdetir dibû. Hevrê Çekdar bi vî awayî hemû pêvajoyên heyî di ber çavên xwe re derbas dikir, hizirandinên xwe kom dikirin û ber bi axa Başûr ve diçû.

Û binêre xiyaneta bêbext! Careke din li ser erdê diverişê! Bi hemû qirêjiya xwe ve li axên pîroz xwîna taze dirijîne! Hevkarbûna xiyaneta PDK'ê ya heta qirikê ku ketiye nav de, di kemînê de li benda nêçîra xwe bû! Wê kîjan fidanê Kurdistanê ji me qut bike, ne diyar bû. Wê kevirê herî bingehîn û herî mezin ji me qut bike. Dem hatibû li ser rêwiyên hêviyê weke kûçikên nêçîrê êrîş dikirin. Heval Çekdar bi 14 rêhevalên xwe re herî dawiyê bi stranên azadiyê diqêriyan: "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok!"

Xebera wan ji tiştekî tine bû. Ji bo rojên xweş, ji bo aşitiyê û biratiyê, di cîhanê de ji bo hemû mirovên bindest gavek din jî bi pêş ve biçin û ji bo hêviyên xwe pêk bînin pêşve vedikişiyan. Li himberî xiyaneta PDK'ê her çiqas gumanên wan jî hebûn, lê ew rêwiyên hêviyê bixwe bûn. Xiyanetê jî ji bo wan ji holê bide rakirin ew ji xwe re weke armanca bingehîn didît. Belê, xiyanetê nêçîra xwe girtibû û li giyanê 14 hevalan xistibû. Hevalê Çekdar jî ji wan fîdanek a herî taze bû. Wî, di qadên şer de şeş salan li himberî guleyan singê xwe dike çeper û di hemûyan de jî bi serkeftî derbas dibe. Lê belê texmîn

nedikir ku wê xiyanet ew qasî bi hêsanî nêzîkî wî bibe. Dibe ku weke fîzîkî ne di nav me de be, lê belê wê hevalê Çekdar her tim di dile me de be, bi giyan û hêviyên xwe wê di pratîkê de di nava me de bimîne. Wê weke hevaltiya Gilgamiş û Enkîdû jî di nav me de dîrokî bimîne.



Wê di dilê me de weke şopdarê xeta bê miriniyê bijî. Bêguman xiyanet jî wê bedelê xwe di demeke herî nîzîk de li himberî dîrokê, gel û civakê bide. Wê tolhildana cengawerên gel, dîsa gel bi xwe bistîne!

**Hevalên Wî Yên Têkoşînê**

“Min biryar da ku mafê min yê du tiştan heye: Azadî û mirin. Ger ku nebûm xwediyê yekî, ez ê ya din bixwazim. Ji ber ku kes nikare min zindî dîl bigire.”

**Harriet Tubman**

## Lehengê Ku Li Pê Şopa Dîrokê

Berî ku ez li gel rêheval Çekdar gotûbêjeke hizrî bikim, ez dixwazim ji çend peyvên Tao dest bi nivîs û gotubêja xwe bikim. Tao wisa dibêje; “Xweza di kevir de xew dike. Di gulê de xewnê dibîne, di çûkan de hişyar dibe û li cîhanê digere û di mirov de jî dikeve ferqa xwe.” Dema ku em li ser van nêrînên Tao yên felsefîk dihizirin, wê demê em dizanin ku xweza di mirov de gerdûneke bê dawî ye.

Jixwe Rêbertiya me jî dibêje; “Mirov gerdûn bixwe ye. Gerdûn di mirov de zindî ye.” Mirov dikare genên berî sêsed sal bijî. Dikare wê hafizê di roja îro de jî zindî bike. Dema ku em van danehevan hemûyan tînin gel hev, ji me re dibe heqîqeteke hevpar ku em dikarin jiyanê bêmirinî bikin, mirinê jî jiyanî bikin. Jixwe bêmirînî jî parçeyeke heqîqeta jiyaneke ya bi wate ye. Ji bo wê kesên ku vê şansê ji bo axa xwe û azadiya welatê xwe dest dixin, giyanên wan bêmirin in.

Hinek mirov hene mîna xweza yê ne. Dişibin axa xwe, ango ew axa ku li ser ji dayik bûne ne. Weke wê axê paqij û saf in. Ax çi qas paqij be, mirovên wê axê jî ew qasî paqij dimîn in. Dema ku ez kesayetiya hevalê Çekdar li gel vê rastiyê dinirxînim, xwezaya Botanê jî di kesayetiya wî de dibînim. Ew qasî dişibin hev. Xwezaya Botanê jî di kesayetiya hevalê Çekdar de zindî bû.

Jixwe em dizanin, Botan cihek kevnar û dîrokî ye. Ji gelek şahristaniyan re dayiktî û malevanî kiriye. Her kevireke wê di xeyalên gelek lehengên Kurd de xew kiriye. Her dareke wê ya berû, ji bo hêviyên azadiyê bûye sîber. Cardin her kanî û çemên wê ji bo şorerşgeran bûne cihê jiyanê. Her gul û nêrgizên wê yên bedew, ji bo azadiyê bûne taceke zêrîn. Di bin her kevir û nebateke wê de giyaneke zindî heye. Di bin wan giyanewaran de bi hezaran şehîd hene. Ji bo wê di her bihareke wê de jiyaneke nû heye. Botan ciheke

wisa ye. Cihê Egîd û egîdiyan e. Ji bo xwe ti caran dagirkeriyê qebûl nake. Cihê hêvî û hêvîdayînê ye.

Min rêheval Çekdar li Botanê nas kir. Li gelek qadên Botanê em li gel hev man û me bi hev re kar da meşandin. Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de her çiqasî kêm jî bimînim, lê dîsa jî behsa wan bîranînan bikim.

Min di serê nivîsa xwe de jî got, mirovên qenc dişibin erdnîgariya xwe. Rêheval Çekdar jî, weke erdnîgariya xwe ya serhildêr bû. Gelek dişibiya ew ciwanên Cizîra Botan ku di demên Osmaniyan de, bi mêrxwasî şer dikirin û nedihiştin dijmin nêzî axa wan bibe. Jixwe ew jî ji Cizîra serhildêr a Botanê bû. Cizra Botan weke ku tê zanîn, di Botanê de ciheke dîrokî ye. Ji gelek şahristanî û împeretoriyan re dayîktî kiriye. Heta niha jî ji aliyê desthilatdaran ve her çiqasî tê wêrankirin jî, lê di cewherê xwe yê welatperweriyê de ti caran teslîmî dagirkeriyê û zordariyê nebûye. Jixwe me di pêvajoya rêveberiya cewherî de, di şexsê rêheval Mehmet Tunç û hevrêyên wî de jî ev yek dît. Cizîra Botan, teslîmî dagirkeriyê nebû. Û li hemberî zordariyê û mijokdariyê jî çong nedanî û daneyne.

Mirov li ser vî bingehî di kes de gelek baldariyên serhildêr dibîne. Çawa mirov ji dîroka xwe û ji ejdadê xwe çi digre, heman taybetmendî û sekin di kesayetiyê wan de dimîne? Û ji bo yên li peyrewên xwe re jî çi dihêlin? Ev yek mîna nifşekî dîrokî ye. Jixwe kes jî weke nifşeke dîrokî bixwe ye û encama wê yekê bixwe ne. Kes dikare wan taybetmendiyan bi xwe re nemir bike û her demê jî zindî bike. Giyan pir tişteke girîng e. Dema ku mirov behsa bêmiriniyê dike, mirov li vê derê dikeve nava lêgerînên azadiyê. Hinek mirov û kes hene bêmirin in û di heman demê de ji peyrewên xwe re jî nemiriniyê diafirînin. Ger ew zindîbûnî li ser bingeha giyanê azad hatibe bêmirin kirin û hatibe afirandin, wê demê mirov ji bo jiyaneke

azad her tim dijî û digihîje asta bêmiriniyê bixwe. Dibe ku di heman demê de ew kêlî neyên jiyîn, lê di têkoşîna azadiyê de, di dîroka têkoşîna 40 salan û şexsê şehîdên me de bêmirînî bi şêwazê serkeftinê re teqez bûye. Hinek rêhevalên cangorî bi şehadeta xwe ve dîrokê diafirînin. Bêmirînî bixwe jî kêliyên wisa ne.

Ger ku mirov li dîroka Botanê binêre, mirov roj û paşerojê dibîne. Ger ku em dîroka Bedirxanan û dîroka Mem û Zîn, gelek raperînên Kurdan weke ku behs tê kirin binêre, dewleta Osmaniyan di wê demê de dibêje, “cihê herî girîng û cihê herî kilîl Cizîra Botana ne. Ger ku me Cizîra Botan xiste destê xwe, em ê bikarin siyaseta xwe li her cihê Botanê serwer bikin û bandor bibin.” Jixwe weke ku dîrok jî behsê dike, di wê demê de Cizra Botan paytexta Kurdistanê ye. Û Osmanî dibêjin, “ger ku me karî siyaseta xwe di Cizîra Botanê de serbixin, wê demê em ê bikarin Musilê jî bêxini bin dagirkeriya xwe.”

Ew ciwanên ku li hemberî dagirkeriya Osmaniyan li ber xwe didan, çavkaniya giyanên xwe ji çi digirtin? Ji wê erdnîgariya kok û kesayetiyên bi kok digirtin. Kesayetiyên bi kok, weke axa xwe û weke erdê welatê xwe bi kok in. Û dişibin wê erdnîgariya kevn a dayika pîroz.

Û heval Çekdar jî ji vê kevneşopiyê dihat. Gelek caran dema ez li ser dîroka qehremaniya Botanê û Cizîra Botanê hinek tiştan dixwînim û dibihîsim, yekser şehîd Çekdar tê bîra min. Navê mirovan weke mirovan e. Di dîroka qehremaniyê de nav jî pir girîng in. Navê Çekdar, ne tinê weke şervanekî Çekdar bû. Ew di kesayetiya xwe de, bi rêbazê xwe, ji hemû aliyan ve Çekdar bû. Ew, her tim di nava şer û lekolînên mezin de bû. Min her tim kesayetiya hevalê Çekdar dişiband ava Dîcleyê. Dema ku te li rûyê wî dinêrî aramiyeke nerm hebû, lê dema ku wî bûyer û têgîn jî dinirxandin, li hemberî dijminê

xwe jî mîna ava Dîcleyê bi hêrs dibû. Dixwest bi wê hirsê xwe ve tola hezarî salan ji dijminê xwe rabike. Jixwe di kesayetiya wî de rastiya civakê her diyar dikir. Û di heman demê de temsîla rastiya koka xwe dikir. Weke ku min di hevokên pêş de jî dayî diyarkirin, mirov dişibin esil û kokên xwe. Kesayetiya hevalê Çekdar jî li gorî rastiya koka xwe bû. Weke ava Dîcleyê bedew û nazenîn bû. Wî kesayetiya xwe hemû ji nazenîniya bedewiya ava Dîcleyê girtibû. Weke din jî, ew lêgervanekî pir jîr bû. Di kesayetiya wî de her tim lêgerîn hebûn. Ev teybetmendiyên wî di asta şer û jiyanê de, di kesayetiya wî de her li pêş bû.

Weke ku tê zanîn berê ferasetê me li Botanê çibû, her tim me aliyek esas digirit. Bila milên me yên leşkerî û pratîkî xurt bin, ji bo me bes bû. Lê belê hevalê Çekdar ne wisa bû. Wî dixwest ji her aliyan ve xwe pêş bixîne. Û pir girîngî dida perwerdê û nirxandinên Rêbertiyê. Di vê mijarê de jî xwedî lêgerîn bû.  Dîsa li Gabarê, li gel hevalê Çekdar,  di wê pêvajoyê de komek hevalên ciwan jî hebûn. Di nav wê komê de hevalê Aslan hebû. Hevalê Aslan ji gundekê Hezexê bû, wekî din jî hevalê Piling û hevalê Maez hebûn. Ev hevalên temen ciwan her tim bi hev re bûn. Ew, ciwanên wisa bûn ku mirov di jiyan û pratîkê de ji wan hêz digirt. Hevaltiya wan bi hev re ji bo me her mînak bûn. Sekna wan ciwanan ji her alî ve mînak bûn. Kîjan heval ji derve dihat qadê, bala wan a yekemîn diçû ser wê koma ciwanan. Ew ciwanên wisa bûn ku mirov ji wan moral digirt. Heval Gelhat û heval Erdal jî di nav wan de bûn. Dema ku dihatin gel hev, ji nifşekê ve nûjen û farmandariya pêşerojê dihat bîra mirov. Bi rastî ciwanên mîna agir bûn. Çawa ku tu agir berdî her derî bişewitinî, teybetmendiyên wan jî her wisa bûn. Li hemberî dijmin jî ewqasî bi kîn û bi nefret bûn. Dema ku bi wê kîn û nefretê diçûn ser dijmin, dijmin li hemberî wan nedigihişt armancên xwe. Kesayetiyên wan ew qasî li hemberî dagirkeriya dijmin bi hêrs bûn. Beriya hevalê Çekdar

şehîd bikeve, gelek ji wan hevalên ciwan, di cihên cuda de bi giyanê berxwedanê tevlî kerwanê şehîdan bûn. Ez dixwazim di şexsê rêheval Çekdar de wan rêhevalan jî bibîrbînim.

Di nava wan komên hevalên ciwan de, kesayetiya rêheval Çekdar her diyar bû. Kesayeta wî ew qasî diyar bû ku kesayetiya wî xwedî teybetmendiyên cuda bû. Di heman demê de jî teybetmendiyên kesayetiya wî di nav gelek ezmûnan de hatibû hûnandin û hatibû pijandin. Dîsa ew xwediyê gelek teybetmendiyên cihêreng bû. Wî, her tim di kesayetiya xwe de ew giranî û ew giyan dida nîşandan, mirovên li derdora wî, ji wî re rêz û hezkirina xwe didan diyarkirin. Hinek teybetmendiyên hevalê Çekdar hebûn, hêvî dida avakirin. Te bixwesta û nexwestibûna jî bendewariya mirovan ji bo xwe dida çêkirin. Di kesayetiya wî de her tim bendewarî hebû. Ew her cihê hêvî û baweriyê bû. Cihê ku ew lêbû, hêvî li wir hebû. Wî, ji bo derdor û hevalên xwe her dem hêvî dida afirandin. Bi vê kesayetiya xwe ve dihişt ku mirov her tim ji wî bendewar be. Ev teybetmendiyên wî, çavkaniya xwe ji danehevên wî yên kûr digirt. Di kesayetiya hevalê Çekdar de hafiza civakî ya nû hebû. Ew xwedî hişmediyeke kûr û çêker bû. Ew teybetmendiyên xwe ji bingehên xwe yên dîrokî digirt.

Weke ku em dizanin, dijmin dagirkeriya xwe li her qadên Kurdistanê û li Botanê jî, siyaseta xwe ya mijokdarî û mêtîngeriyê, siyaseta xwe ya îmha û înkarê li ser mirovên wê bi şêwazeke cuda dide meşandin. Dijmin dixwaze mirovan li wê derê jî ji bo xwe bêxe kole.

Rêheval Çekdar, di ferqa vê hişmendiya mijokdariyê de bû. Weke din jî ew li ser van mijaran xwedî zanebûneke bingehîn û xwediyê têkoşîneke xurt bû. Ji bo ku rastiya dîrokê di kesayetiya wî de winda nebe, ew her tim di nava têkoşînê de bû.

Dîsa têkoşînekî wî ya girêdayî çanda xwe hebû, wî ti caran kesayetiya xwe jibîr nedikir. Ya herî girîng mirov koka xwe jibîr neke. Divê mirov, paşeroja xwe di kesayetiya xwe de zindî bike. Û li ser mîrateya bapîr û dapîrên xwe berdewam bike. Hemû serpêhatî, çîrok, destanên herêma wî di kesayetiya wî de bandor bûn. Ev teybetmendî bingehê xwe ji çi digire, bêguman ji kesayetên pêşeng û yên ku meraqa wan a dîrokî li pêş û dixwazin di kêliyan de xwe biguherînin digire. Dîsa ew tiştên ku berê di dîrokê de hatibûn jiyîn, ji aliyê deshilatdariyan ve dihat înkar kirin, kesên ku xwe di paşverûtiyê de dubare dikin; kesayetiya rêhevalê Çekdar li hemberî wê sekeneke herî bingehîn bû. Ji bo wê dema ku zîhniyet di kes de hat guhertin; wê demê ew kes wê her tim di nava lêgerînan de be.

Teybetmendiya herî balkêş a rêhevalê Çekdar çi bû? Wî dixwest zana bibe. Jixwe xwe zanîn dayika hemû zanista ye. Wî, gelek ji zanînê hez dikir. Û ew her tim li pê zanîna xwe bû. Her wiha wî xwe berpisiyarê gelek tiştan didît. Ya herî girîng jî dixwest tola hemû çewisandinên ji aliyê dijmin ve li ser gelê Kurd hatine meşandin rabike. Ev teybetmendiyên wiha di kesayetiya kî/kê de tên dîtin, ev taybetmendî herî zêdetir li gel wan kesên pêşeng ku bi xwe re kêliyên azadiyê didin afirandin tên dîtin. Bi taybet jî li cem wan kesên ku hafizaya civakê di kesayetiya xwe de nûjen dikin, tê dîtin. Rêhevalê Çekdar jî pêşengeke wisa bû. Ez vê xalê pir girîng dibînim. Her mirovên girîng ên bedelên zor didin, dikarin giyanê xwe jî feda bikin. Bêguman ew kesin ku ji bo dîroka wan nûjen bibe, her tim li pêy jiyaneke rûmet dibezin. Herî zêdetir ev kesayet dikarin di nava civak û dîrokê de guhertin û veguhertinê bidin pêşxistin. Û her wiha kesên ku derdorên xwe diguherînin, bi teqez dikarin rêxistinkirinê bidin avakirin. Rêhevalê Çekdar di wê demê de xwediyê vê danaheva rêxistinî bû.

Di kesayetiya rêhevalê Çekdar de dîrokeke nepenî hebû. Ew êşa ku di dîrokê de hatibû jiyankirin, dîroka ku ji rastiya xwe hatibû dûrxistin, neqebûl kirina wî ji vê yekê re, ew evîna Kurd a ku hatibû winda kirin, di kesayetiya wî de dihat vedan. Li hemberî vê yekê tol girtin, neqebûl kirina koçberkirin û mişextiya Kurdan ku dihişt Kurd ji rastiya xwe xerîb bikeve re nefret dikir. Hevalê Çekdar li hemberî vê di nava têkoşîneke bêhempa de bû. Mirov, tevayî van êş û janan bi hêsanî dikarîbû di nêrînên çavên wî de hîs bike û bidîta. Pir carînan ew nêrandinên çavê wî wisa kûr diçûn, mîna ku bikeve di nav aveke zeryayê de, ew qasî jidil êşên gelê xwe û welatê xwe hîs dikir. Di dîmenê nav çavên wî de jî mirov giyanê tolhildanê didît. Wî, ji dîroka xwe ya êş re wiha qîr dikir; “Wê çarenûsa te her tim dubare nebe! Em ê te biguherînin! Tu yê êdî di çîrokên bi êş de neyê bi lêv kirin! Em ê ji axa te bihuşteke hişînahî, gul û nêrgîzan çêbikin! Û êdî wê çarenûsa te bi azadiyê bê xemilandin!” Wî, li ser vî bingehî roj bi roj xwe diafirand. Pir carînan me bi hev re li ser peywirên çalakiyan nîqaş û plansaziyên xwe çêdikirin. Peyva ku wê nabe, wê ev kar neyê meşandin li gel wî nebû. Her tim, di nav wan şert û mercên zehmet de li gel wî serkeftin hebû.

Wî, pir ji Gabarê hez dikir. Pir carînan min bi henekî ji wî re digot; “ji ber ku Cizîra Botan nêzî Gabarê ye ji bo wê tu pir jê hez dikî.” Bersiva gotina wî ya xweş jî wiha bû; “ji bo min qadên Botan hemû mîna hev in. Ger ku me karî di Botanê de serkeftinê teqez bikin, wê demê em ê bikarin li hemû qadên Kurdistana zêrîn serkeftinê bi misoger bikin. Ji ber ku Botan warê Egîdan e.” Dema ku ez niha li ser wan gotinên hevalê Çekdar dihizirim ne gotinên asayî bûn. Bi rastî jî Botan warê Egîdan e. Warê Adilan, Reşîdan, Erdalan û bi hezaran mêrxwasên mîna rêhevalê Çekdar bûn. Îro jî li ser şopdariya wan mêrxwas û Egîdan, di şexsê rêheval Mehmet Tunç û şehîdên Cizîra Botanê de jî hat dîtin. Botanê di kesayetiya wan

lehengan de li ber xwe da û li ber xwe dide jî. Li hemberî hovîtiya çeteyên Erdoğan jî, serî netewandin. Botan, niha li hemberî hemû şertan li ber xwe dide. Ji bo wê hevalê Çekdar xwedî vê mîrasa mezin e. Xwedî nirxeke berxwedêr û kevnar e. Ev nirxên civakî her dem mirovên xwe mezin û jîr dikin. Û li gorî dem û dîrokan pêşengên xwe diafirînin. Hevalê Çekdar jî yek ji wan pêşengan bû. Bi rastî jî pêşeng bû.

Ew, di hevalbendiya xwe û jiyanê de jî her pêşeng bû. Di têkiliyên hevalbendiyê de mirov ti caran jê aciz nedibû. Teybetmendiyên wî yên empatî û sempatîk gelek li pêş bûn. Ji bo derdora xwe ava bike, her tim bal dikişand ser xwe. Bi sekna xwe ve bal dibir ser kesayetiya xwe. Jixwe yên ku hebûna xwe bi seknên xwe yên rêxistînî didin diyar kirin, çavkaniya xwe ji teybetmendiyên azadiyê digirin. Mirov çiqasî bi azadî bîr bike, mirov wê ewqasî jî azad bijî. Sekna rêhevalê Çekdar jî wisa bû. Wî tiştek ji azadiyê cudatir nedifikirî.

Cardin ji yek teybetmendiyên wî yên balkêş serhêldêriya wî bû. Dema ku wî xwe ji bo çalakiyan amade dikir, wê demê ji nêrandinên çavên wî toleke dîrokî dibariya. Li gel vê tola dîrokî jî jiyaneke nû hebû. Ji ber ku dîrok zindî ye. Û li gel xwe jî meyzandinan zindî dike. Dema ku hevalê Çekdar di çalakiyan de rext û çekên xwe li pişta xwe girêdidan, kefiya xwe jî li dora qirika xwe girêdida, wê demê ez diçûm dîmeneke ji rabirdûyê. Di rabirdûyê de suwariyên Kurdan ên çawa ku xwe bi çekan dixemilandin û li pêş artêşa xwe diketin û diçûn ser dijminên Kurdan, heman dîmen ji bo kesayetiya rêhevalê Çekdar dubare dibû. Ew jî suwariyeke jîr û zîrek bû. Jixwe me gotibû dîrok xwe di kesayetiyan de nûjen û zindî dike.

Cardin em rojekê li Çiyayê Bizina bûn. Li wê derê Kelha Finikê heye. Kelha Finikê jî dîrokekî xwe ya kevnar heye. Navê kelhê berê

Findê bûye. Li gorî gotinên xelkê digotin, a ku ew Kelh û Gabar rêve dibir jinek bi navê Findê bûye. Ger ku ez ne şaş bim, di serdema Mîr û Began de jiyaye. Çawa ku roja îro, dewlet û çeteyên AKP'ê weke paşmayê wê demê erdnîgariya Kurdistanê û welatê Kurdan wêran û talan dikin û cihê rêveberiya xweseriya demokratîk, li ber çavê cîhana qirnê 21. bi şêwazeke faşîzane qayumên xwe bi cih dikin, wê demê jî dewleta Osmaniyan, bi rêbazên cur be cur bac ji Beg û eşîrên Kurdan digirt, hem jî zilamên xwe li ser heremên Kurdan dixist muxtar û qeymeqam.

Dema ku te li ser Kelha Finikê dinêrî, li jêrê dîmenên Deşta Gabarê, Ava Dîcleyê, hemû cih diyar dibin. Û heta Endîwer û Dêrîka Hemko jî tê dîtin. Jixwe mirov nikare pênaseya bihara wê jî bike. Ji ber ku ew qasî bedewe ku bi keskahiya xwe, gul û gulîlkên xwe ve û bi hemû gund û bajarê xwe bedew dike. Ger mirov bibêje, bihuştek li ser cîhan û Kurdistanê hebe, li vê derê ye dê rast be. Ew qasî bedew û ciwan e. Ew Deşta Gabarê jî weke zeryayekê kesk dibe û Cizîra Botanê jî weke dûrgehekî bi serê xwe di nav de diyar dibe.

Di wê demê de rê ne diçû Kelhê, mirovên ku dixwestin biçin Cizîrê, pêwîst bû di biniya Kiryareş re wisa biziviriyan Cûdî. Daku wisa biçûbûna ser Pira Cizîrê. Vê rêyê jî, digrin. Hemû rêyên ku diçin Kelhê jî dixin çemberê. Li gorî xelkê wê derê, ew çîroka Findê wisa behsê dikirin; "Kesek ji aliyê Osmaniyan ve ji bo wê qadê hatiye tayînkirin. Findê ji bo ku gelê xwe û axa xwe biparêze serî li gelek rêbazên cuda cuda dide.

Rojek ji rojan, ji bo ew kesê hatî ku ser qadê bixapîne, rexmê ku tevî gelê wê herêmê jî birçî ne, lê li ber xwe didin. Lê belê Findê jî neçare ku wê şêwaza dihizire bi cih bîne. Findê jî dixwaze bi planên cuda dijminê xwe bêxe nava xefkê de. Di wê demê de jî dêlika wan cewrikan tîne. Şîrê seyî tînin û li gel çend pîvazên ku di bin embara

genim de mayî, têxin mast û ji wî berpisiyarî re dişînin. Cardin darên ku gel ji bo xwe kom kirine, hemûyan dişewitînin û xweliya wê li serê Kelhê weke baranê dibarînin. Ew kesê ku ji aliyê Osmaniyan ve hatiye şandin ji bo qada wan, dema ku wî dukelê li ser Kelhê dibîne ji xwe re dibêje; "diyare wan nû embarê xwe yên gemin vekirîne" û bi vî awayî di nava sosretê de matmayî dimîne. Jîrbûna Findê bi vê rêbaza xwe ya jêhatî ve gelê xwe yê Kelhê ji rêveberiya Osmaniyan rizgar dike.

Gelek caran dema em di dîroka jinê de behsa jinên navdar dikin, Findê tê bîra min. Jîrbûn û jêhatîbûna wê jinê neqebûlkirina dagirkeriya dijmin dide diyarkirin. Dibe ku çîrok weke niviskî nehatibe nivîsandin, her tim weke devokî hatibe gotin; lê ev çîrok di bingehê xwe de ji me re çi dide vegotin, giyana jinên wê derê yên serhildêr tîne bîra mirov. Weke din jî çi dide diyar kirin; bi vî awayî gelê Cizîra Botanê nakeve bin serweriya dewleta Osmaniyan. Û li hemberî zilm û dagirkeriya Osmaniyan li ber xwe dide.

Li ser çîroka Findê me li gel heval Çekdar gelek caran henek dikir, wî digot: "ev jina zîrek, jîr û jêhatî teqez Bedirxanî ye." Me jî digot; "Ger ku Bedirxaniyeke li wê derê hebe jî bi teqez ji aliyê Osmaniyan ve ji bo qadê hatiye tayîn kirin û şandin. Jixwe bapirê te ji berê ve dijminê jinan e." Bi wan henek û sohbetên me yên xweş kenên li ser lêvên me li ser Kelha Findê deng vedida. Kenê wî jî weke hêviyên wî di nava nepeniyeke cuda de bû. Her dema ku dikeniya ji rûyê wî yê ciwan, nûr jê dibarî. Dema ku dikenî di nava kenê wî de beşîşînên ken dibiriqîn.

Dîsa li gel heval Çekdar hevalê Piling û hevalê Gelhat û hevalê Loqman hebûn. Ew koma ciwanên ku min di destpêka nivîsa xwe de jî behsa wan kiribû hebû. Hevalên me di wê demê de pirtûkên ji dahûrandinên Rêber Apo hatî nivîsîn li gel xwe radikirin û her tim

dixwendin. Hevalan di wê demê de hinek pirtûkên biçûk ên bêrîkan ji dahûrandinên Rêber Apo didan çêkirin. Dema ku dibêjin, "hevalan berê li Botanê pirtûk nedixwendin" ev agahî zêde ne di cihê xwe de ye. Her tim li gel hinek hevalan pirtûkên Rêbertiyê hebûn. Li gel vê koma me ya ciwan jî her dayîm pirtûk û dahûrandinên Rêbertiyê di çenteyên wan de dihatin peyda kirin. Wan hevalên ciwan jî ew pirtûk mîna çavên xwe diparastin û her tim dixwendin.

Li vê derê ez dixwazim bibêjim, koka hevalê Çekdar xwe dispêre dîrokê. Bi rastî di rastiya dîroka xwe de xwedî zanistekî jîr bû. Wî pir meraqa dirokê dikir. Weke ku ji dîroka dapîr û bapîrên xwe yên rabirdûyê re bibêje: "tiştên ku we dubare kirin ez ê nejîm. Ez ê weke we neçim Şamê û Stenbolê. Ez ê li ser kevneşopiya dapîr û bapîrên xwe û li ser erdnîgariya xwe têkoşînek mezin bidim û bêhempa bijîm. Ez ê bi çekdariya xwe ve bibim Çekdarê vê axê." Min her tim di giyanê wî de giyanê tolhildanê didît.

Wî pir ji Botanê hez dikir. Lê ew hezkirina wî ne hezkirineke herêmî bû. Hezkirina wî girêdayî koka wî bû. Ew di ferqa hebûna xwe de bû. Wî dizanî çi li ser van xakên pîroz hatiye winda kirin, yan jî çi hatiye jibîrkirin. Yan jî çi hatiye înkarkirin. Dîsa yek ji wan teybetmendiyên wî yên ku pir bala min dikişand, dema ku em diçûn keşfa çalakiyan dûrbîna keşfê dixist destên xwe û bi baldarî li cihê dijmin dinêrî. Nêrandinên ku dinêrî ne nêrandinên asayî bûn. Wî pir dijwar, hesas û bi ziravî lê dinêrî. Bi her nêrînekî wî weke ku di nav pevçûneke mezin de bû, dimeyzand. Bi rastî jî kesayetiya wî di nava pevçûneke mezin de bû.

Ew bi rastî pêşengê gelê xwe bû. Wî ji her alî ve hewl dida ku kesayetiya xwe pêşbixîne. Ew, roj bi roj pêş diket û dibû pêşengê gelê xwe. Ev teybetmendiyên wî bala hemû hevalan dikişandin. Li ser vî bingehî dema ku ew li ser yekîneyê bû ji bo qada Rêbertî hat

şandin. Di wê demê hevalên ku diçûn qada Rêbertiyê li ser van mercan diçûn: Piwîst bû ji her alî ve xwediyê teybetmendiyên rêxistinî û ji pêşketinê re vekirîbûna. Heval Çekdar jî xwedî vê hêzê û van teybetmendiyan bû.

Piştî wê demê şûnve min û heval Çekdar me hev nedît. Di dawiya sala 1996'an de ez derbasî Akademiya Rêbertiyê bûm. Di sala 1997'an de komek heval ji Botanê hatibûn. Di wê demê de jî ez derbasî mala hevalên jin a lêhûrbûnê bûbûm. Dema ku Rêber Apo hat gel me, Rêbertî ji min pirsî, got "komek heval ji Botanê hatine, ez ê navê wan bibêjim, ma tu yê wan nas bikî, an na?" Rêbertiyê ji min pirsî. "Belê Serokê min." Pişre Rêbertiyê navê hevalê Reşîd û navên çend hevalên din rêz kir, herî dawiyê got; "Ma tu Çekdar jî nas dikî?" Min jî got; "Belê Serokê min. Ger ku Çekdarê Cizîrî be ez wî xweş nas dikim."

Rêbertiyê got; "Ew yekî çawa ye? Ew yekî şerker diyar e, ma wê tiştek ji wî derbikeve?"

H. Melsa: "Ciwanekî cudaye û gelekî jî jîr e."

Rêbertî: "Jixwe min jî tam wisa dît. Ji bo me jî eleqeyekî wî zêde heye. Min jî cudabûneke xweser di kesayetiya wî de dît. Ji pêşketinê re jî vekiriye. Li ser vî bingehî min vesazbûna wî di koma ewlekariya xwe de çêkiriye."

Bi giştî komên ku ji qadên welat hatibûn, ji bo tevlî konferansê bibin hatibûn qada Rêbertiyê. Rêbertî bi şêwazeke xweser kom bi kom ji bo qadan perwerde dida û amade dikir. Weke koma Botanê em jî hemû hatibûn gel hev. Em ketibûn wê giraniyê, hîn zêdetir bûyer û diyarde ji hevdu derdixistin. Dîsa Rêbertiyê dixwest weke fermandarekî taktîkî hevalê Çekdar bide pêşxistin.

Weke ku di hevpeyvînên heval Çekdar ên bi Rêbertî re jî tê dîtin, Rêbertî li ser vî bingehî hinek taybet nêzî hevalê Çekdar dibû û dixwest pêşiya wî veke. Rêbertiyê, li ser rastiya Botanê dixwast wî

hîn pitir bide kûrkirin. Hevalê Çekdar di Akademiya Rêber Apo de gelek guherandinên bingehîn di kesayetiya xwe de dan pêş xistin. Ji bo lêgerînên wî û hêviyên wî zemîneke baş hatibû avakirin. Wî jî ev yek ji bo xwe şansê herî mezin didît. Rêber Apo jî dema ev lêgerîn di kesayetiya hevalê Çekdar de dît, hîn zêdetir ew teşvîqî mîlîtaniya mezin û fermandariya nûjen dikir. Hevalê Çekdar jî di ferqa vê mîsyonê de bû, li ser vî bingehî bi hemû hêza xwe ve hewl dida xwedî li keda Rêbertiyê derbikeve.

Rêbertiyê dixwast di kesayetiya heval Çekdar de ew felsefeya tîpê Kurdê koçberkirî, windakirî û bêhêvîbûyî vala derbixîne. Ew çarenûsa ku di dîrokê de li ser bapîrê wî, yan jî li ser malbata Bedirxaniyan jiyayî, bi mîlîtaniya hemdem re û bi fermandariyeke nûjen re di şexsê wî de bide avakirin. Heval Çekdar jî di giraniya vê mîsyonê de bû. Di hemû tevgera xwe ya jiyanê de û di nêzîkatiya xwe ya hevaltiyê de ev mîsyon di kesayetiya xwe de dida diyarkirin.

Dîsa Rêbertiyê li ser Destana Mem û Zîn jî bi heval Çekdar re gotûbêj dikir. Rêbertiyê di gotûbêjên xwe de digot: “Êdî pêwîst e li welatê Kurdan em nehêlin Beko bên jiyîn. Me di şexsê Zîlan û Bêrîtanan de evîna Kurdê azad afirandiye. Hûn jî divê li ser rêbazên wan berdewam bikin û bijîn. Êdî pêwîste evînên Kurdan bi şewat û bi xiyanetê bi encam nebin.”

Dîsa Rêbertiyê dixwest, di kesayetiyê wî de ew hestên penaberiya malbata wî ji holê bide rakirin. Ji bo ku bikaribe têkoşîna hatî dayîn û li gel vê têkoşîna hemdem watedar bike.

Li Akademiya Rêbertiyê, bi rojane di kesayetiya xwe de guhertin dida çêkirin. Ew jî êdî di ferqa vê yekê de bû. Êdî mîna berê jiyankirin û şerkirin ji wî re nedihat pejirandin, ji bo wî hêviyên mezin hebûn, pêwîst bû di vê çerçoveyê de xwe bida pêşxistin û ji wan hêviyan re bibûya bersiv.

Hevaletiya wî bi hevalên jin re jî li ser pîvanên rêxistinî bû. Li hemberî hevalên jin pir rêzdar bû. Azadiya jinê weke rêgezeke jiyanî digirt dest. Ew, di jiyanê de pir hişyar bû. Ew, di parastina nirxên rêxistinê de miroveke mînak bû. Ji bo wî nirxên rêxistinê li pêşiya

hemû tiştan bûn. Teybetmendiyên wî yên fermandariyê jî bi heman şêwazî bûn. Ew yekî gelek wêrek bû. Ew, di hemû tişt û karî de wêrek bû. Di jiyan û şer de jî wêrek bû. Ew, di karê xwe de yekî pir bi baldar bû. Karê ku wî dikir, heta ku wî karî xelas nekirîbûna dev ji wî karî bernedida. Ew qasî yekî bi baldar bû. Wî, di jiyanê de jî her tim hebûna xwe dida hîs kirin. Ev taybetmendiyên wî her tim ji aliyê derdor ve dihatin hezkirin. Ev taybetmendiyên wî ji xwebûna wî dihatin. Ji ber ku ew mirovek xwedî vîn bû. Ew cewherê ku ji çanda Botanê girtibû, hîn bi wî re mabû û pêre dihat berdewamkirin. Ew cewherê ku hîn neketibû bin desthilatiya serdestiyê û neheliyabû. Kesayetiya wî hîn pir paqij mabû. Di şêwazê jiyana wî de jî ev taybetmendiyên wî her derdiketin pêş.

Ew, ji bo min ji yek wan hevalên ku ez di jiyana xwe ya têkoşînê de her tim bîrbînim û ti caran ji bîr nekim e. Dîsa ji bo min hevalê Çekdar ji yek wan hevalan bû ku ez ji kesayetiya wî û hevaltiya wî gelek bandor dibûm. Dema ku min bîhîst şehîd ketiye, ez gelek êşiyam û gelek jî pê bandor bûm. Ji ber ku me gelek pêvajoyên zehmet bi hev re derbaskiribûn, di herî dawiyê de jî li Akademiya Rêbertiyê em bi hev re mabûn. Ji bo wê ez gelek ji şehadeta wî xemgîn bûm. Li gel çend hevalên din jî hevaltiyeke me ya menewî hebû. Hevalê Ezîz jî ji yek wan hevrêyan bû. Rêbertiyê bi wan hevalan re kededeke mezin dabû. Dîsa di hevaltiya me de biryarbûneke li ser pîvanên azadiyê hatibû çêkirin li pêş bû. Di pratîk û kesayetiyên me de wê didulî neyê jiyîn. Di hemû nîqaşên me de ev biyarbûna me her li pêş bû. Weke koma Botanê li ser vî bingehî me soz dabû hev. Hevalê Çekdar, ji me re digot: “Divê em jî weke koma hevalê Ezîz xwedî biryarbûneke mezin biçin Botanê. Ew çû Mêrdînê, em ê jî biçin Botanê. Em ê car û caran li ser Ava Dîcleyê nameyan ji hev re bişînin.”

Min berê xwe dayê û ez keniyam. Min ji wî re got: “Çawa li ser Ava Dîcleyê tuyê nameyan ji hevalê Ezîz re rêbikî?” Wî jî got: “Rêbazên me hene, hevala Melsa. Em ê rêbazên Feqê Teyran bikarbînin. Feqê teyran jî gelek nameyên xwe li ser Ava Dîcleyê rêdike ji heval û dostên xwe re.” Ji ber vê Feqiyê Teyran bi hêsanî bi hemû ajal û zindiyên xwezayê re daxivî. Baweriya axaftina bi

zindiyan re di Kurdan de mijarek mîtolojîk e. Ev xal divê li gorî mijarên sûrealîst neyê fêm kirin. Ev yek mijarek çandî û civakî ye. Pênaseyeke ji aliyê mirov ve ku çawa ajalan dibînê bixwe ye. Nirx dayîneke xwezayê û xwesteka kirina hevaltiyê ya bi ajalan re ye.

Yekem car min çîroka Feqê Teyran ji hevalê Çekdar dibihîst. Ew, ji aliyê wêjeya Kurdî ve jî xwedî zanyariyeke baş bû. Dema ku wî jiyan jî dikir her pêşeng bû, piştî şehadeta xwe, navê xwe li dîrokê xist û xwe nemir kir. Mina ku min di serî de jî got, ji bo vî welatê rojê, di şexsê hemû şehîdên me yên azadiyê de hinek mirov hene bêmirin in. Ji ber ku ev nemirin; dibin ax, dibin gul, dibin nêrgîz û beybûn, dibin nebatên herî bedew, li her bihareke li vî welatê rojê, ji bo azadiyê dibin jiyaneke nû.

**Melsa Botan**

“Hey qulongo xwe ne westîne,
Perr û baskan her hîlîne
Herre, ji xwezayê ji min re giliyan bîne,
Îro li ser rêyan ez rêwî me,
Tu li hewa xweş cibar be,
Ser gaz û geldûka bilind xwar be,
Hema ji te re dilê min hişyar be.
Hey mal xirab, tu guhdar ke,
Perr û baskan li ser min sî ke,
Min jî digel xwe rêwî ke,
Çend giliyan li min safî ke

**Feqê Teyran**



“Û şer, ji bo me perwerdehiya azadiyê dide. Azadî çi ye? Xwesteka berpisiyaritiya kes bixwe ye. Parastina hebûna me ya ku em ji hev dûr xistine. Li hemberî zoriyê, zordestiyê, li hemberî birçîbûnê û penaberiyê, heta li hemberî jiyanê parastina hebûna mirov e. Mirovê herî azad şervan bixwe ye.”

**Nietzsche**

## **Ew** Ji Bo Min Rêhevalê Azadiyê Bû

Weke ku tê zanîn yekemîn berxwedana mezin a Cizîrê, bi şehîd Bêrîvanê re dest pê kir. Têkoşîna rêheval Bêrîvan ji bo gelê Cizîrê dengê azadiyê bû. Me bi wî dengê berxwedêr a şehîd Bêrîvan, tevgera azadiyê nas kir û weke mîlîseke çalak em tevlî kar bûn. Her çiqas weke malbat kevneşopiyên me yên welatperwerî hebûn jî, lê belê em bi naskirina tevgera azadiyê ve hîn zêdetir ketin ferqa hebûna xwe ya azadiyê.

Ew salên serhildanan, salên zor û dijwar bûn. Dijmin bi hovane û bi armanca qirkirinê dihat ser gelê Kurd. Di pêvajoya serhildanan de, di kuçe û kolanên Cizîrê de her roj bê navber gelê Cizîrê li hemberî dewleta Tirkan di nava hevçûnê de bû. Şehîdên me çêdibûn, gel li ber xwe dida. Gel bi çi awayekê li hemberî dijmin serî neditewand.

Li ser wê kevneşopiyê û mîrasa Serhildana Cizîrê, gelê Cizîra Botanê di zivistana 2015 û 2016'an de jî, di bin pêşengatiya hevalên Mehmet Tunç û Asya Yuksel û heval Ruken de li hemberî neyarên hov ên gelê Kurd û Cizîra Botanê, li hemberî dagirkerî û hovîtiya dewleta Tirk çong nedanî û bêhempa li ber çavê cîhana kerr, ji bo mirovatiyê li ber xwe da. Berxwedana Cizîrê, bi berxwedana Sûr, Şirnex, Nisêbîn û bi giyanê Çiyageran ve careke din hêviya têkoşîna gelê Kurd ji bo azadiyê hîn zêdetir bi hêztir kir.

Hevalê Çekdar, ji nava malbateke welatparêz, xwedî kevneşopiyên têkoşînê û ronakbîriyê çavên xwe li dinê vedike. Bi giyanên serhildanan ve kesayetiya xwe nas kir û bi wî giyanî jî mezin bû. Ew, hîn di zaroktiya xwe de zarokekî cuda bû. Ew, her tim li pey şopa rastiyê digeriya. Neheqiya dewletê li ser gel dikir, an jî neheqiya ku di nava civakê de û di nav malbatan de dihat kirin bi wî re bertekên gelek zêde didan çêkirin. Di salên xwe yên dibistanê de jî wisa bû. Ew, mirovekî gelek aram bû, lê dema dihat xwestin li hemberî neheqiyê serî neditewand. Di malbatê de, di nava çend xwişkan de, kurê malbatê yê tenê bû. Ji bo wê ji aliyê malbatê ve

gelek nazdar û bi delalî hatibû mezin kirin. Kesayetiya wî ji bo min mirovek gelek bi taybet bû.

Lê dema ku ew ket ferqa hebûna xwe, wî ev nêzîkatiyên heyî ji bo xwe teng didît û qebûl nedikirin. Piştî ku di nava dibistana navendî û amadeyî de, naskirina wî bi karê tevgerê û hevalan re çêdibe, hîn zêdetir dibe xwedî nêrîn û hizirandinên cuda û bi çalak tevlî kar dibe. Ew, di nava karê xwendekaran de xwedî roleke girîng bû. Gelek tiştên ku me nedikarî bi cih bînin, heval Çekdar bêyî ku bitirse û dudilî nêz bibe, ew kar bi serkeftinî bi dawî dikir. Ew, xwediyê baweriyeke wisa bû. Ew, bi hêvî û bawerî tevlî her karî dibû.

Di sala 1994'an de bi vê hêza xwe ya hêvî û baweriya ji tevgera azadiya gelê Kurd re tevlî refên gerîla dibe. Piştî demekê şûn ve bi zehmetiyên çiyayên azad re xwe kir yek. Pir caran dema ku ji bo peywirê em diçûn gel hevalên çiyayê Cûdî, dema ku derfet çêbûbûna, min ew didît. Weke ku hevalên wî jî qal dikirin, ew gelekî jêhatî û zîrek bûbû. Bi rastî gerîlayek û fermandarekî gelek jîr û jêhatî jê derketibû.

Hîn zêdetir ketibû ferqa hişmendiya hebûna xwe. Bi vê zanistiyê ve ji bo azadiya gelê xwe û gelê Cizîra Botan, wê gelê wî bi têkoşîneke çawa bê rizgar kirin, dîsa wê bibe pêşengekî çawa, ev yek di kesayetia xwe de dida raberkirin.  Ew, di vê mijarê de xwedî lêgerînek xurt bû.

Piştî ku ez derbasî Rojavayê Kurdistanê bûm, herî dawiyê min Şehîd Çekdar li qada Rêber Apo dît. Dema ku hat qada Rêber Apo, ez û dayika xwe ya rehmetî, em çûn hevdîtina wî. Bi wesîla têkoşîna Şehîd Çekdar wê jî bibîr tînim. Ew jî dayikek û jinek têkoşer a Cizîra Botanê bû.

Ew, li qada perwerdehiya Rêber Apo baş dihizîrî. Di lêgerînên wî de angaşteke wî ya mezin a şorşgerî hebû. Ji bo wê wî dixwast xwe baş pêşbixîne, ji bo ku bikaribe xwedî keda Rêber Apo derbikeve û bibe mîlîtanekî baş.

Ez jî weke heval û xalê hevalê Çekdar, heta ku ji destên me tê ji bo azadiya gelê Kurd, em ê li ser şopa şehîd Çekdar bimeşin. Û em ê heta dawî hewl bidin ku xwedî li têkoşîna wî derbikkevin.

**Seîd (Xalê Ş. Çekdar)**

## Çavên Wî Her Tim Bi Hestên Tejî Li Azadiyê Dinêrîn

Cih û mekanên ku me herî zêde serhildêriya Kurdbûnê û serbilindiya jinbûnê lê dijiya yek jî qada Serokatiya Partiyê bû. Ev der, di heman demê de Dibistana Navendî Ya Partiyê bû jî. Sal û meh 15’ê Tebaxa 1997’an bû. Dibistanê, baxçeyeke wê yê fireh hebû. Û di nava wî baxçeyî de jî weke baxçeyê xwaringehê ku dihat bi nav kirin, daîreyekî wê ya fireh hebû. Cihekî ku hevalên jin ji aliyekê ve dirûniştin û hevalên mêr jî li aliyekê ve dirûniştin hebû. Di naverasta wî cihî de jî cihê ku dîwan, wane lêdihat dayîn hebû. Dîsa heman cih bû ku Serokatiya Partiyê dihat lê dahûrandin çêdikirin. Li paş Serokatiyê dareke bedew û mezin hebû. Û ew dar gelekî mezin bû. Serokatî car û caran destê xwe davêt wê darê û wisa nirxandinên xwe dikirin. Pişre jî tu ji xaringehê derdikevî, ew rêga kin a xîz bû ku hevalan lê nîqaş dikirin derdiket pêşiya mirov û ew rê jî diçû cihê qada voleybol û futbolê. Dema ku tu derdiketî û te kampa yekemîn derbas dikir, tu diçûyî malên ku em lê diman. Piştî wan malan jî xwaringeh û cihê xwarinê hebû. Wargeha me ya perwerdeya Rêbertî gelekî bedew bû.

Ji bo qada Serokatî, ji her qadê heval ji bo perwerdê dihatin. Ji her cihê Kurdistanê, ji Awrûpa, ji Yewnanîstan, ji Tirkiyê, ji girtîgehê… Û ji xebatên cur be cur, ji her qadên xebatê komên hevalan hatibûn. Jimara me gelekê zêde bûbû.

Di nava wergeha perwerdehiyê de yên ku herî zêde baldikişandin, hevalên ku herî zêde me meraq dikirin, hevalên ku di çiyayan de gerîlatî kiribûn. Me di wê demê de ji wan re digot: “Hevalên ku ji welat hatibûn.” Ji çiyayê Dersîm, Serhat, Amed, Botan û Behdînan heval hatibûn. Hevalên ku di nava wargehê de bûn, hevalên ku ji qadên gerîla hatibûn û her wiha hewayê wan û rengê wan cuda bû. Me di wê wargehê de li wî cihê bi rûmet û pîroz, ji bo azadiya Kurdistanê serbilindiya Kurdbûnê û jinbûnê dijiya. Lê belê hevalên ku ji qada gerîla hatibûn, hem gerîlatî kiribûn, hem jî li gel dijmin ketibûn şer û hevçûnan. Wan rêhevalan ji me hîn zêdetir serbilindbûna Kurdê azad dijiyan û didan jiyandin.

Hevalên weke min ku nû tevlî partiyê bûbûn, wan hevalên ji gerîla hatibûn, pir bala wan dikişand. Her koma gerîla ji bo xweseriya

xwe derêxîne holê kom bi kom bi tevger digeriyan. Gerîlayên Zagorosê li aliyekê bûn, dîsa gerîlayên Botanê jî li aliyekê bûn. Lê belê dema ku em hatin di naverasta perwerdê de şêwazê tevgera kom bi komiyê di rojeva dahûrandinan de weke rojeveke eyaletgeriyê bûbû mijara rexne û rexnedayînê. Koma gerîlayên Zagorosê pir zêde bal dikişandin. Piştî koma Zagorosê, dîsa di nava wargehê de herî zêde koma gerîlayên Amedê bal dikişandin ser xwe. Peştre jî koma gerîlayên Botanê jî li gorî xweseriya xwe bal dikişand, koma gerîlayên Dersîmê jî her wisa bû, komên li Zapê jî hatibûn, ew jî her wisa bûn. Komên gerîla li gorî xweseriya xwe bûn. Yanî dengê wan yê weke sûlava çiyayên Zagorosan, wisa digotin: "Em dişibin wan erdnîgarî û çiyayên serhildêr ku me di tê de şer kiriye." Di jiyanê de jî bi serbilindî wisa nêzî her karî dibûn. Ji bo wê hevalên gerîla yên ku ji bo Botanê, Zagorosê, Dersimê bi taybet hatibûn, reng û hewayê wan cuda bû. Çiyayên Botanê weke ku tê zanîn di nava têkoşîna me de dîrokî ye. Ji gelek şeran re bûye mijarên roman û destanên evîna azad. Çiyayê gelek leheng û Egîda ne. Çiyayên Zagorosê jî gelek serhildêr û bi taybet in. Weke ku tê zanîn erdnîgariyeke herî zêde ku şer lê hatiye pêşxistin e. Çiyayên Dersimê jî cihê serhildan û berxwedanê ye. Û bi heybeta xwe bal kişandiye ser xwe û bûye evîndarê hezaran gerîlayan. Di her kêliyê de mirov dixwazin xwe bigihînin wî çiyayê bi heybet.

Bêguman di nava komên gerîla de sekna her hevalekî/ê cuda bû, xwedî xweseriyeke taybet bû jî. Lê belê di nav wan hevalan de hinek heval hîn pitir bal dikişandin ser xwe. Di nava wargeha perwerdehiyê de şêwaza jiyana hevalên gerîla pir balkêş bû. Hevalên ku ji Awrûpa û ji Tirkiyê hatibûn, hevalên ku ji bajêr hatibûn di navbera şêwazê jiyana wan û hevalên ku ji gerîla hatibûn de gelek cudabûnî hebûn. Hevalên ku gerîlatî kiribûn hîn zêdetir zindî, dilxweş, xwedî lêgerînên mezin bûn. Xwedî tempoyên jîr bûn. Dema ku Rêbertî dihat wargehê, hişyariya wan a di mijara ewlehiyê de, heta şêwazê rabûna rojbajê bigire, eleqadariya wan a ji sporê re, şêwazê lîstina wan a futbol, voleybol, dîsa guhdarkirina wan ji perwerdehiya Serokatî re, hemû şêwazê wan yên jiyanê di nav dîsîplînekê de bû. Ji ber ku ew

hevalên ku di nava şer de hatine bûn. Her hevalekî/ê bi dehan caran tevlî çalakiyan û operesyonan bûbûn. Li gel wan gelek hevalên wan şehîd ketibûn. Ji bo wê şêwaza jiyana wan hevalan xweser û cuda bû.

Hevalên ku ji Botanê hatibûn, di nava wan hevalan de kesê/a ku herî zêde bala min dikişand ser xwe û min dixwest wî nas bikim, yek ji wan rêhevalan jî hevalê Çekdar bû. Şehîd Çekdar, di temeneke ciwan de tevlî gerîla bûbû. Hevalekî ciwan û çalak bû. Lê di heman demê de jî ew hevalek gelekî aram bû. Dahûrandinên Rêbertiyê bi eleqeyeke pir zêde guhdarî dikir. Zehmetiyên ku di şer de jiyayî, hevalên ku li gel wî şehîd ketine, hevalên xwe yên ku li Botanê hiştî, li gel wan hizirandinên bi wate Serokatî jî pir baş guhdarî dikir. Li gorî vê yekê wî dixwest kesayetiya xwe û dîroka xwe nas bike. Wî ew qasî bedew li Serokatiyê dinêrî, di nêrandinên wî de wateyên azadiyê hebûn. Di her nêrandinên wî de hêviyên bi wate hebûn. Di nav wan hêviyên bi wate de dîrokeke veşartî hebû. Weke ku dixwest bibêje: "Ew dîroka ku ez lê digeriyam vaye li vê derê ye. Û li hemberî min e. Ez lê dinêrim. Ji ber ku dîrok di kesayetiya Serokê netewî Serok Apo de mîsoger bûye. Ev yek roja min e û ev yek azadiya min bixwe ye." Hevalê Çekdar li gel wan lêgerînên xwe yên watedar, bi hestên tejî li Serokatiyê dinêrî.

Dema ku em li qada Serokatiyê li perwerdeyê bûn, nêrandinên hinek hevalan ji Serokatiyê re ewqasî bi baldar bûn, mirov ji wan nêrandinan pir hestiyar û bandor dibû. Di nava wan wateyên veşartî de, ji destpêkê ve hevalên ku ji çiyayan hatibûn û di nava wan hevalan de jî Ş. Nûdayê pir bala min dikişand. Ş. Nûda ewqasê bi hestên tejî û bi wate li Serokatiyê dinêrî, mirov di nav wan wateyên azad de winda dibû. Dema ku hevala Nûda şehîd ket, Serokatî ji bo hevala Nûda got: "Şehîd Nûda hevaleke min a pir baş bû. Erê, wisa

pir baş li Serokatî dinêrî, weke ku bibêje, ez ê bibim hevaleke te ya herî baş, wisa bi armanc û bi wate li Serokatiyê dinêrî."

Gelek hevalên weke hevala Nûda jî hebûn. Yek ji wan hevalan jî Şehîd Çekdar bû. Di dema perwerdê de her tim li gel Şehîd Reşîd rûdidinişt. Hevalê Şehîd Reşît jî, pir bi baldarî li dahûrandinên Serokatî guhdarî dikir. Wê demê ji bo hemû hevalên ku di perwerdehiya Serokatiyê de bûn, xala herî girîng û bingehîn fam kirina Rêbertiyê bû. Min jî dixwast lêgerînên wan hevalan di çavên wan yên watedar de bixwînim. Ji bo wê hevalên ku di nava perwerdê de bi wêjeyê re eleqedar dibûn, min ji wan re digot; "divê mirov nivîsekê li ser çavên ku dixwazin Serokatî fam bikin binivîsîne." Wêneyeke Şehîd Nûda hebû. Dema ku li gel Serokatiyê wêne dikişine bi hêviyên tejî temaşe kiribû. Ji aliyê hevalê wênekêş ve hatibû kişandin. Hevalê Çekdar jî her wisa bû. Bi dileke ciwantî temaşe dikir, di nêrandinên wî de lêgerînên fermandeyeke mezin hebûn. Û li ser vî bingehî di vegotinên Serokatiyê de xwe nas dikir û dixwest bibe mirovekî mezin û pêşengê gelê xwe.

**Berfîn Nurhak**

## Ew Fermandareke Jîr Bû

Dema ku tê xwestin li ser hevalên şehîd em binivîsînin, an em vegotin bikin, di min de her tim dudilî yan jî panîk çêdibe. Yanî ez dikevim vê dudiliyê, gelo em ê bikaribin weke ku tê xwestin ji bo bîranîna şehîdan bibin bersiv? Lê belê weke erkekê behsa bîranîna şehîdan kirin jî bêguman ji bo me şertek bingehîne. Dîsan bîranînên şehîdan ji bo me deyneke mezin e.

Li ser hevalê Çekdar vegotin pêwîst e. Heval Çekdar, weke Çekdarê Şaxî dihat naskirin. Caran jî weke Çekdarê Cizirî dihat naskirin. Beriya ku ez behsa bîranîna şehîd Çekdar bikim, ez dixwazim hinekî li ser çanda Botanê bipeyîvim. Jixwe Şehîd Çekdar jî ji Cizîra Botanê bû. Dîsan ji malbateke tê naskirin bû. Şax jî weke ku tê zanîn bingehê wan ji Mîrên Botanê tê. Bi giştî binemalên Şaxî di Botanê de tên naskirin. Ew Mîrtiya Şaxê jî ji binemala Bedirxanan tê. Ez bawerim ew kalikê wan ên herî nêz bûn. Weke ku em dizanin di dîroka Kurdistanê de li hemberî Osmaniyan, binemala Bedirxaniyan her çi qasî teslîm bûbûn jî, dîsan li hemberî Osmaniyan binkeftina wan bi êş û zora me biçe jî, lê belê em weke berxwedana gelê Botanê ya hêjayî bi nav dikin, em bi berxwedana gelê xwe serbilindin. Hevalê Çekdar jî her ji binemaleke wisa tê.

Kesayeta şehîd Çekdar, dîsan hinek hevalên ji Botanê di nava têkoşîna azadiyê de şehîd ketine hene. Weke hevalê Adil, hevalê Ehmet Repo, hevalê Reşîd, hevalê Şerîf, hevalê Rojhat, dîsan hevalê Çekdar, ew heval hemû ji Botanê bûn. Li gel wan hevalên dîrokî hevalên jin jî hebûn. Weke hevalên Dîcle, Zelal, Agirîn û hevala Rûken di pêvajoya rêveberiya xwewseriyê ya 2016'an de li Cizîrê şehîd bûbû. Di pêşengtiya wan hevalan de, şerê gerîla li Botanê rastiyeke dîrokî ya kesayetiya Botanê di nava rastiya tevgera azadiya Kurdistanê de derxist holê. Wan hevalan di kesayetiyên xwe de û her

wiha di xebat û têkoşîn û berxwedaniyên xwe de giyanê kesayetiya Botanê ya resen, welatparêz derêxistin holê. Û dîsan di kesayetiya wan hevalan de girêdana axê û welatparêzî pir kûr dihat jiyankirin. Dîsan pêşiyên me dibêjin: “Mirov weke axa xwe paqij û pak e.” Ew hevalên ku min yek bi yek li gel rêhevalê Çekdar behsa wan kirî, her wisa bûn. Ew mirovên dîrokî bûn. Ew giyanên Botanê bûn. Wan bi seknên xwe û bi tevlîbûnên xwe yên xurt ji bo azadiya gelê xwe û azadiya Kurdistanê li ber xwe dan. Û bi taybet jî ew ji bo civaka Botanê pêşengên nû bûn.

Weke tê zanîn Botan mîna navê xwe kelha berxwedanê ye. Ji gelek pêşengên Kurdan re malûvanî kiriye. Dîsan em dizanin, dijmin ji dîrokê heta roja îro gelek hatiye ser kesayetiya Botanê. Çiqas dijmin hatiye ser civaka Botanê û xwestiye li ser lîstokên cuda cuda bike, dîsan xwestiye serkût bike, lê di encama wan hemûyan de Botanê li ber xwe daye. Ji gelek derdorên ku xizmeta dijmin dike, danasîneke wisa jê re hatiye çêkirin. Kesayetiya Botanê nikare pêşengatiya siyasî û leşkerî ji hinek tevger û rêxistinên din re bike. Kesayeta Botanê kesayetiyeke paşketiye. Dîsa kesayeta Botanê gûndî ye. Êdî nikare di siyasetê û leşkertiyê de roleke aktîf bilehîze. Hele hele hîç nikare pêşengtiyê bike.

Li hemberî vê nêrîna ji bo kesayeta Botanê dihate pênasekirin PKK’ê karî li hemberî wê nêrînê, ji kesayeta Botanê pêşengên şerê gerîla yên gelek xurt derbixîne holê. Bêguman yek ji wan pêşengan jî rêhevalê Çekdar bû. Dîsa kesayeta Botanê, di şexsê wan hevalên ku me vegotina xwe de behsa wan kirî, dan îsbatkirin ku di pêşengatiya tevgera azadiya Kurdistanê ya Apoyî de, di bin sêwana bîrdoziya wê ya serdema nû de, kesayetên Botanê jî dikare bibe pêşengên mezin. Ew danasîna berê ku ji bo kesayeta Botanê hatibû çêkirin, di şexsê wan hevalan de vala derket. Bêguman hevalê me yê hêja rêhevalê

Çekdar jî roleke xwe yê girîng ji bo wê çerxê heye. Di şexsê wan hevalan de ew nêrandin hatin pûçkirin. Fermandarên weke hevalê Çekdar, hevalê Adil, hevalê Reşîd, hevalê Şerîf Sipêrtî, hevalê Ehmet Rapo di şerê gerîla de mînak bûn. Dîsan weke hevalê Rojhat Bilûzerî di şerê gerîla de bê tirs bû. Weke hevalê Çekdar ruxmê ku gelek ciwan bû jî, di demeke pir kurt de karî bibe pêşeng û fermandariya şerê gerîla bike. Fermandariya wan hevalan ew nêrandinên ku ji bo kesayetiya Botanê hatibûn pênasekirin hemû şikandin û pûçkirin.

Botan di têkoşîna azadiya Kurdistanê de weke navendeke şerê gerîlayên Kurdên azad tê naskirin. Bêguman her wisa ye jî. Botan her tim ev rola xwe ya girîng lîstiye. PKK’ê û rêveberiya PKK’ê di serî de Rêber Apo her tim giraniyeke pir girîng daye Botanê. Derfetên baş dane Botanê û her tim li ser Botanê baş sekinîn. Ji ber ku di destpêka şerê gerîla de weke fermandarê mezin rêheval Egîd, hevalê Erdal û hevalê Bedran bi rêya wan hevalan qada Botanê hat vekirin. Li ser vî bingehî partî giraniyeke mezin da Botanê. Ew kesayetiyên ku me behs kirî, ew giraniya partî, Rêbertî û şehîdan dayî Botanê bê bersiv nehiştin. Wan bi tevlîbûnên xwe, bi têkoşînên xwe heta dawiyê giyanên xwe yên fedayane şer kirin. Heta kêliya dawiyê tevlî şer bûn, di jiyan û pratîkên xwe de bersivên baş dan. Di nava tevgerê de li Botanê gelek heval niha navê wan hevalan radikin, dîsa li Botanê bi navê wan hevalan zarok mezin dibin. Ev nirxeke pir mezin e.

Botan niha hem bi girêdana mirovên xwe yên bi ax û çanda xwe ve û hem jî bi xwedî derketina tevgera azadiya Kurdistanê îsbat kir ku biserbilindî li çanda xwe, dîroka xwe ya berxwedanê xwedî derketiye. Çanda Botanê di kesayetiya rêhevalê Çekdar de pir diyar bû. Botan pir zêde naaxive. Pir jî pêwîstî nabîne baxive. Botan xwedî teybetmendiyek a kirinê ye. Û dike. Bi kirinê tiştên ku dixwaze bibêje, dibêje. Civaka Botanê xwedî rastiyeke bi vî rengî ye. Li gorî min ev teybetmendiyeke gelek girîng e. Divê ev yek derbikeve zanistiyê. Dîsa divê li ser Botanê lekolîn bên kirin. Botan çima zêde

napeyîve? Çima zêde deng dernaxîne, bi kirinên xwe ve vegotin dike. Botan, xwedî rastiyên bi vî rengî ye. Ji aliyê hinek derdor û ji aliyê hinek kesan ve ev teybetmendî weke paşdemayînekê tênn dîtin. Li gorî min rastiya Botanê, ji destpêkê ve û bi teybet jî di van demên dawî de xwe bi rêxistinkirinê bigire heta berxwedana dawî ya şerê bajaran û dîsa di van hilbijartinên salên dawiyê de, çi jî berxwedan û serhildanên xwe yên ji salên 90'an bigire heta niha rastiyeke rêxistinî derxistiye pêş. Dema ku em van hemû danahevan tînin gel hev, kûrbûneke civakî ya girêdayî civaka xwezayî û dîrokî derdikeve holê. Ji ber ku ji gelek şahristaniyên girîng re dayiktî û pêşengtî kiriye.

Ez ji bo çi dixwazim vê yekê bibêjim; ji ber ku ew kesayetiyên ji Botanê tevlîbûyîne, heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê şer kirin û şehîd ketin. Ev teybetmendî bi wan re hebûn. Ger ku em di vê mijarê de baldarbin, hevalên ku em niha bibîr tinîn û bi hezaran hevalên din, di şexsê wan hevalan de em hemûyan bibîr tînin. Ger ku mirov van teybetmendiyan rast dahûrandin neke, bi rastî şîrove neke, dibe ku ew nêzîkatiyên ji derve li ser Botanê û kesayetiya Botanê hatiye kirin derbikevin pêş. Wê ev yek bihêle ku xapandineke pir cidî derbikeve pêş.

Mirov ji bo Botanê çiqasî bibêje wê her kêm bimîne, lê belê rastiya Botanê bi munasebata bîranîna hevalên ji Botanê ku di vê rêgê de şehîd ketine girîng dibînim. Çanda gerîlatiya Botanê her çi qasî li gorî rastiya Rêbertiya me û şehîdên me mezin nebûbe jî, lê di pêşengatiya wan hevalan de ku karîne dijmin li ser çok deynin, derketiye pêş. Divê mirov vê rastiyê jî baş bibîne. Çandeke ku ya yekemîn a gerîla li Botanê girtî, em dizanin li her qada gerîla belavbûyî hebûye. Divê mirov vê rastiyê baş bibîne. Bêguman kêm û kurtiyên xwe jî hene. Di naskirin û dahûrandina dijmin de kêmanî hene. Kesayeta ku dijmin li ser lîstî û di bin zext û zorê de hiştî heye û dîsan dijmin her xwestiye herêmê bê ziman bihêle. Bandora vê bişavtina dijmin li ser kesayetiya Botanê heye. Lê belê rexmê van hemûyan di roja me de, di şexsê Mehmet Tuncan, Pakîze û Sêvêyan de, berxwedaneke bêhempa li holê heye. Ji bo wê Botan ne berê û ne jî niha ti caran wê di şexsê Çekdar û Mehmet Tuncan de çûk daneyne. Wê berxwedana wan her tim bibe rûmeta me.

Li Botanê şerên gelek mezin çêbûn. Xwestin bi wan operesyonên xwe tirseke pir mezin bixin dilê gelê Botanê û dîsa xwestin gelê Botanê ji hêza gerîla dûr bixin. Di heman demê de jî xwestin darbeyên pir mezin li tevgara azadiya gelê Kurd bixin.

Di serdemeke wisa dijwar de hevalê Çekdar tevlî rêxistinê dibe. Ji aliyekê ve komkûjî, şewitandina gundên Kurdan, penaberî û tirs, di hemû kolanên bajarên Botanê de dagirkerî û şer hebû. Maşîneyên leşkerî, tang, teyare, helîkopter, sibê heta êvarî tewleta Tirkan bi operesyonên xwe dihat ser gelê Botanê û ciwanên Botanê. Di wê demê de bîst û çarseatan ber çavê mirovên me û ciwanên me leşker û şer hebûn. Rêhevalê Çekdar di demeke wisa zor de tevlî tevgera azadiya Kurdistanê bû.

Ji bo wê ew tevlîbûnekî gelek girîng bû. Hemû tevlîbûn gelek girîng in. Lê di demek wisa dijwar de ku koma Çîller digot: “em ê tevgera gelê Kurd ji kokê ve bidin rakirin.” Dîsa Çîller digot: “yan em ê xelas bikin yan em ê xilas bikin(!)” tevlîbûna rêhevalê Çekdar tevlîbûneke pir girîng ya ji şer bixwe re bû. Tevlîbûna ji şerekî ya bi vî rengî re wêrekiyeke pir mezin dixwaze. Ciwaneke weke hevalê Çekdar, ez bawerim wê demê temenê wî 16 yan jî 17 salîbû, dîsa xwendekarê dibistana amadiyî bû, di wê demê de hat û tevlî bû. Em wê demê li Cûdî diman. Dema ku hevalê Çekdar tevlî bû hat gel me. Ciwanbûna wî pir bala min kişandibû. Pir caran hinek tişt jibîra min diçin, lê ew bîranîn hîn di bîra min de maye. Ciwanekî ji aliyê fîzîkî ve pir lawaz bû. Dîsa ji aliyê fîzîkî ve çavên mirov pir tejî nedikir, ango ne yekî qelew bû. Em jî di nava tevayî wê salê de her roj li cihek û li qadekê bicih dibûn. Li hemû qadên Botanê şer hebû û hevçûnên mezin çêdibûn. Ew sal ji bo gerîlayên Botanê wisa dijwar bû. Li hemû çiyayên Kurdistanê di bihara 94’an heta payîza 94’an de şewata jingeyê xelas nedibû. Hemû cih û xwezaya Kurdistanê ji ber şerê dagirkeriya dewleta Tirkan dişewitî.

Ger kesayeteke wisa di wê demê de tevlî şer bibe, bêguman wê gelekî jî balkêş bibe. Fîzîka rêhevalê Çekdar a lawaz ku çavên me tejî nedikir, bi pratîka xwe ya şikûrdar pişre bi dileke mezin derket pêşiya me.

Di wê demê de gelek goftûgoyên min li gel heval Çekdar çêdibûn. Min di wan goftûgoyên xwe de jê re got: “Tu çima di vî temenî de tevlîbûyî? Yan jî tu dikarî di nava vî şerê dijwar de bibî gerîla?” Rexmê wan gotinên min dîsa jî ew xwedî baweriyeke mezin bû. Her çi qasî ji Gundê Şaxê û çiyayî bû jî, lê belê li gund mezin nebûbû. Naskirina wî ya ji çiya û şehrazariyeke wî ya çiyayan nebû. Herî dawiyê me jê re got; “tuyê zehmetî bikşînî, vegere biçe, di nav bajêr de xebatên sîvîl ên ciwanan bike.” Piştî wan goftûgoyên me, tiştên ku em li ser dihizirîn ne wisa bû. Me dît ku xwedî biryarek pir mezine û wê çekê rabike û şer bike. Hevalê Çekdar di serdemeke wisa de tevlî bûbû. Ew bi tevlîbûna xwe ve mînak bû, şervanekî herî jîr bû.

Dîsa kesayetiyên Botanê xweş sohbet in. Botan, bi sohbetên xwe ve henekan jî dike. Rêhevalê Çekdar jî xwedî van teybetmendiyên xweş bû. Ew, heta dawiyê bi pîvan, bi edeb, bi ehlaq bû. Pir caran hevalan digotin; “hevalê Çekdar pir fermî ye.” Lê belê ev yek ne rast bû, ew yekî xwedî bi pîvan bû. Di demeke kurt de bi wan taybetmendiyên xwe kesayetiya xwe da qebûl kirin. Dîsa hevalê çekdar di gerîlatiya Botanê de xwe da qebûl kirin, xwe gihandina vê astê wisa ne ji rêzê bû. Di wê pêvajoyê de gelek hevalên hêja hatin Botanê. Ji ber ku nekarîn xwe zêde li avaniya Botanê bidin qebûl kirin, gelek zehmetî kişandin. Hevalê Çekdar bi taybetmendiyên xwe yên jîr  xwe zû da qebûlkirin. Ew, di demeke pir kurt de bû fermandar. Hem temenê wî biçûk bû, hem jî bi wê fizîka xwe ya biçûk bû fermandar. Fermandiriya wî çawa bû? Ew, pişre jî bû fermandarê “Taxima Firtine!” Ew pêşketina wî di hindurê salek an jî salek û nîvî de çêbû. Bêguman ew mirovekî ne ji rêzê bû. Ew gelekî jîr û xwedî daneheveke mezin bû. Dema ku min bihîst hevalê Çekdar bûye fermandarê “Taxima Firtine”, ez hinekî jî şaş mam, lê jîrbûna ku min pêre dîtî, kesayetiya wî xwediyê wê daneheviyê bû. Ew, bi wê jîrbûna xwe ve bû fermandarê Taxima Firtine, heta xwe anî wê astê ku ji wî baştir tine be, wisa derket pêş. Ew ne tenê li Botanê, li gelek qadên din jî bi nav û deng bû. Ew, hem bi wêrekiya xwe, hem jî bi hevaltiya xwe ya bi pîvan ve derket pêş. Rexmê ku pir zêde di

perwerdeyên partiyê yên navendî re derbas nebûbû, lê wî dîsa jî ji bo kesayetiya xwe çanda rêxistinê bingeh digirt.

Weke ku min di destpêkê jî behsa çanda Botanê kir, kesayetên wan hevalan bi temamî temsîla wê çandê dikirin. Dîsa hemû Botan nebe jî, lê beşekî Botanê bi wan malbatan tên naskirin. Ger ku tu li Botanê pirsa kîjan binemalên li herêmê hene bikî, ew tev tên nasîn. Divê tu behsa vê binemalê jî bikî. Ji ber ku ev malbat di dema xwe de xwedî bandor bûne. Ji bo wê kesayeta rêheval Çekdar temsîla wê çandê, lê bi şêwazeke Apoyî û nûjen dikir. Li gorî ku min dişopand, ew yekî bê tirs bû. Ew yekî bêteredûd, bêdudilî û heta dawiyê bi pîvanê Apoyîbûnê dijiya. Heta şehadetê jî bi vê pîvanê dimeşiya. Rêhevalên weke Şehîd Çekdar, ji bo me her tim pêşeng in. Her çiqasî em beriya wan tevlî bûbûn jî û ew jî pişre tevlî bûbûn; me ji wan pirsî, lê ew bûn pêşengên me yên mezin. Ew, ji me pêşdetir çûn û ji me wêrektir gav avêtin. Ji bo me bûn mîrateyên mezin. Dîsan rêhevalê Çekdar bi têkoşîna xwe û bi şehadeta xwe bû pêşengê me.

Gelê Botanê di roja me de jî xwedî li vê mîrasê derdikeve. Yên ku ev mîras xistin çandeke herêmî, ev çand dan rûnişkandin jî ew şehîdên me bixwe bûn. Yek ji wan şehîdan jî rêhevalê Çekdar e. Eger ku îro gelê Botanê bê tirs û bêteredûd di kolanên Cizîra Botanê de li hemberî dagirkeriya fajîzma dewleta Tirkan şer dike, di saya van lengandan de ye. Heta ku deng jê derdikeve vê rastiyê xwe vegotin dike û ji bo azadiyê siloganan davêje, bêguman giyanê wan hevalên şehîdan bixwe ne. Wan hevalên şehîd giyan dan gelê me. Ger ku di roja me ya îro de behsa rêveberiya xweserya demokratîk tê kirin, bêguman bi saya wan şehîdên me ne.

Wan hevalên şehîd di Tabûra Bitevger de li Botanê fermandarî kirin. Wan, pêşengtiya şerê taktîkî kirin. Weke ku min di rêzenivîsa xwe de jî got; "wisa ne ji rêzê bû." Di wê demê de bi Tabûra Bitevger li tevayî qadên Botanê digeriya, li ku derê çalakiyên leşkerî pêwîst bû, taktîkên şer li ku derê pêwîst bû, divê li wê derê bi çalakiyên xwe yên leşkerî û pêşengtiya taktîka şer bikiribûna. Hevalê Çekdar jî xwedî wê mîsyonê bû. Li ku derê xetimandina şer û çalakî çêbûbûna pêwîst bû ew tabûr biçûbûna wê dere û wê xetimandinê bidana derbas kirin.

Dîsa hevalê Adil demeke dirêj fermandariya Tabûra Bitevger dikir. Dîsa hevalê Reşîd jî hem fermadariya tabûrê dikir, hem jî di rêveberiya giştî de cihê xwe digirt. Dîsa hevalê Erdal li gel hevalê Cemal tevger dikir, di Tabûra Bitevger de jî fermandarî dikir. Di heman demê de jî heval Rojhat Bilûzerî jî fermandarê Tabûra Bitevger bû. Ew hevalên ku min yek bi yek behsa wan kir, di Tabûra Bitevger de tevan fermandarî dikirin. Rêhevalê Çekdar jî di wê tabûrê de û di nava wê ezmûnê de derbas bûbû. Botan di wê demê de jî li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk, di giyan û berxwedaniya wan hevalan de teslîm nebû. Dîsa li hemberî şerê kirêj ên faşîst çong nedanîn. Di roja îroyîn de jî li hemberî faşîzma AKP’ê di şexsê Mehmet Tuncan de serî nehate tewandin û çong nehat danîn. Botan teslîm nebû. Wê ti caran jî teslîmî dagirkeriyê nebe. Yên ku ji bo Botanê bingeheke xurt danîn ew şehîdên bêmirin bûn. Ew pira ku heta roja îro nahêle giyanê berxwedana birûmet ji hev qut bibe, ew şehîd bixwe ne. Giyanê wan şehîdan e. Ew zîncîra berxwedana hatiye avakirin, li hemberî hemû şerê qirêj û îmha û înkarê bêguman giyanê wan şehîdan bixwe ne.

Ew ji bo azadiya Kurdistanê bûn pirek mezin, bi hezaran ciwanên Kurd û lehengên weke Mehmet Tunc jî bi ser wê pirê re derbas bûn. Wan şehîdan li hemberî qirkirina dijmin çong nedanîn û ala Kurdistanê teslîmî Mehmet Tuncan kirin. Pêşengên berxwedana birûmet, rêhevalê Mehmet Tunc heta dawiyê li ber xwe da û li wê alê xwedî derket. Gorî ku ez Botanê nas dikim, wê ew al nekeve. Wê ew al li ser şopa şehîdan bi destên ciwanên Botanê berdewam bike. Di bingeha wê giyana berxwedana birûmet de, giyanê weke hevalê Çekdar, hevalê Adil, hevalê Reşîd, hevalê Rojhat, hevalê Ehmet Repo, hevalê Erdal hebe; wê ti caran Botan li hemberî dagirkeriya faşîzane teslîm nebe. Wê li ser vî giyanê birûmet avabûnên pir mezin çêbike. Ger îro nebe, wê sibê çêbibe. Ev bingeh li Botanê pir saxlem e. Di bingehê rastiya Botanê de kevirên pir saxlem hene. Kes nikare tiştekî lê bike. Ji bo wê divê em li gorî paradigmaya modernîteya demokratîk rastiya şehîdan û şehîdên Botanê, di kesayetiya rêhevalê Çekdar de ji bo gelê Botanê baş bidin fêmkirin û naskirin. Ev erkên me ne. Ger ku em vê yekê nekin, em ê li hemberî hevalên xwe yên

şehîd her tim deyndar bimînin. Ger ku em erkên xwe li hemberî şehîdan pêk neynin, em ê bêwîjdaniyê bikin. Em ê weke mirovên bêwîjdan di civak û dîrokê de bêne nas kirin. Ji bo ku em li hemberî dîroka xwe rûreş dernekevin, divê ji rojekê zûtirîn rojê em di erk û berpirsiyariya xwe de layîqî şehîdên xwe derbikevin. Ez, li ser vî bingehî careke din rêhevalê Çekdar bibîrtînim, ew ji bo me hevalek û fermandarekî nemir e. Li hemberî têkoşîna wî ya birûmet em sozên xwe nû dikin.

**Dogan Didêrî**



“Şev e, xweş şev e. Çem û kahnî bi ser me de tên xuş e xuş e. Aliyekê me Rom e, yek Ûrîs e, yek Ecem e. Dengê min bilûr e, zimanê min qelem e. Heval û dostên min, aşiq û dengbêjên vê dinê ne”.

**Evdalê Zeynikê**

## Ew Rêhevaleke Pir Bi Peroş Bû

Hinek mirov hene gelek bedew in. Dema ku mirov li bedewiya wan dinêre, mirov dibêje qey bedewî ji ti kesan re nehiştine. Ew ne tenê ji aliyê fîzîkî ve bedew in. Ew ji aliyê mejî, hizrî û kesayetî ve jî gelek bedew in.

Bi vî awayî feraseta bedewîbûnê, di çavên hevalê Çekdar de her tim asoya azadiyê hebû. Rêhevalê Çekdar hinek bejin zirav, rû spî û giyan sivik bû. Nêrînên wî her tim ji bo jiyanê bi kelecan û bi peroş bûn. Kesayetiya hevalê Çekdar her tim cihê baweriyê bû.

Min hevalê Çekdar di sala 1995'an de li Heftanînê nas kir. Em bi hev re di yekîniyekê de bûn. Di nava yekîneyê de hevalê herî ciwan bû. Ji bo wê di nava yekîneyê de yekser bala mirov dikişand ser xwe. Mirovekî weke pirlanta bû. Piştî ku em hîn zêde bi hev re man di wê demê de hîn zêde naskirina min ji bo wî çêbû. Ji aliyê karakter ve gihayî û can sivik bû. Xwedî enerjiyeke pir zêde bû. Tevlîbûna wî ya jiyanê pir zêde xurt bû. Ji aliyê kesayetî ve jî xwedî sekeneke cîdî bû. Pir caran dema ku em weke gelek heval demên dirêj bi hev re diman, semîmiyetek an jî bistehbûnek ji aliyê me ve çêdibû. Lê belê hevalê Çekdar ew resmiyeta xwe ti caran xerab nedikir. Têkiliyên wî her tim li ser bingehên rêxistinî bûn. Ji bo wê gelek bawerî dida derdorên xwe. Ji bo wê her tim ji aliyê rêxistin û hevalên xwe yên nêz ve dihat hez kirin.

Sala 1995'an ji bo tevgera me saleke girîng bû. Em dikarin bibêjin ku saleke xwe ya kom kirinê bû. Ji ber ku sala 1994'an hem ji aliyê me ve, hem jî ji aliyê dijmin ve pir dijwar derbas bûbû. Hêza me ya gerîla jî hîn nû ji operasyonan derketibûn. Ji bo wê sala 95'an ji bo me weke salek ya komkirina hêza xwe bû. Dewreyên Akademiya Mahsum Korkmaz ji aliyê Rêbertiyê ve heval dihatin perwerde kirin û ji bo welat dihatin şandin. Di heman demî de jî ji qada şer jî heval

diçûn qada Rêbertiyê. Saleke wisa tejî û dagirtî bû. Di heman demî de ji bo me saleke têkoşînê û şer bû jî.

Di wê sala têkoşîna dijwar de hevalê Çekdar bi wê kesayetiya xwe ya bê didulî, bê teredût û bê hesab ve di nava yekîneyê de ji her alî ve ji bo hevalên xwe her mînak bû. Ew mînakbûna kesayetiya wî ya jîr, li gel pir rojên zor û zehmet xwe dida hîs kirin. Ew xwedî kesayetiyeke wisa bû. Pir caran em di nava şer de bûn, gelek hevalan ji westandinê nedikarîn xwe perwerde bikin. Lê belê li gel hevalê Çekdar westandin tine bû. Di nava çi westandinê de jî derketibûna, bi teqez wî di quncikekê de pirtûka xwe derdixist û ji xwe re dixwend û xwe perwerde dikir. Ew taybetmendiyên wî pir bala me dikişandin. Rexmê ku hevalekî ciwan jî bû, lê ti caran perwerda xwe ya kesayetiyê îhmal nedikir. Ji bo wê ji bo yekîniya me mînak bû. Wî ti caran wextê xwe vala vala derbas nedikir.

Pir caran di jiyanê de li ser gelek mijaran nîqaşên me li gel hevalê Çekdar pêş diketin. Di wan nîqaşên me de jî digot; “Heval Xalide we Rêbertî dîtiye, ka hinek qala Rêbertiyê ji me re bike.” Dîsan digot; “Xwezî min jî carekê Rêbertî bidîtibûna.” Di wê demê de hevalê Erdal (Engîn Sîncer) jî ew xwestek û hêviyê xwe ji min re qal kiribûn. Dîsan hevalê Erdal digot: “Ji dema ku ez hatim çiya şûn ve min ji Rêbertî re rapor nenivîsandî ye.” Min jî jêre got; “çima?” Wî jî got: “Ger ku ez rapor binvîsînim, divê ez qala serkeftinên xwe yên mezin bikim. Ji bo wê min nekariye ez binvisînim.” Nêzîkatiyên hevalê Çekdar jî ji Serokatiyê re weke yên hevalê Erdal bûn. Wî jî digot; “Ger çûndinike min hebe, divê bi kesayetiyeke xurt û bi pratîkeke xurt biçim pêşberî Rêbertiyê. Ji bo ez bikarim hîn baş Rêbertiyê fam bikim û bêxim pratîkê.”

Di wan pêvajoyan de Rêbertiyê pir roleke girîng dida kadroyên pêşeng. Rêbertî di parastina xwe ya Gelekî de jî dide diyarkirin: “Di

xebatên min yên li Rojhilata Navîn de yek ji wan jî avakirina kadroyên pêşeng bû. Ji ber ku di dîroka Kurdistanê de pirsgirêka herî bingehîn, pirsgirêka rêveberiya pêşengbûnê bixwe ye, min xwest vê yekê di vê qadê de derbas bikim.” Ji bo wê armanca Rêbertî di salên 95-96-97-98’an de ji bo pêşerojê afirandina nifşekî nû bû. Dîsa armanca Rêbertî ji vî/ê nişfê ciwan pêşxistina fermandariyeke nû bû. Ji bo wê hinek heval li ser wî bingehî dihatin amadekirin. Gelek heval ên ku ji aliyê rêveberiya rêxistinê ve dihatin amadekirin, pir zû tevlî karwanên şehîdan dibûn. Şehîd Mordem, şehîd Sînan, şehîd Cemal û şehîd Felat; ev heval tev berendamên wê nişfê nû bûn.

Hevalê Çekdar jî di nav wan hevalan de bû. Weke nifşeke ciwan û nû li ser bingehê şêwazê şerekî nû û ji bo rêveberiya partiyê dihatin amadekirin. Hevalê Çekdar jî ji yek wan hevalan bû. Li ser wî bingehî Rêbertiyê, kedeke mezin bi wan hevalan dida. Dîsa armanca Rêbertyê ya duyemîn ji vê nifşa nû re, li ser bingeha jiyaneke nû, sosyal perwerde kirina wan û ji bo pêşerojê amadekirina wan dihat meşandin. Bi taybet di kesayetiyên wan hevalan de Rêbertiyê dixwest ji nû ve têkiliyên jin û mêr li ser asta azadiyê û civakeke nû bigire dest. Ji bo wê Rêbertî dixwest di kesayetiyên wan hevalan de guherandin û veguherandinên nû ji bo kesayetiyên mêr derbixîne holê. Û dîsa dixwest vê projeyê bi YJK’ê temam bike. Li ser van pîvanan Rêbertiyê dixwest jiyaneke nû û şêwazeke têkiliyên nû avabike û şêwazeke nû di hindurê partiyê de bide rûnişkandin. Li ser vî hêmanî Rêbertiyê her tim plansaziya xwe nû dikir. Berendameke vê şêwaza jiyan û têkiliyên nû jî hevalê Çekdar bû.

Dîsa di nava yekîniya me de heta ku em bi hev re bûn, ez bawer nakim ku yek rojekê tenê jî, ji hevalê Çekdar êşiya be û yan jî aciz bûbe. Dîsa kesayetiya hevalê Çekdar gelek cihê baweriyê bû. Bi rastî hevalekî saxlem bû. Mirov dikarî pê re biçûbûna hemû karan. Ez weke hevaleke jin li gel hevalê Çekdar diçûm peywirê, ez pir pê

bawer bûm û em bi hev re diçûn û dihatin. Wî, pir bawerî dida mirov. Ew hevalekî jidil bû.

Piştî wê pêvajoyê şûn ve, êdî em ji hev qutbûn. Êdî yekîniyên hevalên jin hatibûn avakirin, em derbasî yekîniyên xwe bûbûn. Ez bawerim hevalê Çekdar jî piştî wê pêvajoyê şûn ve derbasî qada Rêbertiyê bûbû. Herî dawî piştî ku ji qada Rêbertiyê hat û şûn ve min cara duyemîn ew li Botanê dît. Hevdîtina me tenê çend seatan bû. Hevalê Çekdar hinek ji aliyê temen ve mezintir bûbû. Ew, di têgihiştinên xwe de jî hîn kûrtir bûbû. Diyar bû ku wî gelek baş li Rêbertî guhdar kiribû û dixwest bi pratîkeke germ û nû Rêbertiyê jiyanî bike. Ev hêvî û xwestek di çav û giyanê wî de diyar dibû. Dîsan di kesayetiya wî de diyar bû, di perwerdeya Rêbertî de xwe pir kûr û nû kiribû. Ji bo wê, ew ji aliyê kesayetî û hêvî ve gelek bi peroş bû.

**Heval Xalîde**

“Ew rêwiyên hêviyê ne. Ew in ên ku di dilên xwe de siberoj dayîne afirandin. Û ew in ên ku bûyîne giyan û coşa bi mîlyonan.”

**Mehme Tunç**

## **Çîroka** Fermandareke Nemir

Germahiya tava Zêrînker, hinarokên rûyê min hemû disotand. Ma ji xwe ve negotine 'meha reşbûnê.' Em hemû heval ji berfa Deriyê Zêrînker reş bûne. Deriyê Zêrînker mîna Deriyê Keran asê û zehmet e. Di binarên Deriyê Zêrînker de jî Gundê Bilika heye. Aliyê wê yê ku dikeve dawiya rojavayê başûrê Cûdî nêzî Çemê hezilê ye û bi qasî ku asê ye ew qasî jî ji milê erdnîgariya xwe ve, bi heybeta xwe ve, bi xwşeikbûn û mezinbûnê ve jî, balê dikişîne ser xwe. Ev gund dikeve quntara Çiyayê Cûdî, nêzî sêgoşeya Tirkiyê, Iraq, Sûriyeyê ku Kurdistanê dike sê beş. Gund, bi van taybetmendiyên xwe yên dîrokî û erdnîgarî ve, dihêle ku ev der bibe deriyekî yê çûn û hatina Bakûr, Rojava û Başûrê Kurdistanê. Beriya ku ev gund bişewite û penaber bibe, girêdayî rewşa heyî gelê ku li van deveran jiyayî bi bazirganiya li ser sînoran debara xwe dikirin. Ev gund li gel Kurdperweriya xwe ya berê ve, piştî pêngava şerê çekdarî û bi nas kirina fermandar Egîd re, hîn zêdetir li gel şoreşgerên xwe yên mezin û leheng ên mîna heval Cuma, heval Adil û hwd. di fikir û ramanê tevgera Apoyî de cihê xwe digire.

Gelek caran jî daristan û gelî û newalên vî gundî, em ji operasyonên dijminê hov xelas dikirin. Ji me re hemêza xwe vedikir, weke zarokên xwe stara me dikir. Operasyona ku di meha Adarê de derketî, dijmin di wê berfê de jî Deriyê Zêrînker girtibû, bêyî ku em berf û bahoza Deriyê Zêrînker nas bikin, di bin fermandariya hevalê Çekdar û hevalê Harûn de, di wê berfê de çelakiyeke bi heybet li ser dijmin çêbû. Dijmin gelek windahî dan, êdî bi helîkopteran jî pê re nedigihîştin ku windahî û birîndarên xwe xelas bikin. Gelek kuştiyên xwe di bilindahiya Derêyê Zêrînker de davêtin. Di serkeftina wê operasyonê de taxima me û taxima hevalê Çekdar hatibûn xelat kirin.

Piştî ku hevalê Harûn ji hevalan re got; “biçin daran!” ez û hevala Bihar, me bi hev re berê xwe da wê newala li binarên Zêrînker. Bihara azadiyê xwe bi hemû xweşikbûyîna xwe, bi gul û nêrgizên xwe Gundê Bilika û Deriyê Zêrînker xemilandibû û bêhna xwe ya xweş bi ser rû û henaseyên me ve difûrand. Giyayê biharê hêdî bi hêdî di nav berfa binarên Zêrînger de diyar dibû. Bi teybet giyayê ku em jê re dibêjin; “gulik/stêrk” bi hemû xemla xwe ya kesk ve, li derdora noqteya me xwe xemilandibû. Ew ji heftiyekê zêdetir bû ku me ew giya dixwar. Ez û hevala Bihar me di rêga xwe de hem giyayê gulik kom dikir, hem jî li daran digeriyan. Ew newala ku me gotibû em ê biçin lê daran kom bikin, em gihîştin wê derê.

Weke ku hinek ji min re bibêjin, ka li kêleka xwe binêre! Kêliya ku hestên min li gel min dipeyîvîn, çawa ku min li derdora xwe nêrî ez çi bibînim, sê cenazeyên leşkerên Tirk di nav berfê de ne. Berfa ku hinek li ser cenazeyên wan heliya bû, piyê wan di nav wan pêlavên wan ên reş de, ji nava berfê derketibûn. Bi dengeke bilind min bang hevala Bihar kir; “ka were! dijmin cinazayên xwe li Deriyê Zêrînker avêtiye vê newalê.” Jixwe me herduyan jî dizanî ew cenazeyên operasyona di meha Adarê de bû. Di wê kêliyê de hizirandin û hestên min ketin nav xeyaleke xemgîn û dûr: “Ev çi şerê qirêj e. Kesê efû nake. Kî dizane ev sê leşker ne Kurd in? Ger ku ne Kurd bin jî, mirov in. Her çiqas em li hemberî dewleta Tirk a faşîst şer jî dikin, lê şer û têkoşîna me ji bo gelê bindest û hemû mirovahiyê ye. Jixwe hevalên me yên ku pir caran me di çalakî û operasyonan de nedikarî xelas bikin, diketin destên dijmin, dijmin wan bi şêwazeke hov qetil dikir û di zinar û keviyên bilind de davêtin xwarê. Şehîd Cîhan, şehîd Jiyan û şehîd Demhat jî ma ne wisa bûn? Dijmin bi vî şêwazî di zinarên navsera Cûdî de avêtibûn. Piştî wan cenazeyan em li newalê baş geriyan me, sê cenazeyên din jî dîtin. Ji ber ku di nav keviyên

berfê de bûn, ji bo derxistina wan hêza min û hevala Bihar têrê nedikir ku em ji wir derbixînin.

Me darên xwe girtin û em hatin noqtê. Beriya ku em rewşê ji hevalê Harûn re vebibêjin, di kêliya ku min darên xwe danîn gel nanpêjan; hevalê Leşker ji min re got; “Hevalê Çekdar hatiye taxima me û ji heval Harûn re pirsa te dikir? Ma hûn dibin tiştekî hev?” Dema ku hevalê Leşker wisa ji min pirs dikir, ji kelecan û keyfxweşiyê min nezanî min çawa bersiva hevalê Leşker da. Gul û kulîlkên noqta me û yê Gundê Bilikan jî keyfxweşiya min hîs dikirin û bêhna xwe yên xweş li ser rûyê min difûrandin û ez bi bextewer dikirim. Hevalê Leşker ji bo nan çêkirinê agir hilkirîbû, li ber germbûna wî agirî em ketibûn axaftina ser cenazeyên leşkeran, ka çawa di Deriyê Zêrînker de avêtibûn.

Bi wê kêliya ku em wisa dipeyîvîn hevala Bêrîvan û hevalê Harûn bang li min kirin. Jixwe ez li bendê bûm ku hevala Bêrîvan bangî min bike. Ez rabûm ser xwe û ber bi cihê wan ve çûm. Her gava ku min davêt, bişkokên darên Zêrînker ên ku nû vedibûn, ji bo min di nav ahengek dilxweşiyê de bûn. Bayê ku ji zinarên Zêrînker dihat û li rûyê min dida, weke ku ez ê bifirim gavê min zû û sivik dibûn; bi kelecana dîtina hevalê Çekdar hêdî bi hêdî ber bi silaveke hasret dayînê ve dihat.

Me silaveke germ da hev û em li ber agirê taxima hevalê Harûn rûniştin. Çend heval jî li derdora me kom bûbûn, me dest bi axaftin û bîranînên wan dikir. Bi giştî hemû hevalên taximê, hevalê Çekdar nas dikirin. Hevalê Harûn û hevala Bêrîvan jî ji bo heval biçin wan cenazeyên leşkeran defin bikin, komek heval amade dikirin. Di wê kêliyê de hevalê Çekdar ji min pirsî; “çend cenaze hene?” Yên ku me dîtibûn şeş cenaze bûn. Dibe ku hinek din jî hebin.” Bi bersiva min ji wî re, di nava ronahiya pêtên agir de, li ser awirên wî, di rûyê wî de

xemgîniyeke bi êş peyda bû. Ji gotinên wî ev peyv derketin: “Şerê qirêj ê ku dewleta Tirk dimeşîne bedelên wî jî dibin kurên feqîr û jar an.”

Dema ku hevalê Çekdar wisa dipyîvî, hevalê Harûn li ser nîqaşên me ve hat. Got; “em vê mijarê qut bikin” û bi vî awayî dest bi henekan kir. Hevalê Harûn û hevalê Çekdar berê hev nas dikirin. Bi hezkirina bîranên hev dest bi bîranên xwe dikirin. Di nava wan bîranînan de her carê hevalê Harûn behsa min dikir. Di dema çalakiyan de çawa ku ez wî naxim nava tengasiyan, ji ber temenê min gelek caran hevalê Harûn destûr nedida ku ez di çalakiyan de tevlî koma êrişê bibim. Ji bo wê giliyên xwe li ser min ji hevalê Çekdar re digotin. Ez bi baldarî li benda bersiva hevalê Çakdar bûm ku ka wê çi ji hevalê Harûn re bibêje: “Mafê wê ye.” Lê belê bi bersiva ji wî re ez xemgîn kirim. Got; “nabe tu xwe li ser hevalan israr bikî, jixwe di vê demê de çend hevalên me yên wisa 12 û 13 salî li Botanê şehîd ketine, cenazeyên wan jî ketine destên dijmin. Dijminî bi vê li ser rêxistinê gelek ajîtasyonên xerab kiriye û dike. Serok Apo jî mûdexeleya qadê kiriye û di vê mijarê de jî Fermandariya Qada Botanê rexne kiriye. Ji bo wê pêwîst e em bi baldar bin. Nabe bi çi awayî tu xwe aciz bikî.” Piştî gotinên hevalê Çekdar, helwesta hevalê Harûn li hemberî min serkeftibû. Ji ber ku min di nav rêxistinê de hevalê Çekdar pir nas nedikir, ez bêdeng mabûm. Meydana axaftinê ji hevalê Harûn re mabû. Êdî di wê kêliyê de ji bo hevalê Çekdar behsa bîranîneke min û xwe kir.

“Di çalakiyeke me de vesazbûyîna hevala Leyla li cihê kordînê, li gel hevalê Cûdî çêbûbû. Lê wê ev vesazbûyîn ji bo xwe qebûl nekiribû. Şev seat 2, di nobedariya xwe de direve û diçe gel koma êrîşê. Li ser wê komê jî hevalê Firat disekine, piştî ku hevala Bêrîvan seat 4’ê berî ku roj hilbê, hat û got, hevala Leyla nediyar e. Êvarî jî ji

min re got, ger ku hûn cihê min neguherîn ez ê firar bikim. Û biçim gel koma keşfê. Koma keşfê jî koma êrîşê bû.”

Diviyabû di wê rojê de heta esirê li cihê ku em çalakiyê lêbikin, wê komê cihê xwe bigirtibûna. Di wê kêliyê de bi cîhazê hevalê Firat xeber da û got; “Li hevala Leyla negerin, heval li gel me ye.” Ez hem dikenim, hem jî pir hêrs dibûm. Piştî ku hevalê Cûdî ev mijar bihîst ji min zêdetir hêrstir bûbû. Hevalê Cûdî ew qasî bi hêrs bûbû ku bêyî ji ti kesan pirs bike, ferman da! “Bila ew kom paşve vekişin.” Dema kom hat jî, dawiya nîvro bû û got; “hûn ê platforma hevala Leyla çêbikin.” Hevalê Cûdî ew qasî bi hêrs bûbû, piştî ku me çend hevalan hinek li ser amadekariyên çakalekiyê axivîn û me got; “nabe, pêwîst e bi misoger ew çalakî bê kirin. Dema ku bû êvar hevalek dikare hevala Leyla bîne noqtê. Di dawiya çalakiyê de jî mirov dikare li ser vê mijarê bisekine.”

“Hevalê Harûn ew qas bi kelecan behsa wê bîranînê dikir ku hevalê Çekdar carnan bi ken û carnan jî di nav ewirên çavên dijwar de li min dinêrî. Bi kurtayî hevalê Leşker êvarê hevala Leyla anî noqteyê, weke sizadan jî nebe, lê weke helwest hevala Leyla ji bo cihê kordîneya çalakiyê jî nehat şandin. Piştî ku em ji çalakiyê hatin, berî bêhnvedanê ez çûm gel hevala Leyla. Şûna ku ez pê re hêrs bibim, berûvajî ew bi min re hêrs dibû digot, li gel min jî nedipeyîvî. Di ber xwe de diaxaft digot, “ma ez li vê derê çi dikim? Ma ez hatime ber pîvazan.” Di civîna çalakiyê de piştî ku mijarên girêdayî çalakiyê hatin nirxandin, dor hat ser hevala Leyla. Jixwe kes nepeyîvî, şûna peyîvandinê hemû heval dikenîn û ji henekî ve digotin ma her ku çûbû cihê keşfê, bila beşdarî koma êrîşê jî bibûna. Ji van helwestên hevalan ez kêmek bi hêrs bûbûm, bi şêwazeke henek be jî ji niha şûn ve hevala Leyla fermandara pîvaza ye. Jixwe ji bo xwe dibêje, ma ez hatime ber pîvazan. Bi keyfxweşiya serkeftina çalakiyê û mijara

hevala Leyla, ken û henekên hevalan di gelî û newalên zênarên Cilbiyan de deng vedida.”

Piştî wê bîranîna hevalê Harûn, hevalê Çekdar hem dikeniya û hem jî awirên xwe yên tûnd li ser min digerandin. Di nava wan awir û nêrînên tûnd de ji bo azadiyê asoyeke pir mezin hebû. Qey te digot bedewbûn di çav û birûyên wî yên reş de bi pênûsê hatiye çêkirin. Di nav wê taxima cil û bergên leşkerî û çek û rextan de jî ew qas bedew bû, lêgerînên wî yên azadiyê di nav wê bedewbûnê de li ser hinarûkên rûyê wî yê bi ken diyar dikirin. Piştî axaftin û bîranînên wan xelas bûn, êdî dora min hatibû. Dema ku min dora axaftinê xwest hevalê Harûn got; “êdî dem hatiye ez hinek we tinê bihêlim.”

Çaya li ser agir dikeliya û hêlma wê li rûyê me dida. Wî dest avêt îskanê tejî kir û da min. Min bi pêkenîn got; “nabe, tu mêvanê meyî, pêwîst e em çayê bidin te.” Bersiva ku min girtî “mêvan di nav rêxistinê de nîne, em çiqas mêvanê hev bin jî lê em leşkêrên Serok Apo ne.” Peyva Apo ewqas xweş ji devê wî derketibû, mirov her hez dikir ku lê guhdarî bike. Û wiha berdemam kir; “Ji bo em bikaribin bibin leşkerên Serok Apo, divê em hemû hewldanên xwe bêxîn tevgerê.” Em nêzîkî du seatan li ser rêxistinê û hevaltiyê peyîvîn. Di ber axaftinên xwe de jî gelek gotinên bi ken dianîn ser ziman. Di her nêrînek û hizirandinek wî de peyvên nû hebûn. Peyv di hizirandinên wî de ketibûn pêşbirkê. Bi rûyê ken û bi gotinên şirîn êdî dema xatiran hatibû, me xatirê xwe ji hev xwest û ji bo azadiyê em ketin ser rêga rêwîtiyê.

Piştî wê pêvajoyê şûn ve hevalê Çekdar dema ku ji qada Rêbetiyê hat, wê derbasî Gabar û Mêrdînê bibûna, me dîsa hev li Beytûşebabê dît. Wî li gel Rêber Apo di kesayetiya xwe de gelek guherandin dabûn çêkirin. Bûbû xwediyê gelek nêrîn û danehevên kûr. Di sekna wî û taybetmendiyên wî de gelek xalên nû hatibûn

avakirin. Hêvî di çavên wî de ji bo serkeftinê pir mezin û bilind bûbûn. Di meş û her gavek xwe de ji bo serkeftinê hatibû kilîlkirin. Wî soz dabû fêrdarê xwe û wê li ser van axan bi evîneke azad û bêdawî bijî. Jixwe evîn di welat û bajarê wî de nepeniyeke kûr bû.

Di erdnîgariya ku evîna Mem û Zîn lê hatî jiyîn de, hestên hezkirinên mirovahiya paqij hebûn. Di nepeniya wê evînê de hestên welatperwerî û gelek ku bê azad kirin hebû. Jixwe rastiya Zîn, rastiya ax û welat e. Rastiya Mem jî şervantiya azadî û egîdiyê bû. Di rastî û heqîqeta vê axê de nepeniya evîna azad hebû. Ji bo wê di têkoşîna mirovê azad de, heqîqet eşq e û eşq jî jiyana azad e.

Li ser şopa rêhevalê Mazlûm û rêhevalê Egîd bi hezaran şehîdên me di vê oxirê de bûne sembola camêrî û mêrxwasiyê. Rêhevalê Çekdar jî li ser vê kevneşopiyê, ji bo careke din li ser axa dayika pîroz jiyaneke azad û evîneke azad bê jiyîn, di hemû têkoşîna xwe ya azadiyê de, ew bi rêhevaltiya xwe ya jina azad re bû rêheval. Jixwe, wî jî li ser van pîvanan soz dabû Serokê xwe, ew ê bibe rêhevalê jina azad.

Dema ku her tim li ser van xakan rastî hebe, wê evîn û evîndarî jî lê hebe û wê bi şepolên azadiyê bên jiyîn. Jixwe wê şepola evînê xwe di rastiya Rêber Apo, şehîdên me yên destpêkê hevalê Heqî Karer, hevalê Mezlum û hevalê Kemal Pir, hevala Sara, Zîlan û Bêrîtanan û hwd. de bigihîne şepoleke mezin a azadiyê. Dîsa vê şepoleya azadiyê xwe di rastiya berxwedana cangorêyên Cizîrê de, li Sûr û Kobanê û heta xwe digihîne şepola berxwedaniya gelê Efrînê û evîndariya Avesta Xabur û Barînan. Dîsa rastiya vê têkoşînê di rastiya fermandarê nemir rêhevalê Çekdar de jî bûye heqîqeteke jêveneger. Li ser vê xaka pîroz, bi hezaran şehîdên me yên nemir bi vê şepola azadiyê bûne rastiya vê evîn û camêriyê.

Çi xirabî û neqencî nikare pêşiya vê şepola evîna azadiyê bigire. Çi qas zor û bi êş jî be, lê teqez wê li ser van axên pîroz evînî serbikeve. Ji xwe evîna Mem û Zîn di hêvî, bawerî û têkoşîna rêhevalê Çekdar de serketiye. Ev, dibe zû yan jî dereng be. Lê çawa ku çi derewek nikare rastiyê veşêre, çi xirabî û desthilatî jî nikare

evînê bin bêxîne. Ji ber ku evîn di rastiya lehengiya vî welatî de bûye jiyaneke azad.

**Leyla Lorîn**
**2018**

## Dema Ku Ez Zarok Bûm

Di welat û bajarên min de

li hemberî panzêrên dijmin,

qosk (darlastîk) û kevirê min hebûn

Her cara ku min kevirek dixist lastîka darlastîka

xwe û diavêt dijmin,

bexteweriya tolhildanê di hêviyê min de mezin dibû.

Û şahiya dilê min ji bo welatê rojê serî hildida!

Ma tu dizanî di kolanên Cizîra Botan de

li hemberî panzêran çend kevir hebûn?

Kevirên zarokên welatê min

ji panzêrên dijmin mezintir bûn.

Ji bo tolhildana Hîroşîma, Dersim, Helebçe,

Geliyê Zîlan û Dola Newala Keseban

Li welatê rojê

ez bi vê tolhildanê mezin bûm.

Dema ku ez ji dayîk bûm, ji min re gotibûn:

di giriyê wî de remza serkeftinê

û tolhildaneke bêdawî heye!

Ez wehîdî bûm, zarokê Bedirxaniyên nûjen bûm.

Ji bo wê her dema ku min kevirek diavêt panzêran,

min bi bayê tolhildanê diavêt,

bi baweriya tirêjên rojê,

ji bo bibim Bedirxaniyek berxwedêr,

min soz da ku tola salan rakim.

Bi avêtina kevirê duyemîn jî,

min sêdareyên Serokên me Kurdan,

weke Qazî Muhemed

Seyîd Riza û Şêx Seîdan

jibîr nekir.

Ji bo ez ji wan re bibim hêviyek,

kevirên di paşmala min de

ji bo dijmin hemû bûn guleyek ji agir!

Dengê kevirê min tola

berxwedana girtîgeha Amedê bû.

Mezlum, Xeyrî, Kemal û bi hezarên din

di kevirê min de dihatin hîs kirin…

Min û kevirên xwe,

Xwe di Şevên Çaran de

li kolanên Cîzîra Botanê veşartibûn!

Li kolanên Cizîrê pira ji kevir,

Her kevirek Apociyeke û gerîlayek e.

Şûn û warê Melayê Cizrawî

û alimên Kurdan e.

Bila alimên me Kurdan,

Helbestvanê mezin Ehmedê Xanî,

di qebra xwe de xeman nexwin û xweş razên.

Vaye me weke Kurd

Rêberek ji ilim û felsefê heye ji bo cîhaneke azad













